

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



CİWANKARİYA PEYVAN DÎ HELBESTÊN KURDÎ YÊN SALİM DE

TEZA LÎSANS A BİLİND

Luqiman Awla RESUL

VAN – 2017

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

SALİM'İN KÜRTÇE ŞİİRLERİNDE KELİME ESTETİĞİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
Luqıman Awla RASÛL

DANIŞMAN
Yrd. Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

VAN-2017

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

CÎWANKARIYA PEYVAN DÎ HELBESTÊN KURDÎ YÊN SALÎM DE

TEZA LÎSANS A BILIND

Amadekar

Luqiman Awla RESÛL

Şewirmend

Alk. Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

VAN – 2017

NAVEROK

NAVEROK.....	I
PÊŞGOTÎN.....	VI
KURTKIRIN.....	IX
1. Destpêk.....	1
1.1. Hunerên Ciwankariya peyvan Dinav Zanstê Rewanbêjyê De.....	1
1.2. Pêgehê Ciwankariya peyvan Di Nav Mêjûya Zanistê Rewanbêjî.....	2
1.3. Dengsazî û Ciwankariya peyvan.....	4
1.4. Ciwankariya peyvan Dinav Pêkhata Rewanbêjyê De.....	5
1.5. Çenid Nerînêkên Şarezayên Edebê Li Gor Rewanbêjyê.....	7
1.6. Peywendya Ciwankariy Bi Zanstên Din Yên Rewanbêjî.....	9
2. Pênasa Ciwankariya peyvan Li cem Zanayan.....	11
2.1. Ciwankariya peyvan Di Edebê 'Erebî De.....	12
2.2. Ciwankariya peyvan Di Edebê Kurdî De.....	13
2.3. Hunerên Ciwankariya peyvan Li cem 'Ereb û Li cem Kurdan.....	15
2.4. Rolê Rewanbêjî-Ciwankariya peyvan Di Deqnasyê De.....	16
2.5. Jyana Salimî.....	17
2.6. Bandorên Edebyatê Hevsê Li ser Helbestên Salimî.....	19
3. Ciwankariya peyvan di Helbestên Kurdî yên Salim de.....	22
3.1. Hunerê Regezdozî yê.....	22
3.1.1. Pênasa Hunerê Regezdozî yê li Cem Nivêseran.....	22
3.1.2. Curên Hunerê Regezdozî yê.....	22
3.1.2.1. Regezdozî ya Temam.....	22
3.1.2.1.1. Regezdozî ya Temam ya Hevresen.....	22
3.1.2.1.2. Regezdozî Ya Temam Ya Teba.....	28
3.1.2.1.2.1. Regezdozî Ya Temam Ya Teba Yê Nav û Kar.....	28
3.1.2.1.2.2. Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalnav.....	30
3.1.2.1.2.3. Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalkarê demî.....	30
3.1.2.1.3. Regezdozî Ya Temam ya Sade.....	31
3.1.2.2. Regezdozî ya Netemam.....	31

II

3.1.2.2.1.	Regezdoz ya Netemam yê Zêde	32
3.1.2.2.1.1.	Regezdozîya Netemam yê Zêde ya Nav	32
3.1.2.2.1.2.	Regezdozîya Netemam yê Zêde ya Cînav Xweser û Nav	35
3.1.2.2.1.3.	Regezdozîya Netemam yê Zêde yê kirdar	35
3.1.2.2.1.4.	Regezdozîya Netemam yê Zêde yê Amrazê Peywendî û Nav	36
3.1.2.2.1.5.	Regezdozîya Netemam yê Zêde yê Hevalnav û Nav	36
3.1.2.2.1.6.	Regezdozîya Netemam yê Zêde yê Tîp û Nav	37
3.1.2.2.2.	Regezdozîya Netemam yê Cuda	37
3.1.2.2.2.1.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Nav	38
3.1.2.2.2.2.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Cînav	44
3.1.2.2.2.3.	Regezdozîya Netemam yê Kirdar û Nav	44
3.1.2.2.2.4.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Kirdar.....	45
3.1.2.2.2.5.	Regezdozîya Netemam yê Amrazê Peywendî û Cînavê Xweser	45
3.1.2.2.2.6.	Regezdozîya Netemam yê Amrazê Lêkder û Nav.....	46
3.1.2.2.2.7.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Cînavê Xweser û Nav.....	46
3.1.2.2.2.8.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Nav û Hevalkarê Radê.....	47
3.1.2.2.2.9.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Hevalkarê Rade û Kirdar	48
3.1.2.2.2.10.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Amrazê Peywendî û Nav	48
3.1.2.2.2.11.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Hevalkarê Cihî û Nav	48
3.1.2.2.2.12.	Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Cînavê Amaje û Nav.....	49
3.1.2.2.3.	Regezdozîya Netemam yê Berevajî û Aloz.....	49
3.1.2.2.4.	Regezdozîya Netemam yê Kerî.....	50
3.1.2.2.4.1.	Regezdozîya Netemam yê Kerî ya Nav.....	50
3.1.2.2.4.2.	Regezdozîya Netemam yê Kerî ya Kirdar û Nav	51
3.1.2.2.5.	Regezdozîya Netemam yê Reha.....	52
3.1.2.2.6.	Amara Hunerê Regezdozyê.....	53
3.2.	Hunerê Patkirdinewe	59
3.2.1.	Patkirdinewe ya Dwalîzim.....	59
3.2.2.	Patkirdinewe ya Sêkane	61
3.2.3.	Patkirdinewe ya Nav	61
3.2.4.	Patkirdinewe ya Hevalnav	62
3.2.5.	Patkirdinewe ya Hevalkarê Çewanî	63

III

3.2.6.	Patkirdinewe ya Cînavê Xweser	64
3.2.7.	Patkirdinewe ya Ristê	64
3.2.8.	Patkirdinewe ya Peyvên Mendehoşyê!	65
3.2.9.	Patkirdinewe ya Karê Daxazî	65
3.2.10.	Patkirdinewe ya Amrazê Peywendî	66
3.2.11.	Amara Hunerê Patkirdinewe	67
3.3.	Hunerê Hênanewe.....	70
3.3.1.	Hunerê Hênanewe ya Hevşêwe û Hevwata	70
3.3.1.1.	Peyva Êkê li Destpêka Nîv Dêrê Êkê Da be	70
3.3.1.2.	Peyva Êkê li Navîna Nîv Dêrê Êkê Da be.....	71
3.3.1.3.	Peyva Êkê li Dûmahya Nîv Dêrê Êkê Da be.....	72
3.3.1.4.	Peyva Êkê li Destpêka Nîv Dêrê Dwê Da be	73
3.3.1.5.	Peyva Êkê li Navîna Nîv Dêrê Dwê Da be	73
3.3.2.	Hunerê Hênanewe ya Hevrezêzî.....	74
3.3.2.1.	Peyva Êkê li Destpêka Nîv Dêrê Êkê Da be	74
3.3.2.2.	Peyva Êkê li Navîna Nîv Dêrê Êkê Da be.....	74
3.3.2.3.	Peyva Êkê li Dûmahya Nîv Dêrê Êkê Da be.....	75
3.3.2.4.	Peyva Êkê li Destpêka Nîv Dêrê Dwê Da be	75
3.3.2.5.	Peyva Êkê li Navîna Nîv Dêrê Dwê Da be	75
3.3.3.	Amara Hunerê Hênanewe	76
3.4.	Hunerê Gêranewe (Vegêran)	82
3.4.1.	Hunerê Gêranewe li Gor Peyvên Vegerandî.....	82
3.4.2.	Şêwazên Hunerê Gêranewe ya Peyvan.....	83
3.4.3.	Gêranewe ya Peyvan di Çarçuva Pişkên Axaftinê.....	86
3.4.3.1.	Gêranewe ya Cînavê Amaje.....	87
3.4.3.2.	Gêranewe ya Peyvên Pirs	88
3.4.3.3.	Gêranewe ya Amrazan	88
3.4.3.4.	Gêranewe ya Hejmarên Sade	90
3.4.3.5.	Gêranewe ya Hevalkarê Cihî.....	90
3.4.3.6.	Gêranewe ya Karê Daxazî.....	91
3.4.3.7.	Gêranewe ya Hevalnav.....	91
3.4.3.8.	Gêranewe ya Cînavê Çendî (Rade)	92

3.4.4.	Gêranewe ya Firêza Navî.....	92
3.4.5.	Gêranewe ya Peyvên Lêkday.....	93
3.4.6.	Amara Hunerê Gêranewe.....	94
3.5.	Hunerê Têhelkêş.....	100
3.5.1.	Têhelkêşa Hozan bi Hozanê	100
3.5.2.	Têhelkêş bi Quran Pîroz	101
3.5.3.	Têhelkêş bi Gotinên Meznan	101
3.5.4.	Têhelkêş bi Ristên Komîdyên Diyalêkta Horamî	102
3.5.5.	Amara Hunerê Têhelkêş	102
3.6.	Hunerê Bûna Wê Pêdivye.....	104
3.6.1.	Bûna Wê Pêdivye ya Êk Tîp.....	104
3.6.2.	Bûna Wê Pêdivye ya Dû Tîpan.....	105
3.6.3.	Bûna Wê Pêdivye ya Sê Tîpan.....	105
3.6.4.	Bûna Wê Pêdivye ya Çar Tîpan.....	106
3.6.5.	Amara Hunerê Bûna Wê Pêdivye	106
3.7.	Hunerê Kerkirin.....	112
3.7.1.	Kerkirina Çar Ker	112
3.7.2.	Kerkirina Şeş Ker.....	112
3.7.3.	Kerkirina Dû bi Dû	113
3.7.4.	Kerkirin Pênc Ker	113
3.7.5.	Kerkirina Çar Ker ya Wekhev	114
3.7.6.	Kerkirin Heft Ker.....	114
3.7.7.	Kerkirin Çar Ker ya ji Hev Cuda	114
3.7.8.	Amara Hunerê Kerkirin	115
3.8.	Hunerê Muleme'	117
3.8.2.	Amara Hunerê Muleme'.....	118
3.9.	Hunerê Jêwergirtin (Lêwergirtin).....	119
3.9.3.	Amara Hunerê Jêwergirtin.....	120
3.10.	Hunerê Redîf.....	121
3.10.1.	Amara Hunerê Redîf	122
	ENCAM.....	127
	JÊDER	130

ÖZET	136
PUXTE	137
ABSTRACT	138



PÊŞGOTIN

Dîwana Salim berhemekê giringê hozanvanê Kurd Salim'ye, ev dîwane sê caran hatye çapkirin, her sê caran jî bi zimanê Kurdî ya diyalêkta Soranî hatye çapkirin, cara êkê li sala (1933)ê li Bexdayê hatye çapkirin, cara dwê li sala (1972)ê li Hevlêrê hatye çapkirin, cara sêyê li sala (2016)ê li Silêmaniyê hatye çapkirin. Ev dîwane ji dû bergan pêktêt, Hejmara rûpelên wî (1414) rûpele. Herweha koma hozanên wî (373) hozanin, (354) ji wan hozanan bi zimanê Kurdî nivîsandine û (19) hozan jî bi zimanê Farsyê. Salim pêgirî bi rêbaza kilasîzîmê kirye, anku pêgirî bi destur û yasayên kilasîzîm û pêrewê ew kesên ji wê demî û berî wê liser vê rêbazê dimeşin kirye, bi egerê zîrekî û jê hatye xwe mifa ji hozanvanên bi nav û dengê mîna Nalî, Hafîzê Şîrazî, Se'dî Şîrazî û hozanvanên serdemê xwe wergirtiye. Herwesa di warê hunerên ciwankarya peyvê de kû ev hunere pişkeke serekîye ji zanstê rewanbêjyê hem hozanvanên Kurd û hem hozanvanên hevî pîteyeka mezin bi hunerên rewanbêjyê daye. Salim di vê meydanê da lasayya hozanvanên neteweyên mîna Erebb û Fars kirye, daku di pêşveçûnên serdemê xwe gîro nebe, pêkul kirne kû bi zimanê hozanên xwe û şêwazên taybetên xwe roleka giring hebe ji bo selmandina zîrekya xwe û pêşveçûnên neteweyê kurd. Herwesa hevîmil digel hozanvanên serdemê xwe destkirye bi dahênanê di hozanê da hozanên xwe bi çendîn hunerên cuda xemlandye.

Navnîşana Vekolînê

CÎWANKARIYA PEYVAN DI HELBESTÊN KURDÎ YÊN SALIM DE, di vê vekolînê da me pêkul kirne bi kûrî û bi şêwazekê pir zanistî û hûr tavaya wan hunerên dikevîne nav sînorê Ciwankariya peyvan di hozanên Salim de wergirîn û bi nivêsin û şirove bikin.

Armanca Vekolînê

Armanca me di vê vekolînê da ewe kû babetê hunerên ciwankariya ceyvan cihê pîtedana dinav edebiyattan da, çunkî heta niho di edebiyata Kurdî de tû vekolîneka ekadîmî bi diyalêkta Kurdî ya Jorî (Kurmancî) di warê hunerên ciwankaryê peyvan de nehatiye kirin, jiber hindê armanca vê vekolînê ewe kû eger kêmasiyek hebe li rêya vekolîn ji hunerên ciwankariya peyvan ew kêmasî bîn çareser kirin kû di zarê Kurmancî de hene.

Herwesa em karekê bikîn mifayê bigehîne warê edebî, çunkî babetên hunerê ciwankariya peyvan dinav rewanbêjyê de bitaybet û dinav edebiyattan da bi gelemperî girîngîya xwe hene.

Rêbaza Vekolînê

Rêbaza vekolîna me, rêbaza rexneyî şêwazgerî ya piraktîkye, me pitir pêkul ya wê çendê kirye kû bi rengê hûr tev hunerên ciwankariya peyvan dinav dîwana Salimî xuya bikîn û binvêsîn û pênasê huneran êk bi êk bikin, anku di çarçuvê hunerên ciwankariya peyvan mînak dinav dîwanên Salimî de hatye wergirtin, herwesa yasayên zanistê rewanbêjî me kirye pîverek ji bo pêşveçûnên şirovekirina hozanan û destnîşankirina tev hunerên ciwankariya peyvan dinav dîwana Salim de.

Pêkhata Vekolînê

Vekolîna me derbarê hunerên Ciwankariya peyvan Di Helbestên Kurdî Yên Salim De ji sê pişkan pêkhatiye, pişka êkê: destpêke, di destpêkê da Ciwankariya peyvan û peywendiya wê bi rewanbêjyê û Ciwankariya peyvan û dengsazî û cihê Ciwankariya peyvan dinav zanistê rewanbêjyê ji layê mêtîyîve hatye behiskirin, herwesa peywendiya Ciwankariya peyvan bi pişikên din yê nav zanistê rewanbêjyê bi hûrî hatye behiskirin, herwesa nerînên şareza yê warê edebî derbarê rewanbêjî û Ciwankariya peyvan bi hûrî hatye behiskirin. Di pişka duwê de bi rengê tiyorî pênaseya Ciwankariya peyvan ji dev neteweyê ‘Ereb û pênaseya Ciwankariya peyvan ji dev neteweyê kurd hetye behiskirin, paşî berawird dinavbera hunerên Ciwankariya peyvan ji dev neteweyê ‘Ereb û neteweyê Kurd hetye behiskirin, paşî behisê bandorê edebiyatên welatên hevsê mîna ‘Erebî û Turkî û Farsî li ser Salimî hatye kirin, di dawiya vê pişkê de behisê jiyana Salimî hatye kirin. Herwesa di pişka sêyê da di destpêkê da pênaseya hunerên Ciwankariya peyvan hatye kirin, paşî me dest bi piraktîkirina hunerên Ciwankariya peyvan kirye li ser hozanên kurd yê Salimî de, ji bo tev huneran mînakên hozanî ji dîwana Salimî hatye wergirtin. Ew hunerên kû bi hunerên Ciwankariya peyvan hatye naskirin û di nav hozanên Salim da hebûn pêk tên ji hunerên regezdozî, dûbarekirin, Hênanewe, Vegêran, Têhelkêş, Kerkirin, Muleme’, Jê Wergirtin, Bûna Pêwîste, Redîf, tevaya wan bi hûrî hatine behiskirin.

Egerê Hilbijartina Vî Babetî

Egerê hilbijartina vî babetî ji bo çenid egerekan vedigere, êk ji giringtirîn egeran pêk tê ji nebûna vekolîneka taybet bi Ciwankariya peyvan ji hozanên salm re, herwesa nasîna zimanê hozana Salimî û fehim kirin û şirovekirina hozanan Bi gelemperî û derxistina destelatan û şyana Salimî di meydana zanistê rewanbêjyê bi tevahî û hunerên Ciwankariya peyvan bi taybetî, hilbijartina dîwana Salimî mîna kerestekê hozanî ji bo piraktîkirina tav hunerên Ciwankariya peyvan bi ser vî re ji bo egerê dizivire kû hozanvanên kilasîkî pir pêgîryê bi yasa û desturên rêbaza kilasîzim kirne, jiber vê çendê bara pitir ji huneran dinav hozanên kilasîkî de hene.

Arîşa Vekolînê

Arîşên vê vekolînê ji bo siruştê vê vekolînê, çunkî siruştê vê vekolînê wesaye kêma heta gelek vekoler rastî arîşan ve dibe, ew arîşên ketine di rêya vê vekolînê pêktên ji hûrî ya hunerên Ciwankariya peyvan û jêk nêzîkbûna hinek ji van huneran Bi gelemperî, herwesa kêma çavkanyên taybet bi biyavê zanistê rewanbêjî dinav pertûkxana kurdî de, herwesa hebûna nerînên cuda li gor hunerên Ciwankariya peyvan, eve jî wesa siruştê vê vekolînê dyarkir kû bi giranî bihête ber çavan.

Di dawiyê jî de me van encaman anye ziman kû me bi rêya vê vekolînê hatye dest xistin, paşî me puxte ya vê vekolînê bi zimanên Kurdî, Tirkî û Îngilîzî nivêsyê.

Di dawî de Ez pir spasiya Dr. Ömer ÇİFTÇİ dikim kû erkê serpereştîya têzê li stûyê xwe girt, wek erkekî pîroz bi min re westiya. Ez hêvî dikim temenê wî dirêj be ji bo xizmetkirina edebiyata kurdî. Herweha Ez pir spasiya Dr. Hêmin Umer XOŞNAW dikim kû her car bi dilekî fireh pêşwaziya min kir û bi rêya mobaylê bersiva hemû pirsên min da. Bi rastî ez çî jî jê re binivîsim nagihe bilindî û rêzdariya wî.

Luqîman 'Ewla RESUL

VAN 2017

KURTBEJE

Amd: Amadekar

B: Berg

Bnr: Binêre

Ç: Çap

H: Teqwîma Hîcrî

b.n.b: berhema nav borî

H.r: Heman rûpel

Hwd : Her mîna din

J: Jimar

S: Sehîfe

C: Cild

P.X: Pirtûka Xalid Sadînî

Ko: Kovar

M: Teqwîma Mîladî

Nd: Nivîskarên din

R: Rûper

S.X.L: Silava Xwedê Lê be

Weş: Weşanger/Weşanxane

B.M: Berî Mîladî

W: Wergêr

T: Tabî'e

TER: Terceme

1. Destpêk

1.1. Hunerên Ciwankariya peyvan Dinav Zanstê Rewanbêjyê De

Bi renekê giştî û em bi hûrî dimeyzine hunerên dinav rewanbêjyê de, ev hunere ne girêdayî edebê tinê neteyekê, belkî hunerên rewanbêjyê mîna hunerên nav Ciwankariya peyvan û nav watanasî û di nav rûhnêjyê hunerê zimanê tev neteweyane, netewê kurd jê mîna her netewekê din cihê xwe di nav van huneran de girtye, li gor van saxletên kû di nav zimanê kurdî de hene mîna “*Edebê folklor û gutnên mezinan û çîrok û hozan û efsane, kû hozanvanên mezin kare gelek bi jêhatî hozanên xwe pê bixemlînin, helbet ev core ji dahênanê di rûxsarê zimanê ra ne gelekî bi sanahî bû, belkî bi şyan û mandî bûna xwe hozanvanên mezinên kurd mîna Xanî, Cizîrî, Mewlewî, Nalî, Salim, Mehuy rolekê mezin di biyavê hunerên rewanbêjyê da hebû.*”¹

Van hozanvanan digel wê çendê kû bara pitir ya wan mela û zanayên mezin bûn, ji zimanê 'Erebî û Kurdî û Farsî û hozanên hozanvanên van netewan şarezayyeka temam hebûye. Ev şarezayya wan bû egerê bandoreka mezin ji pêgehandina van hozanvanan di zanistê rewanbêjyê de, derketina van huneran jî bi çir û pîrî di edebê kurdî da ne karekê sanahî bûye, çunkî pêdivî bi pêkulyeka mezin bû ji layê hozanvanên kurd. “*gelek yasayên giştî hene çêdibe bi ser hemî deqên edeban de were cêbecêkirin, mîna hunerên Ciwankariya peyvan, kû di hemî serdeman da were bikarînan, lê em divêt hişyarî vê çendê bîn bi renekê wesa van huneran li ser edebê xwe praktîk bikîn kû em saxletên edebê neteweyê xwe jibîr nekin, em dinav kûratya edebê neteweyê mînaka jê bigrin, zanistê rewanbêjyê di kevin da dinav mizgeftan de dihate xwandin ji bo şirovekirina têkistên turey.*”² Şareza yê biyavê rewanbêjya 'Erebî zanistê rewanbêjî di nav têkistên edebî bixwe xuya kirye, paşî dîvçûneka berfreh û pêkulyeka mezin netewê kurd jî zanstê rewanbêjî dinav têkistên edebî de hene, netewê kurd jî şyaye mîna neteweyên hevsê hunerên rewanbêjyê dinav têkistên edebîyên xwe xuya bike. Herwesa zanistê rewanbêjî dinav ji alyê edîb û zanayên kurd berhem hatye. Çavkanya derketina rewanbêjî ya netewê kurd pêktêt ji folklor û hozanên hozanvanên zîrek û mîna ew hozanên kû sofî bûn û peywendya wan bi hozanvanên sofîyên netewên din ve hebûye, bara pitir ji hêma û sinbulên wan sofîyan bi renekê

1 Muhsîn Ehimed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî Watanasî Rûnbêjî Ciwankarî*, Çapxaneyê Narîn, Ç.1, Hewlêr, 2013, r.7.

2 Mihemedî Mela ‘Ebidulkerîmî Muderîs, *Le Rêgay Edeb û Le Pênaw Nalî*, Ç: 1, 1998, r.335,

hûr û şehrezayî bikaranîye. “Zanstê rewanbêjî ji sê zanstan pêkhatiye, mîna zanstên Watanasî, Rûnbêjî û Ciwankariyî”³ ev sê zanste di sînorên rewanbêjyêda karê ji bo derbirîneke ciwan. Herweha gehîştin bi bingegehên rewanbêjyê girêdayê xwandin û vekolîn û şirovekirina têkistane Bi gelemperî.

“*Rewanbêjî pêktêt ji derbirîna wata û merem bi peyvên ciwan û rewan,*”⁴ çunkî ew têkistê kû dihête nivîsîn divêt tijî peyvên rehwan bin ji bo xwandevevanên têkistan rastî mendehoşyê nebin, herweha çavkanya rewanbêjyê li cem hozanvanên kurd edebê folklorye yê kevnar û ew edeb jî tijî jêderên girgin, çunkî “*folklorê kurdî di edebê kurdî de bi pîla êkê têt*”⁵ her derbirînek bi şêwazê rewanbêjyê be divêt darêtina wê ciwan û bihêz be û ezmanê xweş û şîrin be, çunkî êk ji regezên rewanbêjyê ewe kû peyv û wata û şirovekirina peyvan bi rengekê pir guncay û bi bandor û rêk û pêk be, herweha tijî hurdekarî, çunkî rewanbêjî bi hilibijartina peyvan evê şêwazê çêdike, kû li gor cihê dêra hozanî bi rengekî be ew têkistê bi ser hest û dil û derûnê xwandevevanî de bala dest be, çunkî peyv û ristên zav hene kû dinav têkistekî de ciwne û hejyê nivîsandine, lê dinav têkisteka din de hejyê nivîsînê tûneye, jiber kû dibe bingehek ji bo rexne giran jiber kû rexne ji vê têkistê ra bêjin bi egerê vê peyvê kû çênabe hatiba nivîsîn, jiber hindê her peyv û destewaje û risteyek kêmasî têda be bi rewanbêjî nahête wesfîkirin, çunkî her deqeka edebî daku wesfa wê bi deqekê edebî tijî rewanbêjî bê kirin pêdivyê “*ji alyê peyv û rûxsarê bê kêmasî be eger peyvên dinav deqî de qet qet bûn û liser ezmanê nexweş bûn ew têkist dûr ji ciwnyê dibe*”⁶ çunkî ew têkist dibe wtaya wê ya ciwan û serincrakêş be. Eger naveroka têkistê kirêt û pûç be, pêdivyê rûxsarê têkistê ya ciwan û xemlî be û van valahîyan tijî bike kû ji watay deqî de çê bûye, çunkî rewanbêjî ji bo parasitina deqye ji wan şaşyên di watayê de dirust dibin û tijî kirina kêmasiyên ji alyê naverokê ve bi stûyê xwe digre.

1.2. Pêgehê Ciwankariya peyvan Di Nav Mêjûya Zanistê Rewanbêjî

Rewanbêjî mêjûyeka kevnar heye digel civaka miruvatyê, serhildana rewanbêjyê vedigrîtevê ji bo kawdanên siyasî û cemawerî kû li cem yonanyan di rojevê da bû. Ji destpêkê de rewanbêjî ji hunerê gengeşê destpêkirye paşî bûye hunerê

³ Muhsîn Ehimed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî Watanasî û Rûnbêjî û Ciwankariyê*, Çapxaneyê Narîn, Ç. 1, 2013, r. 10.

⁴ Bîsîwnî ‘Ebidulfetah Fîwd, *‘Lim Elmmanî, M. Mwesese Elmixtar*, T: 3, Qahire, 2010, S.39.

⁵ Ebidulselam Salar Ebidulrehman, *Hunerî Rewanbêjî Le Şî’rî Nalî Da*, Namey Master Zankoy Selahedîn, 2000, r.37.

⁶ Bîsîwnî ‘Ebidulfetah Fîwd, *‘Lim Elmmanî, M. Mwesese Elmixtar*, T.3, Qahîre, 2010, S.31 – 33.

razîkirnê û piştî hingê bû rewanbêjî. Herweha rewanbêjî bi hunerê derbirînê hatye naskirin, ew rewanbêjya kû niho dinav têkistên edebê kurdîda ye saxleteka razîkirnê yê heye, çunkî armanic ji vê rewanbêjyê vêdana komeka kerestane bi nivîserî daku dahênanê dinav têkistê de bike û têkisteka edebî bi rûhnî û ciwantirîn şêwaz derbibire û berhemê xwe pê bixemlîne. Rewanbêjî bi zanistê derbirîn û hilsengandina şêwazan hatye naskirin “*rewanbêjî derbirîneke rastî û dirust ya hest u sozêye, herwesa çîrokeka ruhiye ji bo kontrolkirina derûnê mirovye*”⁷ anku rewanbêjî wê şêwazê bi giring dizane kû derûnê mirovî daxaz dike û dibe egerê serincrakêşana mirovî.

“*Zimanê rewanbêjî çenid saxleteka hey kû rewanbêjî babetekê pîvanêye, têkistan li gor wî dipîvin, herweha rewanbêjî ji bo xuya bûna alyê ciwan yên têkistan tê bikarînan, rewanbêjî peyv û watayan biser hunerên rewanbêjyê parivedike, herwesa bandoreka mezin ji xwandevevanên têkistan diken*”⁸ rewanbêjî taybet bi mirovye û mirov pê tê naskirin çunkî “*mirov gyandarekê rewanbêjyê ye*”⁹ mirov pêkulyê dike kû mifa ji hunerê rewanbêjyê tê wergirtin daku ew deqê turey kû tê nivîsandin kêmtirîn rexne lê bên girtin. Di vê çaxê de rewanbêjî roleka pir mezin heye di pirosêsa peywendîkirnê, çunkî rewanbêjî roleka pir mezin heye ji dirustkirina peywendiyên dinav deqîda bi ciwantirîn şêwaz û şîrîntirîn şêwaz.

Rûxsar di nav deqî de pir pîte pê dê dayîn daku kêmasiyên naveroka deqî veşêre “*zanayên rewanbêjyê di wê baweriyê dane dû wata hene, egereke ji bo hizr kirina mirovî, egereke ji bo razî kirina dilê mirovan jî, kû rewanbêjî deqê edebî bihêz dike*”¹⁰ rewanbêjî pitir pîte dide vekolînên rûxsarê deqî nek naveroka deqî, çunku rewanbêjî çenid erkekê li stûyê xwe digire mîna dûrêxistina deqî ji têkel û pêkelyê û şwêlyetyê, dûrêxistina van têkistên kû digel êk neguncayne dûrêxistina deqî ji bêhêzyê û arîşên zimanî, herwesa berçav wergirtina astê xwandevevanî, herwesa hilibijartina babetê giring û tewerê giring ji bo nivîsandinê dinav deqên edebêda. Rewanbêjî di çaxên kevin de ji dev Yonanyan hunerek bûye ji bo gengeşê û rohinkirinê, herweha hokarek bûye ji bo dest xistina parey, çunkî kesên xudan şyan ji biyavê rewanbêjyê ew kesan fêrî hunerên rewanbêjyê dikir, kû jiber fêrkirina van huneran pare

⁷ Mehdî Salih Elsamrayî, *T'asîr Elfikir Eldîni Fî Elbelaxe El'erebiye*, M. Elmektebe Elîselamî, T.1, Dîmeşiq, 1977, S.292.

⁸ Şukrî 'Yad, *Medxel Îla 'Lim El'slub*, M. Dar El'lum Lîltiba'e We Elneşir, T.1, Elryaz, 1982, S.43- 44.

⁹ Rulan Bart, *Qera'e Cedîde Libelaxe Elqedîme*, TER.'Mer Eukan, T.1, 1994, S.5.

¹⁰ Rulan Bart, *Qera'e Cedîde Libelaxe Elqedîme*, TER.'Mer Eukan, T.1, 1994, S.6.

hatye wergirtin, çunkî rewanbêjî di axaftinê de bandoreka mezin liser kesê ji hember mirovî de dirust dike.

Rewanbêjî ji dev Eristoy ji bo dû mereman araste ya cemawerî tê kirin mîna bandor û razî kirin, bi baş û xirab, bi vî rengî Eristo bi damezrênerê rasteqîne tê danan, jiber nerînên wî yê rewanbêjî di biyavê bandor û razî kirinê de, herwesa Eristoy sê pertûk di biyavê rewanbêjyê de hene, mîna pirtûka hozanêti, pirtûka hunerê gutarî, pirtûka argumêntên hevpişk. Eristo rewanbêjyê bi qenictirîn huner anye ziman ji bo razî kirina dilê mirovan. “*bi vî rengî rewanbêjî di jîngeheka siyasî û demokrasî li esînayê serhilda, di serdemê Birkîsî de bi şêwazekê zanistî li cem Sokiratî dirust bû ji bo gengeşkirina babetên edebî û siyasî û civakî, her di wî demî de rewanbêjî digel felsefê û rewîşt û siyaset kete hevrikyê, heta rewanbêjî ji felsefê cuda bû, jiber hindê em dikarin bêjin rewanbêjî di despêkêda li Yonanê serhilda çî ji alyê tiyorî ve çî ji alyê piraktîkî ve, paşî Romanyan jî pîte bi rewanbêjyê da, giringtirîn darêjerên tiyoran di biyavê rewanbêjyêda pêktên ji Eristo, Înkismanis, Şîşron, Kîntîlyan, Dîmtiryos, Hîrmocîn, Yirma Guras, û Sokrat*”¹¹ evana pitir tekezî li ser rewanbêjya siyasî û yasayî dikir. Herwesa giringtirîn bîngehên şirovekirina rewanbêjyê li cem Eristoy û Şîşronî pêktên ji “*Dahênan, Rêkxistina, Rûhnêjî, Derbirîn*”¹² ev çar bîngehe li cem van dû zanayên binav û deng yê cîhanî, bîngehên pir ferin ji bo nivîsandina têkistan û gengeşe bi renekê zanistî ji bo razî kirina dilê mirovan.

1.3. Dengsazî û Ciwankariya peyvan

Astên şirovekirina li cem Eristoy û Şîşronî pêktên ji “*Dengsazî, Morfolojî, Ristesazî*”¹³ çunkî dengsazî bandora rada dengî ji bo azranidina hestên xwandevevanên deqî û guhdarê têkistan ji bo têgehştin li wataya deqî sanahî bike, her eve jî we li hozanvanên kilasîkî kirye kû pir pîte bi deng û astê muzîka peyv û dûbare bûna dangan, kû corek ji hest û sozan dide, çunkî serwa yê dangan fikir û wataya peyvan dirust dike. Bi rêya vê jî hest û sozên hozanan di serwayê de kom dibe, bi taybet ji xwandina têkistan bi dengê bilind, çunkî pêdagirî têdaye liser bilind bû nêvî bûna awazên têkistan û mana têkistan li ser dengên serwayê.

¹¹ Eristo, *Fen Elxîtbe*, TER. ‘Ebidulqadir Qenînî, M. Eldar Elbevaz, Efrîqya Elşerq, 1996, S.16.

¹² Ebidulwahîd Muşîr Dzeyî, *Pragmatîk û Rewanbêjî*, Çapxaneyê Awêr, Ç.1, Hewlêr, 2015, r.33.

¹³ Cuzîf Mîşal Şîrîm, *Elhendese Elsewtye Fî Elqesîde Elmihasure*, M. Elcne, T.1, Kweyt, 1994, S.118.

Zanstê rewanbêjî êke ji zanistên giring yên edebê, nebûna vê zanistê valatyeka mezin dinav wata û derbirîn dirust dike, rewanbêjî li gor yasa û desturên berhev kirî bi xemilandinê radibe bitaybet hozan, çunkî “egerêke ji egerên rewanbêjyê, pêşangeheke ji pêşangehên rewanbêjî”¹⁴ herweha regezên edebî ji soz û xeyal û fikir heta digehîte watayê û agahiya me rûhin dike. Ji wî demîve rewanbêjî dest bi tijî kirina van valahîyan dike kû ketîne nav wata û ciwan kirin, jiber mikumî û zimanekê rewan û resen, jiber hindê “zanistekê ji zanistên zimanî digel rexnê edebyat pê têtê pîvan, kû qencî ji xirabiyê, anku ciwanî ji kirêtyê cuda dike”¹⁵ hozan pêktêt ji rengên ji derve yên ciwanyê mîna xudyekê ji rêya peyv û derbirînen sihrbazî, rewanbêjî di vê rêyê de wana şirove dike û lêkê û kêmasiyan cuda dike û wana hildisengîne, helbet eve jî gelek hizrkirin pêdivêt û dibe hozanvan bikaribe serederî digel van bike û paşî dest xistina wan tameka ruhî didete wan, anku rewanbêjî “hevşewê gotinan ji bo kawdaneka pêdivî, digel rehwanî di derbirîne de.”¹⁶ Ev zaniste hizrê hozanvanî wesa lêdike kû bikaribe bi regekê rêk û guncay peyvvan di cihê xwe de binivîse û hevrikyê digel ewên din de neke, anku ji alyê rûxsarê ve asayî be, lê ji alyê wata û delaleta kûr ve pir dûr bin ji derbirînen rojane.

1.4. Ciwankariya peyvvan Dinav Pêkhata Rewanbêjyê De

Rewanbêjî ji sê pişka pêktêt Rûhnêjî, Ciwankariy, Watanasî, her êk ji wana çendîn huner jê cuda bûye, cihê pîte pêdanêye û ciwanyeka din dide hozanê, eve jî nerînen hozanvanî bi regekê zîrekane, çunkî hozanvan hindî bikaribe huneryane bizavê bike digel deqê edebî de ew qas ew deq edebî tir û bilind tir û zaltir dibe. Serederya vî zanstî Serederya evê zanstê digel hozan û hunerên wê ne, eve jî rêtina leb û kulê kitrîna derûnye daku vana bi ciwanî vegwêzîte ve, di wî demî de têkelya cihanê hevdu diken û dahênanê pêkdînin. Em gelek caran hest bi ciwanya hozanekê nakin, lê di dema şirovekirneka hunerî de ji bo me zelal dibe kî çî hûr karî û dest û dar di wî de hatye mezaxtin, jiber kû pêkhata nexşandina rewanbêjyê û danana watayeka

¹⁴ Arî Sibhî Ehimed, *Xezel Ê Qesîdekanî Hacî Qadrî Koyî Le Jêr Tişk Ê Lêkolîneweda*, Çapxaneyê Rojhelat, Ç.1, Hewlêr, 2009, r.77.

¹⁵ Ehimed Metlub, *Minahîc Belaxye, M. Elneşîru Kale Elmetbw'at*, T.1, Bîrut, 1973, S.13.

¹⁶ Ehimed Elhaşmî, *Cewahir Elbelaxe Fî Elmmanî We Elbeyan We Elbedî'*, M. Dar Elm'rfe, T.22, Qahîre, 1960, 224

tîre, anku “ew hozanên kû pendê serdemî têda tèn belavkirin, xwasteka qenc û dilveker û Hênanewe û Regezdozî û lêkçwandin yên rastîne”¹⁷

Dibe rewanbêjî di cihê guncay û bi şêwazekê hûr bikaribe wataya rîs û rewan hebe, çunkî rewanbêjî hunereke pişta xwe bi paqijî û petî û dûrketin ji kirêtî û hermî girê dide. Bi rêya regezên xwe “wata û danana destewajan, hêz û bandoreka mezin dide di hîlbijartineka hûrd ya peyv û şêwazan li gor gotin û babetan û halet û xwastê derûnyê guhdaran, kû balkêşya wan dike û wana dike bi xudanê xwe”¹⁸ çunkî ew peyv û destewajên bi dinav deqî de tèn bikarînan, raste kû axaftnên rojaneya xelkye lê dinav têkistan de renekê din digre, van peyvan mîna bûkeke kirêt bi xelîya spî tê xemilandin û tameka taybet dide guhdaran, jiber vê çendê em dikarin bêjîn “rewanbêjî veguhastineke ji derûnê hozanvanî ji bo derûnê guhdarî bi bandorê ve”¹⁹ anku ew peyv û destewajên kû nivîserê têkistan bikar tîne, di derûnê nivîserî bi xwe dizêt û li ser derûnê guhdarî dadidet, mîna dadana mêşhingvînê li ser gulan, herweha peyv û wataya wan jî di têkisteka turey de roleka pir mezin heye hemî dema girêday hevdûne û rûxsar û naverokê pêkdînin. Rewanbêjî ewe kû bi hûrî û kurtî nerîneka baş û tîr bîne ziman. Di vî biyavê de Horas dibêje “eger te divêt mîfayê bigehînye xelkî dibe tişta bi kurtî bêjî, daku mejya xelkî bi sanahî bilez û sanahî axaftinên te werbigrin, bi dirustî têbigehî, her tişteke ji pêdivyê zêdetir bû ji sinîka mejyê tê rêtin”²⁰ ev nerîne amajeka êksere dûr bûn ji pîrbêjî û nizî bûn ji kurtbirî, daku guhdar bilez li armanic û meremên hozanvanî têbigehê, bi sanahî ew nerînen te divêt bi renekê rûhin û serkeftî bige guhdarî, niho ji bo me eşkera bû kû rewanbêjî pîteka mezin dide rêxistna peyvan dide daku guhdar û xwandevan cudahî dinavbera peyvên asayî kû xelkî bikardîne û heman ew peyva asayî ya nivîser bikardîne, bergeka turey bikete ber wê peyvê û ew têkist dibe têkisteka tijî ji rindiyê û tam bexiş, daku ji her dû alyê rûxsar û naverokê berhemeka resen û bihêz pêkbînin, jiber hindê “bingehê rewanbêjyê ferhengê zimanyê bi watayeka xuyakirî, kû di rêkixistina çarçoveyê û şirovekirina wan gelek pîte didene peyv û rewanya wataya wan û pêşveçûnên watayî”²¹ ciwanî û xemilandina peyv û destewajan di nav têkistên hozanî de palderê guhdarye ji bo ji bo

¹⁷ İbin Reşîq, *Elm'de Fî Mihasin Elşi'r We Adabhî We Neqide*, M. El'esnî, T.1, Qahîre, 1934, S.122

¹⁸ Elî Elcarm We Mistefa Emîn, *Elbelaxe Elwazhe Elbeyan We Elme'an We Elbedî*, M. Dar Elme'arf, T.7, Qahîre, 1995, S.9.

¹⁹ Mihemed Berekat Hemidî Ebu 'Elî, *Keyfe Neqren Trasena ElBelaxî*, M. Elneşir, T.1, 'Man, 1999, S.25.

²⁰ Horas, *Hunerî Şî'ri*, Wergêranî Le înglîzyewe Hemîd Ezîz, Çapxaneyê Elzeman, Ç. 1, Bexdad, 1979, r.30 – 31.

²¹ Ebî Elqasm Bin'Umer Elzmxşrî, *Esas Elbelaxe*, M. Elme'arîf, T. 1, Qahîre, 2003, S.16.

zûtir têgehiştina têkistan û watayên cuda yên têkistan, herwesa mîna bilêseyên agirîye ji bo zelalkirina asoya hizr û hişyarya me “*eger te guhdar dît bi bihayê hozaneka qenc an jî nûkirina pexşanekê we lê kir bi azre, saloxdana vê derbirîne dîke û dibêje kû derbirîneke xweş û rêk û pêke, têkisteka ciwan û saxlem û balkêşe, ew vedigere ser dengên tîpan û ji dervey barê zimanî û vedigere û diçe di dilê mirovî de*”²² ziman di nav hozanê de ew hêz û sihêre kû dinav derûnê me de digeryêt û careka din di rêya hunerên rewanbêjyê tîkelya muzîk û ritim dibe û hizr û derûnê hozanvanî berovajî dîke, heta digehîte asteke pir bilind ji ciwanyê û bihêzîya têkistan de, çunkî “*ziman bi danana nihênîyên wata û wergêraneka muzîkî ji bo derûnê mirovî li rêya hunerên Regezdozî û Hênanewe û Vegêran û Dûbarekirin û Lêkçwandin û dirke û Xastinê dirustdike, kû bi wî zimanekê hûr kû di rêxistin û wata û hozanvan hozanan dinvîse, eve tişteke di hêzeka tijî guman kû digehîte navbera wata û nihênîyên derûnê mirovî*”²³

1.5. Çenid Nerînêkên Şarezayên Edebê Li Gor Rewanbêjyê

“*Şêx Nuri Şêx Salih di wê baweriyê daye kû edeb pîşeyeke bi rengê bandorê dêxîte ser derûn û rihê, kû dibe egerê helçûnêka bilez û herwesa ev helçûne jî dibe egerê jidayikbûna têkisteka ciwan û tijî watayê, anku ciwanî û rêxistina wan bi şêwazeke hunerî çir, dîsan dîkeve nav xelega rewanbêjyê û kombûna watayê*”²⁴ li gor nerînê 'Eladîn Sucadî rewanbêjî “*pêktêt ji derbirîna komeka destewajên berfreh di qalibê çenid peyvên kême de*”²⁵ nivîsandina qasek kême ji peyvên bi watayeka pir, merema nivîserî ewe kû peyveka gerîb bikarbîne daku watayeka kûr bide, herwesa 'Ezîz Gerdî li gor rewanbêjyê dibêje “*di rastyê da daku nivîsînek bikete ber agirê werara rewanbêjyê pêdivyê rûhnî û rewanya wê ji dû alyanve be, alyê peyvên û alyê watayê*”²⁶ rewanbêjî bi rengê giştî hunereke ji bo nîşandana behîre û şyana nivîserê tîkistê, ji bo rohnkirina ciwanî û çûne dinav kûratyên ciwanyê, daku çî mirwariy ciwan û rêk û pêk tam bexiş hene vebîne û bike bi gerdanek û bi stûyê hozanan ve hilbiwase.

²² ‘Ebidulqahir Elcrani, *Esrar Elbelaxe*, M. Wizare Elme’arîf, 1979, S.4.

²³ Mihemed ‘Ebidulmutelîb, *Elbelaxe We El’slubyê*, M. Dar Cahiz, 2003, T.1, S.16.

²⁴ Arî Sibhî Ehimed, *Xezel û Qesidekanî Haci Qadrî Koyî Le Jêr Tîşk û Lêkolîneweda*, 2009, r.81

²⁵ Elaedîn Scadî, *Xoşxwanî û Guzerkarî û Rewankarî û Ciwankarî*, Çapxaneyê Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 1986, r.7.

²⁶ ‘Ezîz Gerdî, *Ciwankarî Le Edebî Kurdî Da*, Bergî Yekem, Çapxaneyê Dar Elcahiz, Bexdad, 1972, r.16.

Piraniya şarezayên rewanbêjyê nerînên xwe li gor rewanbêjyê xuya kirin, her êk li gor nerînên xwe derbarê rewanbêjî axaftine û piraniya şarezayên rewanbêjî gotine “rewanbêjî pêk têt ji dirêj Bîrî bê zêde û kurtbirî bê kêmasî”²⁷ wata anîna zimanê meremên hozanî bê zêdehî û kurtkirin, herdem ciwanî tinê gehandina watayêye herdem ciwanî di kurtbirîyê daye, Harune Reşîdî gotiye “*Rûnbêjî dûrketine ji pîrbêjîyê û nêzîk bûne ji merem û gehandina watayê bi peyvên kêma û watayeka mezin*”²⁸ van nerînên serî tev di sînore kurtbirîyê kom dibin û wesa difkirin kû ciwanî di nav deqî de bi egerê kurtbirîyê tête rojevê û wataya deqî jî bihêz dibe, çunkî pîrbêjî dinav têkistanda dibe egerê bêhêz bûna vî têkistî û serdabirina guhdar u xwandevanên têkistî. Herwesa herdem pîteka mezin bi wênê were dan dinav têkistan de, çunkî “*mîna rewanbêj û rexinegirana tekezî wê çendê dikin eger bi qenictirîn wênê nehête ziman û negehête derûnê mirovî rewanbêjî tûneye*”²⁹ rewanbêjî zêdehiyek ji bo têgehiştinê dirust dike, ew jî bi egerê kêş û tobografya û serwa û derbirîna dilveker û hilbijartina peyvên ciwan û kurt û xemilandî û nazik û sivikiya peyvan, ev hunere jî ji bo derûnên taybete, çunkî paşî têgehandinê armanca wê bexşîna xweşyê ye, digel gehiştin bi armanceke xuyakirî dinavbera dilî ji bo wan kesên qencî di pêşkêşkirina rewanbêjyêda heye, herwesa kêş û awaz û nazikîya peyvan û serwa û hemû ew hunerên ji derve dixemlîne, zanayên din jî hene watayeka bihêz bi awaz û muzîka xweş dikete pîver û dibêjin “*rewanbêjya rast ewe kû axaftin watayê bi xwe bigre, axaftin were hilbijartin awaza wê xweş be, bi rengêkî kû her peyvek digel peyvên li cem wî nêzîk û hevawa bin, bi rêya wî tiştên dûr bîn nêzîk kirin û tiştên zêde bîn ladan*”³⁰ lê Ebu Hîlalê 'Eskerî cuda ji yên berê nerîna me dibe alyekê din û dibêje “*rewanbêjî saxletên axaftinêye nek saxletên axaftinkerî*”³¹ çunkî axaftin şewaz û hunerên jêk cuda û taybet bi xwe dipejirîne, van tiştan jê digire kû digel wî biguncît û huner û şewazeke ciwantir û zêdetir biguncît.

²⁷ Îdrîs.Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî'ri Kilasîkî Kurdî Da*, Çapxaneyê Hacı Haşım, Hewlêr, 2011, r.18.

²⁸ Mehimud Bin S'ud Bin 'Ebidul'ezîz Elhlîbî, *Elhereke Eledebye Fî Mecalis.Harun Elreşîd*, M. Eldar El'erebiye Lîlmewsu'at, T.1, Bîrut, 2008, S.53.

²⁹ Dr. Elexizer Cem'î, *Ellefz We Elme'na Fî Eltefkîr Elneqîdî We ElBelaxî 'Înde El'ereb*, T.3, M. Elseqafe Eldînye, Dîmeşiq, 2001, S135.

³⁰ Ebî El'bas Mihemed Bin Yzîd Elmibîred, *Elbelaxe*, M. Mekitebe Elseqafe Eldînye, Elqahîre, T.2 , 1985, S.6.

³¹ Ebî Hîlal Elhesen Bin 'Ebidullah Sehîl El'eskrî, *Ktab Elsina'eteyn*, Tehqîq, 'Elî Mihemed Elbcawî Û Mihemed Ebu Elfezil Îbrahîm, M. ElMekitebe Elmsrye, T.1, Qahîre, 2006, S.6.

Herwesa bi vî rengî li cem şarezayên 'Ereb “*heta sedsala hevde yê mişexit babetên rexne babetên rewanbêjî bû çunkî ew cudahî dinavbera wan zaravên mîna (rewanbêjî, fesahet, berahet, beyan, sinhetî şî'r, sinhetî axaftin) nedikir li cem wan hemî ew zarav hevwatane û li ser êk watayê kom dibin, ew jî saloxdana axaftinêye di demekî de bandorê dêxîte ser me kû saxletên darêtin û helçûnên wîjdanî û hestên hunerî hebe, xuyaye kû yasa û bingehên axaftina 'udeba, an jî nerînên rexnegiran bingehên serekî yên vî zanistî bûn kû merem pê zanstên zanstê hunerên axaftinêye mîna Rexne, Rewanbêjî û Rûhnêjî, lê di dawiyê de vekolîn ji saxletên darêtin mîna wêne û derbirîn hêdî hêdî xweserya xwe wergirt, kû di dawiyê de bi zanstên rewanbêjî hatin naskirin û rewanbêjî ji watanasî û rûhnêjî û Ciwankariy hat kurtkirin, ev kare jî li ser destê Skakî hat encamdan*”³²

1.6. Peywendya Ciwankariy Bi Zanstên Din Yên Rewanbêjî

Bi renekê giştî zanistê rewanbêjî ji sê pişkan pêk têt, dinavbera hersê pişkan jî de peywendyeka mikum heye, çunkî “*peywendya rrûhnêjî bi watanasyêve peywendyê pişkekye bi tevahî, jiber kû watanasî giştgîrtir û berfirehtre, lê Ciwankariy xuya bûna hestên ciwnyên rûhnêjî û watanasyê*”³³ çunkî ji encamê hestên rindên watanasî û rûhnêjyê, herwesa gelek pênase li gorî rewanbêjyê hatîne kirin, ji wana hinek nivîser jiber wê sihra di hunerên cuda yê rewanbêjyê de xuya dibin, zanstê rewanbêjî bi çekeka dû ser daye naskirin “*weke çewa rewanbêjî ji bo derbirîn ji hestên bilind tê bikarînan bi heman reng ji bo xapandin û serdabirinê tê bikarînan, çunkî rewanbêjî alaveka mirov ji bo meremên xwe tîne bikarînan*”³⁴ mirov ji bo her meremekî kû bixwaze çî meremekî qenc be anku meremeka xirab çî merem pê xapandin be dikare rewanbêjî bikarbîne û hêvyên xwe bi rêya rewanbêjî bidest bîne. Herdem ji riwanga berjewendyên bilindên mirovê berfirehtir di sînorê wêne û ziman û muzîk û bi bandor dimeyzine zanstê rewanbêjî û dinvîse “*vekolîn ji peyv û bingehê wê û rihê wê di hunerên rewanbêjyê de ne dawî merem, belkî eve xelekeke ji xelekên wênê rewanbêjyê, ev wêne jî bi xelekên xwe tamam dibe, demê kû derbaz dibe vê biyavê kû peywendî girê dide bi pêdivî û tamayî û nerîn û mafên xelkî û saxlemî û jyaneka tenah û asayîşa civakî û diltenahya derûnî û kawdaneka qenc ya êkonomî ya*

³² Yusuf Elbîwmî, *Eledeb We Elbelaxe*, Teb'e Dar Neşir Elseqafe, Qahîre, 1970, S.6 – 7.

³³ 'Ebdulrehîm Mihemed Elhebîl, *Felsfe Elcema Fî Elbelaxe El'erebîye*, M. Eldar El'erebîye Lîlineşir We Eltewazî', T.1, Bexdad, 2004, S.256.

³⁴ Hna 'Bud, *Elbelaxe Elîbtihal Elî Elhulme*, M. Îtîhad El'ereb, Dîmeşiq, 2007, S.23.

wan, ji vê çenidêye kû heta niho wêneyên rewanbêjî li cem xudanên hunerê gotinane û tinê li cem wî parvekirin nasekine, bê kû bi jyan û xelkî ve girê bide”³⁵ rewanbêjî êkser têkelya zimanê civakî û siyasî û ekonomya xelkî bûye, jiber kû mirov di hemî byavan de pêdivî bi zanstê rewanbêjyê heye, Ciwankariya peyvan pişka sêyê zanstê rewanbêjiye di zimanê 'Erebî de dibêjnê Bedî', wataya vê peyvê pêktêt ji wan karên ciwan ewên her kesek di biyavê pisporya xwe de encam dide, lê di zanstê rewanbêjyê de Ciwankariya peyvan watayeka din dide ew jî “Ciwankariya peyvan pêktêt ji wê zanistê kû rûyên rindên derbirînê were naskirin”³⁶

³⁵ Mihemed Berekat Hemdî Ebu'Elî, *Belaxetina Elyewm Bîne Elcemalye We Elwezîfyê*, M. Dar Wa'l Lîlineşir, T.1, 'Uman, 2004, S.21.

³⁶ Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Ciwankarîyekanî Qanî*, Govarî Raman, Jimare 74, Salî 2009, r.46.

2. Pênasa Ciwankariya peyvan Li cem Zanayan

Xemilandina peyvan di turey de pir pîte pê hatye dayîn nexasime hozanvanên kilasîkî, eve jî bi zelalî di têkistên hozanî de were hest pêkirin, kû hozanvanên kilasîzim pîteka mezin daye ciwankirina peyvan, mîna 'Ezîz Gerdî dibêje “*ciwanya peyvan, bandorên peyvan, sihêr û serncrakêşya peyvan, di wê hest û sozê de ye, di vê wêney daye kû di azirine û dînîte rojevê, herwesa di wê çendê daye kû mîna zîndya gyandaran van hemî watayan têda kom dibe û derbibire nîşan bide, vêca ji bilî vê çenidê tû mercekê din tûneye, te çû peyve kê te divêt mirov dikare bikete tişteke zindî û bikete peyveka hozanî*”³⁷ anku her peyveka asayya ser ezimanê xelkî hozanvan dikare bixemlîne û bergeka nû bikete ber wî, bikarîna her hunerekê ji hunerên Ciwankariya peyvan ji bo xemilandin û derbirînên ciwan şarezayî û jê zanîn û zîrekî pêdivêt, ev şarezayî jî li cem hozanvanên kurd hebûye ev jî bi egerê pêkulyê û têkoşana wan bûye ji bo fêrbûna zanist û pêzanîna derbarê çewanya bikarîna hunerên ciwankaryê dinav hozanan de, Ebu Hîlalê 'Eskerî zanayê binav û dengê rewanbêjya 'Erebî dibêje “*ev core ji ciwankaryê di axaftin û derbirînê de eger xwe mandî kirin û kêmasî di nav wê de xuya nebû di gupîtka ciwnyê daye*”³⁸ hozanvanên dest rengîn karîne bê kêmasî têkistên hozanên xwe bixemlînin û dahênên giring di hozanan de bikin “*Ciwankariya peyvan ji aliyên muzîk û peyvan vekolînê dike, rîtm û awaza peyvan û derbirînan herdû astê stûnî û asoyî pêkve girêdide, merem ji Ciwankariya peyvan ewe kû regezên edebî awaz û muzîk dikeve navbera wan de û çewa bi vê muzîkên jiderve û jinavda rêya nerîn û xeyalan zêdetir di azre, herwesa texên riste û deng û derbirînên edebî rêk û pêk tir dibin, ev pişke zêdetir xwe bi dûbare bûna dengan ve mijûl dike kû awazên dinav de mîna Kerkirin û têhelkêş û regezdozî û dûbare bûna serwayan vedigire*”³⁹ ev pênase ji bo pênasekirina hunerên Ciwankariya peyvan yê çûye bingehê hunerê xemilandinê, çunkî muzîk û awazan mîna hokarekî dibîne ji bo bihêz kirina têkistên edebî amadekirina têkistan ji bo bi guhê guhdarî, jiber kû Ciwankariya peyvan “*merem jê xemilandina derbirînêye, an hinek caran wata bi rêya wî bê ciwan kirin*”⁴⁰ tev nerîn li ser hunerên Ciwankariy êk helwîstin, kû merem jê ciwankirina deqên edebîne û xemilandina tureye bi çendîn

³⁷ 'Ezîz Gerdî, *Edeb û Rexne*, Çapxaneyê Elhewads, Ç.1, Bexdad, 1974, r.62.

³⁸ Ebî Hîlal Elhesen Bin 'Ebidulla Sehil El'eskrî, *Ktab Elsina 'eteyn*, Tehqîq, 'Elî Mihemed Elbcawî û Mihemed Ebu Elfezil Îbrahîm, M. Elmekitebe Elmsrye, T.1, Qahîre, 2006, S.26.

³⁹ 'Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Bo Polî Duwemî Peymangakanî Melbendî Mamostayan û Polî Pêncemî Peymangakanî Mamostayan*, Çapxaneyê Aram, Ç.2, Bexdad, 2005, r.76 – 77

⁴⁰ Yusuf Ebu Elhdus, *Elbelaxe We El'slubye*, M. Elahlye Lîlineşir We Eltuzî, T.1, 'Uman, 1999, S.129.

awayên cuda kû di her şewazek ji şewazan têkistê edebî tê xemilandin û bergeka nû û watayeka nû dikene ber têkistên edebî û bi awayekê endazyarî û tijî ji soz û xeyalan têkist tê nivîsîn. Eve jî dibe egerê mendehoşyê xwandevan û guhdaran, herweha her têkisteka edebî eger tû ciwankaryek jî têda nebe van tam têda nahêne dîtin, li hember têkisteka din kû tijî destrengînê nivîser be û ev têkiste bi çendîn hunerên cuda hatbête xemilandin kû di her hunerekê de bi corek taybet bi rêya ciwankirina peyvan û wataya peyvan bên ciwankirin û tevaya hozanê mişt û mişt be ji ciwanyê de. Çunkî di nav têkistan de ciwanî dabeş dibe ser peyvan de û her peyvek li gor xwe berpirsyaretya xemilandina têkistê bi stûyê xwe digire, hinek peyv ji alyê watayê ve têkistên hozanî bihêz dikin, hinek peyv ji alyê formî ve bi rêya alyê hunerîve hozanan bihêz dikin.

2.1.Ciwankariya peyvan Di Edebê 'Erebî De

Helbet edebê her milletekî xudan saxletên xwe ye, kû bi rêyên cuda şirove ya wan ciwanyan dike kû dinav edebê wî de heye, edebê 'Erebî jî êke ji wan edebên kû hunerên ciwankaryê dinav deqên edebîyên wan da hene, neteweyên din mîna Kurdan bi rêya edebê 'Erebî hunerên Ciwankariya peyvan wergirtiye hozanvanên kur di encama xwandina deqên edebîyên 'Erebî û deqên edebîyên neteweyên din dahênan dinav têkistên edebîyên xwe kirne, gelek mifa ji edebê 'Erebî standine, kû eve jî girovê bihêzya edebê 'Erebye kû nivîserên 'Erebî karîne Ciwankariya peyvan dinav edebê 'Erebî de ji hunerên Ciwankariya cuda bike, çunkî di destpêkê de hunerên Ciwankariya peyvan nehatbûn cudakirin ji hunerên ciwankarya watayî, lê paşî qonax bi qonax Ciwankariya peyvan ji pişikên din yê hat cudakirin. Derbarê cudakirina wan hunerên kû dikevîne sînore Ciwankariya peyvan ji nivîserekê ji nivîserekê din cudaye, çunkî her nivîserek li gor nerînên xwe hinek hunerên Ciwankariya peyvan danaye.

Di pirtûka (Elbelaxe Elwez'e) hunerên Ciwankariya peyvan pêktêt ji “*Elcînas-Regezdozî, Eltezmîn-Têhelkêş, Elcesih-Serwadar*”⁴¹ di vê pirtûkê de tinê amaje ji bo sê coran ji hunerên Ciwankariya peyvan hatye kirin, lê di pirtûka (Finun Belaxye) hunerên ciwankaryê ji vana pêktêt ji “*Elcînas, Red Elhicis 'En Elsedir, Elseceh, Eltesrîh, Elmwazene, Elzum Mayelzem, Eltesrîh*”⁴² ji alyê hejmara huneran ev dabeşbûne çar lib ji dabeşkirina berê zêdetir, ev jêdere tev hunerên ciwankaryê bi 7

⁴¹ ‘Elî Elcarum We Mistefa Emîn, *Elbelaxe Elwazhe*, M. Dar Elme’arîf, T.21, Qahîre, 1969, S.263-301.

⁴² Ehîmed Metlub, *Finun Belaxye Elbeyan We Elbedî*, M. Dar Elbihus El’Limye, ElKweyt, 1975, S.223 – 313

heft huner nivîsye. Herwesa di pirtûka (Telxîsî Elmiftah) hunerên ciwankaryê ji bo van coran dabeşkirye “*Elcînas, Red Elhicis 'En Elsedir, Elseceh, Elmwazene, Elqelib, Elteşrîh, Elzum Mayelzem*”⁴³ Ji alyê hejmarê ve ev jêdere jî mîna jêderê berê hejmara hunerên Ciwankariya peyvan her 7 heft hunern.

Herwesa di pirtûka (Cewahir Elbelaxe Fî Elme'anî We Elbeyan We Elbedî') hunerên Ciwankariya peyvanji bo van coran hatîne dabeşkirin “*Elcînas, Eltezmîn, Eledwac, Eltesdir Ewred Elhiciz 'Ela Elsedir, Mala Yestehîl Bîlîn'îkas, Elmdarebe, Î' tîlaf Ellefiz Me'a lefiz, Eltesmîm, Elînsam, Elîkitifa, Elteterîz, Elseceh, Elteşrîh, Eltesrîh, Elzum Mayelzem*”⁴⁴ di vê parvekirinê de hejmara huneran 15 pazdeh hunerên ciwankaryên peyvanin, hejmara huneran li gor vî jêderî gelek pitire li hember jêderên din yên berê, eve jî girovê vê çenidêye kû ev nivîsere bi kûrî binav alyê hunerî di edebiyatan de çûye xwarê.

2.2.Ciwankariya peyvan Di Edebê Kurdî De

Xemilandîna peyvan li cem hozanvanên kurd libin bandora xemilandîna peyvane li cem hozanvanên neteweyên hevsê bi taybet hozanvanên 'Ereb, çunkî hozanvanên kurd pêkul kirine mifa ji hozanvanên hevsê Bi gelemperî û nexasime hozanvanên 'Ereb wergerîn, “*jiber kû vekolînên rewanbêjî li cem netewê kurd giro bû bi berawird bi neteweyê 'Ereb heta çarêga dûmahya sedsala bîstê, gelek bi kêmi tê berçavan meger di perawêzên pirtûkan de bê behiskirin. Êkem kes kû dinav kurdan de behisê vê zanstê kiribe 'Ezîz Gerdî ye kû di pirtûka xwe de bi navnîşana; Rewanbêjî Le Edebî kurdî da, ev pirtûke ji sê pişkan pêk hatye, bergê dwê yê taybete bi hunerên Ciwankariy Bi gelemperî, bi awayekê hûrd û zanistî saloxdana Ciwankariya peyvan kirye*”⁴⁵ 'Ezîz Gerdî di pirtûka Rewanbêjî Le Edebî kurdî da, libin navê Ciwankariya peyvan navê wan huneran yên nivîsîn mîna hunerên “*Regezdozî-Elcinas, Serwadar-Elsec', Kerkirin-Elteşîr, Gêranewe-Elteredîd, Hênanewe-Eltesdîr, Patkirdinewe-Eltikrar, Têhelkêş-Eltezmîn, Pênicxiştêkî-Eltexmîs*”⁴⁶ di vê parvekirinê de ji bo ciwankariya peyvan hest bi curekê ji kurtbirîyê tê kirin, çunkî ev nivîsere tevaya hunerên ciwankaryê bi 8 huneran da zanîn.

⁴³ Se'd Eldîn Elftazanî, *Elşerh Elmixteser*, Qum, Ayran, S.135 – 190.

⁴⁴ Ehmed Elhaşmî, *Cewahir Elbelaxe Fî Elme'anî We Elbeyan We Elbedî'*, M. Else'ade, T.22, Qahîre, 1960, S.243 - 264,

⁴⁵ Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Le Edebî Kurdî Da*, Çapxaneya Serdem, Slêmanî, 2003, r.16.

⁴⁶ 'Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, Bergî Duwem, Çapxaneya Şarewanî, Hewlêr, 1975, r.6.

Lê li cem hinek ji nivîserên din hejmara hunerên ciwankaryê di kêmtirin “*pirtûkekê taybet bi zanistê rewanbêjî di zimanê kurdî de bi navê Xoşxwanî kû ya 'Eladîn Sucadye kû ev pirtûke ji sê pişkan pêk têt, di pişka sêyê de behisê hunerên Ciwankariya peyvan yê kirî*”⁴⁷ libin navê Ciwankariya peyvan 'Eladîn Sucadî navê van huneran nivîsîye, mîna “*Regezdozî-Elcinas, Dwabeser-Red Elhicis 'En Elsedir, Serwadar-Elsec', Dûserwa-Elteşrîh, Bûnî Pêwîste- Elzum Mayelzem*”⁴⁸ her nivîserek li gor nerînên xwe boçûna xwe ji bo zanstê rewanbêjyê Bi gelemperî û nav û hejmara hunerên Ciwankariya peyvan nivîsye.

“*Pirtûkên din derbarê rewanbêjyê hatye nivîsîn kû pişkek ya hetye taybet kirin ji bo ciwankaryê, ew jî pirtûka Mela 'Ebidulkerîmî Muderîs ye bi navê Bedî' Ê 'Eruzî Namî, di wê pirtûkê de ji hember navê Ciwankariya peyvan destewajê Razandinewey Lefîz nivîsye*”⁴⁹ herwesa Mela 'Ebidulkerîmî Muderîs di pirtûka Bedî' Ê 'Eruzî Namî de libin navê Ciwankariya peyvan navên van huneran anî ziman “*Cînasî Tam-Regezdozî, Cînasî Naqis-Regezdozî Natewau , Red Elhicis Îla Elsedir, Elsecih , Teşîr, Elmwazene, Qelib, Elzum Mayelzem, Teşrîh, Murab, Elteterîz, Îtîlafî Lefz û Me'na, Însicam, Îktîfa, Sirqat Şî'rye, Îqtîbas, Tezmîn, 'Eqid , Hel, Telmîh, Br'e Elîstihîlal*”⁵⁰ ev nivîsere navên bîst û êk 21 hunerên Ciwankariya peyvan nivîsye, lê navên tev huneran bi zimanê 'Erebî nivîsye, li hember çû navan navên kurdî nenivîsye, eve jî girovê vê çenidêye kû nivîserên kurd gelek ketîne bin bandorên zimanê 'Erebî.

Herwesa Îdrîs Ebidulla Mistefa, di têza xwe ya doktorayê de bi navê; Layene Rewanbêjîyekan Le şî'rî Kilasîkî Kurdî Da, li bin navê Ciwankariya peyvan van hunerên Ciwankariyê nivîsye “*Regezdozî-Elcinas, Hênanewe-Red Elhicis Îla Elsedir, Patkirdinewe-Eltikrar, Gêranewe-Elterdîd, Jêwergirtin-Îqtîbas, Têhelkêş-Eltezmîn, Tesrîh-Eltesrîh, Tersîh-Eltersîh, Mulemme'-Elmulemh, Îktîfa-Elîkitîfa, Tesmî,- Eltesmî, Teşîrkiraw-Sech Elteşîr, Mitewazî, Eltescî' Elmitwazî, Mutrîf-Sec' Elmutrîf, Redîf-Elredîf, Pêkewe Guncan-Elînsicam, Tetrîz, Elteterîz, Bûnî Pêwîste-Elzum Mayelzem, Xîyef, Elxîyef, Pênicxişteki-Eltexmîs*”⁵¹ ev parvekirina jorî ji bo

⁴⁷ Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Le Edebî Kurdî Da*, Çapxaneya Serdem, Slêmanî, 2003, r.18.

⁴⁸ 'Elaedîn Secadî, *Xoşxwanî*, Çapxaneya Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 1986, r.126 – 148.

⁴⁹ Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Le Edebî Kurdî Da*, Çapxaneya Serdem, Slêmanî, 2003, r.20.

⁵⁰ Mela 'Ebidulkerîmî Muderîs, *Bedî' Ê 'Eruzî Namî*, Çapxaneya Dar Elcahiz, Ç.1, Bexdad, 1991, r.31 – 65.

⁵¹ Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî'rî Kilasîkî Kurdî Da*, Çapxaneya Hacî Haşm, Hewlêr, 2011, r.9 – 10.

Ciwankariya peyvan bi renekê hûr û zanistî navên huneran nivîsye û li hember tev huneran bi zimanê 'Erebî bi zimanê kurdî jî nivîsye, çûnkî ev hunere hunerekê Farsye.

2.3. Hunerên Ciwankariya peyvan Li cem 'Ereb û Li cem Kurdan

Herwekî me di berê de behskir vekolîn ji rewanbêjî di çarçûva ewê jî de vekolîn ji Ciwankariya peyvan li cem kurdan bi berawird be vekolînên neteweyê 'Ereb gîro bûye. Ciwankariya bi herdû beşan ve weke biryardan li cem 'Ereban bi pişkeka xweser tê danan, lê li cem Kurdan di destpêkê de weke beşek ji rewanbêjyê dihate danan, piştî di edebê kudî de mîna beşeke xweser hat danan, Estetîk herdem di pêşveçûnan de bûye, çûnkî hejmarê hunerên Ciwankariya peyvan li cem rewanbêjên nû bi berawird bi rewanbêjên kevnar herdem di zêde bûnê de bûne. “*ev programê kû nivîserê 'Ereb Xetîbî Qezwînî di pirtûka xwe de bi navê Telxîs Elmiftah kar li ser kirye, hev awayê nivîserê kurd 'Eladîn Sucadî di pirtûka Xoşxwanî behs kirye, xwe heta ewa Xetîbî Qezwînî bi dizîn ji hozanan dibîne, 'Eladîn Sucadî jî bi heman awa vê destewajê bikarînaye*”⁵² nivîserên kurd libin bandorên nivîserên 'Ereb û gelek mifa ji edebê 'Erebî dîtye, herweha “*cudahya hejmarê hunerên Ciwankariyayê li cem nivîserekê ji bo êka din çî li cem rewanbêjên 'Ereb û çî li cem rewanbêjên kurd dibe ji bo şyana van vekoleran bizivre, kû kîjan vekoler kûrtir ji huneran dinêrin û kîjan vekoler kêmtir bi hûrî ji van huneran dinêre, herwesa eve wê çendê jî ji bo me derdixe kû her êk ji edebên kurdî û 'Erebî, diguncît saxletên xwe hebe û diguncît êk ji wan jî yê din ji alyê hunerên Ciwankariya peyvan zengîntir be*”⁵³ ji bo nimûne; hejmarê hunerên Ciwankariya peyvan li cem nivîserê binavûdengê 'Ereb Ehmed Elhaşmî 16 Şazide hunern, lê li cem nivîserê binavûdengê Kurd 'Ezîz Gerdî ew hunerên bi Ciwankariya peyvan hatîne binavkirin hejmarê wan 8 heşt hunern, lê hejmarê hunerên Ciwankariya peyvan li cem Îdrîs Ebidulla Mistefa 21 bîst û yek hunern, di vêreda jiber hindê navên wan huneran nanivîsîn di rûpelên berê de me navên hunerên ciwankariya peyvan nivîsye. Herwesa derbarê nav danan li ser wan huneran nexasime li cem rewanbêjên kurd tê dîtin, ji bo nimûne hunerê Cînas kû bi Kurdî dibêjnê Regezdozî nivîserekê mîna Mela Ebidulkerîmî Muderîs ji cihê navê kurdî êkser navê 'Erebî bikaranîye jiber bandorê wî yê edebê 'Erebî, lê nivîserekê mîna 'Ezîz Gerdî li hember hunerê Cînas peyva Regezdozî bikaranîye. Eve jî girovê wê çenidêye kû ev

⁵² Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Le Edebî Kurdî Da*, Çapxaneyê Serdem, Slêmanî, 2003, r.21 – 22.

⁵³ Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Le Edebî Kurdî Da*, Çapxaneyê Serdem, Slêmanî, 2003, r.22.

nivîsere kêmtir ketiye libin bandorê edebê 'Erebî, çûnkî behra pitir ya wan peyv û destewajên bikarînayne Kurd ya petîne, nexasime di demê navkirina huneran gelek xwe ji peyvên biyanî parasitye.

2.4. Rolê Rewanbêjî-Ciwankariya peyvan Di Deqnasyê De

Bi gelemperî zanistê rewanbêjî rolekê mezin yê hey di xemilandina peyvan dinav têkistan de, nexasime ew beşê kû bi ciwankarya peyvan yê hatye naskirin, rolekê giring digêre di nîşandana têkistên edebî bi bihêzî, ew jî ji encamê xemilandina peyvên nav têkistan bi çendîn hunerên cuda nexasime ji alyê rûxsarê ve, çûnkî *“peywendiya wergirî digel têkistan de li gor zanistê rewanbêjî, tinê çêj wergirtine ji Ciwankariya nav têkistan, ew jî çêj wergirtina sînordare, bi wê watayê kû Ciwankariya pişkeke mezin ji rewanbêjyê bixweve digire, dinav rewanbêjyê jî de Ciwankariya peyvan hîndî kû wergir bi hunerên zimanî yên têkistê ji alyê rûxsarê ve mijûl dibe, ew qas li dîv kûratya têkistî û meremên nivîserî nabe, eger jî lêbigere çêdibe di çarçûveke xuyakirî da be kû biyavê têkistan dinav hunerên zanistê rewanbêjyê de hatye xwya kirin”*⁵⁴

Bikarîna tevahiya hunerên rewanbêjyê ji bo bihêzkirin têkistên edebye kû merem jê bihêz kirina têkistekê edebye li hember têkistekê din, ev jî vedigrîteve ser nivîserê têkistê û rada hebûna huneran dinav têkistan de, herweha *“Ciwankariya peyvan wan regezdoz desturan bixweve digire kû alyê hunerî û ciwanya edebê zelal dike ji alyê rûxsarê ve, mîna regezdozî, Hênanewe, Patkirdinewe, Gêranewe, Kerkirin, Têhelkêş”*⁵⁵ Ciwankariy pitir kar li ser ciwanya peyvan dike ji alyê şikil û şêwê ve çûnkî armancê wî ciwanya peyvan wtaya peyvan bihêz dike, eve jî girovê wê çendeye kû hunerên ciwankariya peyvan dinav têkistan de rolekê giring digêre, çûnkî *“ciwanya gotinan mîna wê çenidêye kû cilkeke ciwan bikeye ber bûkeke kirêt”*⁵⁶ ev nerîne bi awayekê Kurt û hûrd em dibînin kû cilên mirovan bi rûxsarê têkistên edebî berawird dike û nivîser divêt bêje kû rûxsarê ji dervey deqî bandoreke pir mezin yê hey ji bo ciwankirina naverokê deqê edebî, çûnkî her têkistek kû tijî hunerên ciwankariya peyvan be, ew deq tijî watayên bihêz dibe û herdem xwandevan çêj ji vî deqî werdigire ji egerê wan dahênanên dinav wê deqê edebî de yên hatîne kirin.

⁵⁴ Hêmin ‘Umer Xoşnaw, *Hêrmînotikay Şî'rî Sofîyaney Mehuy*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2016, r.32.

⁵⁵ Mela ‘Ebidulkerîmî Muderîs, *Bedî' û 'Eruzî Namî*, Çapxaneya Dar Elcahiz, Ç.1, Bexdad, 1991, r.6.

⁵⁶ Mela ‘Ebidulkerîmî Muderîs, *Bedî' û 'Eruzî Namî*, Çapxaneya Dar Elcahiz, Ç.1, Bexdad, 1991, r.6.

Rewanbêjî mîna zanistekê ciwankirina deqên edebî hatye naskirin, her deqekî kû hunerên rewanbêjî têda nebûn deqekê sadeye û xwandevanên wî kêmbûn, ciwankarya peyvan pişkeke ji rewanbêjyê û herweha rewanbêjî pêkulyê dike ji bo ciwankirina peyvan û wataya dinav têkistan de, çunkî “*layanên wêne û xeyal û estetîka û ciwankaryên dinav deqî de pêkhatineka êk alîkerin ji bo xuya kirina saxletên hozanî*”⁵⁷ bihêz kirina peyv û derbirîna dinav hozanan de ji armancên giringên rewanbêjiye, ji bo pitir bihêz kirina têkistan û mana têkistan bi nemirî “*Nivîsîna ciwan hizrkirineke ciwan digel wî daye*”⁵⁸ wata ew nivîsînê kû hatbîte xemilandin bi derbirînên ciwan eve dibe egerê ciwankirina nerînên nav têkistan, çunkî hemî nerînek ji nivîsandinê destpêdike û her nerînek dinav têkistê de nehête nivîsîn ew nerîn çû nirx û beha nîne, çunkî ew nerînê kû dihête nivîsîn di dawiyê de dibe jêderê ji dayk bûna têkistekê bihêz ji bo vekolînê.

Hozanvan regezên nû ji bo sîsteman dirust nake, tinê peywendî û pêkhatyên nû dinavbera wan de dirustdike, ji bo nimûne di bikarînan peyvan de her heman ew peyin kû dinav zimanî de hene, lê di jîngeheka hozanî û ronaneke taybet de bikardîne, bi van peyvan watayekê nû dirustdike, anku ew watayê kû nivîser bi xwe merem pê hay bi deqî bibexşe, kewate “*deq erkeke dû alî bixweve digire, ji alyekîve wataya dînîte ziman, ji alyekê din ve watayên nû berhem dîne*”⁵⁹ jiber hindê em dikarin zimanê hozanî bi vî rengî bideyne nasîn “*ku çewanya serederî kirineke taybete digel zimanê asayî de*”⁶⁰ anku hozan zimanekê rîs tûneye, herçende peyvên asayî û peyvên hozanî her êk peyvîn, lê hozanvan sîstemê asayya wê zimanê bikarnayne kû hozanan pê dinvîse, belkî sîstemekê nû çêdike, kû ketwarê derûnî û nerînên civakî xwe pê derbibire, çunkî hozanvan bi rêya ew peyvên asayyên nav xelkî kû paşî wê çendê wî kirne peyvên hozanî bi rêya ew awaz û nerînên kû ji bo peyvên asayyên nav xelkî dadirêje armanic û meremên xwe dinav deqîda dinvîse.

2.5. Jyana Salimî

Berhemê hozanvanê mezinê kurd, mîna deryayeka berfirhe kû tijî çendîn curên guher û mirwariyên giranbiha yên samana fikira netewê kurd, kû sînorekê mezin di-

⁵⁷ Slah Fezil, *Asalib Elşi'rye*, M. Dar Eledeb, T.1, Bîrut, 1995, S.15.

⁵⁸ Bîr Cîru, *El'slubyê*, TER. Dr. Weminzer 'Eyaşî, M. Mekitebe Eleha Elqewmî, T.1, Bîrut, 1987. S.22.

⁵⁹ Seyd Elxanmî, *Mentiq Elkeşif Elşi'ri*, M. Elmwese El'erebiye Lîlidrasat We Elneşire, T.1, Bîrut, 1999, S.47.

⁶⁰ 'Ebidulmnhm Tlmye, *Medaxil Îla 'Îlim Elcema Eledebî*, M. Elseqafe Lîltiba'e We Elneşire, Qahîre, 1978, S.113.

nav edebiyatên kurdî de girtiye “*navê Salimî bi tamamî; Ebidulrehman Begê kurê Mihemed Begê Qerecehenemê kurê Ehimed Begye, ji malbatê sahêbqirqne li sala 1805ê Mîladî ji bajêrê Silêmaniyê ji dayk bûye*”⁶¹ Salim mîna tev xwandevevanên serdemê xwe li mizgeftan xwandye, lê bi egerê xirabiya rewşa jyana xwe ew nekarye xwendina xwe tamam bike. “*evî hozanvanî sê naznav hebûyne ew jî Rencûr, Bîmar, Salim*”⁶² herdû naznavên Salim û Bîmar dinav hozanên wî da hene lê naznavê Rencûr dinav hozanên wî de tûneye, baweriya me ewe kû ew hozanên kû naznavê Rencûr têda hatye nivîsîn hatbine jinavçûn. Herwesa ew dû naznavên din Salim û Bîmar di piraniya hozanên wî de hatîne nivîsîn.

“*Salim êke ji hozanvanên sê kûçka Baban kû Nalî, Salim û Kurdî ne, ev hozanvanê bi nameyê xwe digel Nalî binavûdenge*”⁶³ Anku ew hozanên kû Nalî Salim ji bo hevdû hinartinê, Salim nûçe yê mîrnişîna Baban ji bo Nalî virêdike, kû wî demî Nalî ji Stenbolê bûye, herwesa ji alyê neteweyêve ev hozanvane xudan nerîneke netewî bihêz bûye, çunkî “*qûlbîna mîrnişîna Baban ji hemî kesan zêdetir kar li dilê Salimî kirye, mîna bulblike basik şikestî hêlana wî hervtî û çûye welatê Îranê, ji bo demekî bi derbederyê li Îranê jyana xwe borandiye, paşî demekî dirêj zivrye Silêmaniyê*”⁶⁴ herwesan ji alyê ziman zanîne ve Salimî zimanên 'Erebî û Farsî bi dirustî zanye, 19 nozde ji helbestên xwe bi Farsî nivîsîne û çendîn helbestên xwe Têhelkêşa hozanên 'Erebî kirine herweha ev helbestvane gelek baş edebê biyanî naskirî nexasime edebê Farsî. Edebyatê Farsî bandoreke mezin li ser vî hozanvanî hebûye, çunkî behra pitir ji wan hozanên hatîne têhelkêş kirin hozanên farsî bûne, zêdebarî bikarîna peyv û destewaje yê Farsî peyv û destewajên 'Erebî jî bikarînaye, herwesa bi qasek kêmp peyv û destewajên Tirkî bikarîniye. Eve jî girovê bikaranîna hebûna zanîna zimanên neteweyên hevsêye “*Salim di piraniya helbestên xwe de çîrok an jî bûyereke mêjûyî an babeteke olî an penid û şîret bi nerînên xwe û bi zimanê hozanêtiya xwe di çarçûva helbestên xwe rêk existiyê*”⁶⁵ herwesa hozanê Salimî hind bihêzin çêjê digehîne xwandevevanên têkistan dibexşe, çunkî helbestên Salimî tijî hunerên rewanbêjyêne û ev hunere jî zindî bûnê dide têkistên wî yê hozanî, eve hozanvane kesekê zîrek û hişyar

⁶¹ Marf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Sêyem, Çapxaneyê Wezareti Perwerde, Ç.1, Hewlêr, 2003, r.117.

⁶² Refîq Hilmî, *Şî'r û Edebyatî Kurdî*, Çapxaneyê Aras, Ç.2, Hewlêr, 2010, r.149.

⁶³ Karwan Osman Xeyat, *Beşêk Le Dîwanî Salim*, Çapxaneyê Çarçira, Ç.1, Hewlêr, 2012, r.23.

⁶⁴ Refîq Hilmî, *Şî'r û Edebyatî Kurdî*, Çapxaneyê Aras, Ç.2, Hewlêr, 2010, r.149.

⁶⁵ Mihemed 'Elî Qeredaxî, *Hengawêk Leser Rêgay Lêkolînewey Dîwanî Salim*, Çapxaneyê Hacı Haşım, Ç.1, Hewlêr, 2009, r.5.

bûye, çunkî bi rêya bikarîna hunerên rewanbêjî ceng dinavbera peyvên dirustkirîye, jiber kû ew peyvên dinav hozanên wî dane bi awayekê darêfîne kû her peyvek berpirsê bihêz kirna vî hozanî dike.

Hozanvan ew niştman perwere ku tev jyana xwe ji bo evîna welatî taybet kirye, ev vîne jî di hozanên wî da reng vedanê dike, ji bo nimûne çendîn hozan ji bo mîrnişîna Baban nivîsye, herwesa li demê hatina osmaniyan ji bo kurdistanê bi hozanan dilteng ya xwe derbirye “*Salim li sala 1869 li Silêmaniyê wexera dawiyê kirye, li girê seywan hetye veşartin*”⁶⁶ hozanvan 64 salan jyaye, tev jyana xwe ji bo xizmetkirina gelê kurd bikaranîye çu demekî ji pêxemet parey dest ji hestê netewî bernedaye. Nexasime wî demî kû ji Îranê bûye zimanê kurdî û hestê netewî jêderê nivîsîna hozanên wî bûyne, hozanên xwe bi awayekê nivîsîna kû hozanvanên pişt wî re hindî Nalî lasayya wî kirne û mifa ji zimanê hozanî û awayê vehandina hozanên wî wergirtine.

2.6. Bandorên Edebyatê Hevsê Li ser Helbestên Salimî

Rewşenbîr û xwandevanên kurd li mizgeftan xwandine, jiber kû zimanê 'Erebî zimanê olla Îslamêye, Quran û hedîsên pêxemberî S.L.X, zanistên olî û serf û nehwa 'Erebî û zanistên din feleknaşî û matmatîk û lojîk, bi zimanê 'Erebî hatîne xwandin eve jî bûye egerê wê çendê Salim û rewşenbîrên wî serdemî êkser bikevin bin bandorê zimanê 'Erebî jiber hindê zimanê helbestên Salimî tijî peyv û ristên 'Erebî bûyne. Eger bandorê zimanê 'Erebî li ser zimanê Kurdî bi rêya olla îslamê be, em dikarin bêjin bandorê zimanê Farsî li ser zimanê Kurdî bi hokareke edebye, Salim û hozanvan û xwandevanên Kurdên wî serdemî “*jiber nêzîkiya herdû zimanên Kurdî û Farsî ji hevdu xwandin û nivîsîna Farsî ji dev wan gelek bi sanahî bûye, jiber kû zû Farsî fêr bûyne*”⁶⁷ eşkiraye kû edebê Farsî xudan mêjûyeka dûr û dirêje û çendîn helbestvanên mîna Firdewsî û Hafîzê Şîrazî û Xeyam û Se'dî Şîrazî û Mewlana û çendîn helbestvanên din ku berhemê van hozanvanan sînore rojavayê derbaz kirye.

Li serdemê Salimî de ji rex zimanê 'Erebî re “*ziman û edebê Farsî digel quran û zanstên dînî li hemî mizgeft û xwandingehên olî dihate xwandin, di vê qonaxê de edebê farsî bandor li ser tev hozanvanên Kudî kirye û ev bandore jî bi eşkera ya*

⁶⁶ Qanatê Kurdo, *Terîxa Edebyate Kurdî*, Amadekrdnî Kawe Nemir, Çapxaneyaya Lîs, Ç.3, Amed, 2009, L 345.

⁶⁷ Emîn 'Elî Mutabçî, *Şa'îranî Kurd Ê Edebyatî Farsî*, Govarî Kolêcî Edebyat, Jimare 15, 1971, r.13.

*xuyaye*⁶⁸ ev bandore jî bi zelalî di zimanê helbestên Salimî de hest pê tê kirin, ji bo nimûne hunerê Pênicxişteki tinê di zimanê Farsî de heye û di zimanê 'Erebî de tûneye, kû ev hunere dinav hozanên Salimî de ya zelale, jiber kû çunkî çendîn helbestên Pênicxişteki dinav dîwana wî de hene û bi rêya têhelkêşa hozanên Hafizê Şîrazî hunerê Pênicxişteki dirustkirye, herweha bandorê ziman û edebiyatê Farsî di astên Fonolojî û Morfolojî û Lêksolojî bi eşkera di helbestên Salimî de derdikevin. Li gor vê çendê ziman û edebiyatê farsî bandoreke mezin ya edebiyatê 'Erebî li ser hebûye, bi rengê ne êkser careke din edebê Kurdî ketiye bin bandorê edebê 'Erebî , li gor nerînen Mes'ud Mihemedî hozanên qonaxa kilasîzim ji herdû aliyên rûxsar û naverokê ve bi hevawayê hozanên Farsî bûye “*helbestê Kurd ya Kurmanciya Navîn di destpêka peydabûna wê şêwe û çêj û darêtin û rûxsar, heta radekê naverok ji mîna helbestên Farsî bûye*”⁶⁹ Bandorê zimanê Tirkî jî bandoreke siyasî bûye, jiber kû kurdîstana başûrê li bin destelata dewlete osmaniyan bûye, lê digel vê çendê jî de bandorê zimanê Tirkî gelek bi kêmî hest pê tê kirin, çunkî ji aliyekê zimanê Tirkî û Kurdî û ser bi êk xêzana zimanî tûneye, mîna Kurdî û Farsî ji aliyekê din ve zimanê Tirkî zimanê xwandin û nivîsîne û rewşenbîrî nebûye li serdemê Salimî de ji wî deverî, jiber hindê zimanê hozanên Salimî têkeliye ji peyv û destewajên 'Erebî, Farsî û kurdî, lê di çarçûva yasayên Fonolojî, Morfolojî û Sîntakîsî zimanê kurdî hatye darêtin, anku Salim şyaye saxletên zimanê kurdî biparêze, herçende bandorê edebiyatê biyanî li ser bûye, lê saxletên zimanê kurdî dinav dêr bi dêrên hozanên wî de hest pê tê kirin, çunkî ew bandorê ku li ser wî bûye ji bo dahênanê di hozanên kurdî de bikarînaye.

Her derbarê zimanê hozanên kilasîzîma Kurdî ve, gelek ji nivîserên nerînen xwe li ser qonaxa kilasîzîmê nivîsye êk ji wan nivîserên kû li ser hozanên vî qaxê vekolî kirye Îzedîn Mistefa Resûle, dibêje “*bikarînana her zimanekê ji bo hozanan ku çarçûvê wan Kurdî be û peyvên wî bi bandorên edebiyatên Îslamî behra pitir têkel be ji peyvên kudî û peyvên neteweyên misilmanên hevsê û Kurdî hevpişkê nev hemî parçeyên kurdîstanê, digel regezê êk diyalêkta kurdî ku têda xuya be*”⁷⁰ ji alyê bandorên zimanê 'Erebî dinav dîwanên Salimî de hijmareka mezin ji peyv û ristên 'Erebî tên berçavan, kû hinek caran dinav parçe helbestekê de hejmara peyvên 'Erebî zêdetire ji peyvên Kurdî, nexasime di hozanên olî kû peyvên 'Erebî gelek tên

⁶⁸ Mihemed Nurfî, *Teesîrî Zman û Edebî Farsî Leser Zmanî Edebî Kurdî*, Govarî Kolêcî Edebyat, Jimare 18, 1974, r.75.

⁶⁹ Mes'ud Mihemed, *Payê Şîrî Kurdî Sedey Nozdehem*, Govarî Beyan, Jimare 14, 1974, r.13 – 14.

⁷⁰ Îzedîn Mistefa Resul, *Edebyatî Nuêy Kurdî, Çapxaneya Fêrkrdnî Bala, Ç.1, Hewlêr, 1990, r.59.*

berçavan, lê hemî ev peyv û riste di çarçuvê yasayên zimanê kurdî yê hatîne danan, ji aliyê Fonolojî ve hinek deng di peyvên 'Erebî de hene û di peyvên Kurdî de tûneye û bi dengên din tên gotin, mîna dengên (ذ, ظ, ض) kû bi dengê (Z) tê derbirîn, herweha dengê (ث) bi dengê (S) tê derbirîn eve hemî çû ji wataya peyvên û muzîka peyvên nahête gihorîn, pêdivî wê çendê nake kû xwandevanên Kurd bi hevawayê 'Ereban van dengan bixwînin. Ji aliyê Morfolojîyê ve di çû cihanda nahête berçavan kû cudahî dinavbera nîşên nêr û mêyan de bête kirin, bi vî awayî di diyalêkta navîn de bi çî rengê ev ciyawazî nahête kirin, jiber kû di diyalêkta Soranî de çû nîşanekê ji bo cudakirina nîşên nêr û mê tûneye.

Lê yasayên sîntaksên zimanê kurdî çû gihorîn têda dirust nebûye libin bandorên zimanên biyanî de, ji bo nimûne pişikên serekî yê ristên kurdî bi vî rengî tên rêzkirin Biker, Berkar, Kar. Em dibînin di verede karê ristê nehatiye berî pêkhênerên din yê ristê mîna zimanê 'Erebî kû karê ristê ji beriya hemî pêkhênerên risteye, eger jî pêş û paş bi pêkhênerên ristê hatibine kirin peywendî bi pêdivyên hozanê ve bûye, anku heke dinav helbestê de kar di navenda ristê de hatibe, hozanvan bi teknîk kar li wê derê nivîsye eve jî diyardeke normale dinav zimanê hozanê de bi çû rengê peywendî bi bandorên zimanê 'Erebî ve tûneye, çunkî ev helbestvane weke yarîkirin bi peyvên ev şewazê bikarînaye. Herwesa bandorên zimanê farsî li ser zimanê hozanên Salimî pir derdikeve çunkî ev hozanvane 19 ji hozanên xwe bi zimanê Farsî nivîsye. Di çendîn cihan de hozanên xwe Têhelkêşa hozanên Farsî kirye, ev bandore tinê di astê Lêksolojî nesekinaye belkî hinek diyardeên Morfolojî vegirte, ji bo nimûne morfîma (ha) di zimanê Farsî de nîşana komiye kû di hozanên Salimî de pir hatîne bikarînan. Anku bandorên zimanên 'Erebî û Farsî û Tirkî pir eşkere dinav hozanên Salimî tên meyzandin, her zimanekî jî bi radekê destnîşankirî bandor li ser hozanên Salimî de hebûye, eve jibî wê çenidê kû wî çendîn hozan Têhelkêşî hozanên 'Erebî û Farsî kirine, xwe heta çendîn hozan bi zimanên 'Erebî û Farsî nivîsîne lê pitir bandorên zimanê Farsî li ser wî hebûye.

3. Ciwankariya peyvan di Helbestên Kurdî yên Salim de

3.1. Hunerê Regezdozî yê

3.1.1. Pênasa Hunerê Regezdozî yê li Cem Nivêseran

“Regezdozî pêktêt ji wê çenidê kû qasek ji peyvan ji alyê rêz û cor û şêwe û hejmara tîpan an wekhev bin an jî cuda bin, wataya wan cuda be”⁷¹ ev pênase curek ji sadeyyê dinav wî de tê meyzandin û heman pênasê zanistye kû li cem nivêserên din hatye kirin ji bo regezdozî yê, lê bi renekê normal pênasê regezdoz yê dike “Regezdozî van dû peyvin kû di şêwê de hevawane lê watayên wan jêk dîr be û wekhev nebe”⁷² ev pênase jî bi renekê sade pênasê regezdozî kirye û gelek ji pênasê serî nêzîke “regezdozî êke ji hunerên rewanbêjyê kû pêktêt ji dû peyvan ji derbirînê de wekhev bin an jî hev biçin lê di watayan de cuda bin”⁷³ li gor nerînên me ev pênase zanistî ture ji pênasên din, çunkî zanistî tir çûye dinav kûratya regezdoz yê.

3.1.2. Curên Hunerê Regezdoz yê

3.1.2.1. Regezdoz ya Temam

“ev regezdozye kû peyv di rûxsar de tamam wekhev bin, anku ew peyv ji aliyê hejmar û şêwe û curê rêz bûnê tîpan wekhev bin çû cudahî dinavbera wan de nebe, lê ji alyê watayê ve her peyvek wataya xweser hebe”⁷⁴ Regezdoz ya tamam jî ji çenid curekê pêk têt kû evên li xwarêne:

3.1.2.1.1. Regezdozî ya Temam ya Hevresen

“Pêktêt ji hemî ew peyvên ber regezdozî ya hevresen dikevin hevresen bin, anku ji êk resen bin, weke hemî nav bin an hemî kar bin”⁷⁵ ji bo nimûne:

“Le fikrî pasî îsmet da bezahîr dûrbînêke
Le hukmî dûrbîna qed be min rêgey guzer nada”⁷⁶

⁷¹ Arî Sibhî Ehimed, *Xezel Ê Qesîdekanî Hacî Qadrî Koyî Le Jêr Tîşkî Lêkolîneweda*, Çapxaneyê Rojhelat, Hewlêr, 2009, r.93.

⁷² ‘Ebidulwahîd Mişîr Dzeyî, *Pragmatîk Ê Rewanbêjî*, Çapxaneyê Rojhelat, Ç.1, Hewlêr, 2015, r.133.

⁷³ Ehmed Elhaşmî, *Cewahir Elbelaxe Fî Elme’ani We Elbeyan We Elbedî’*, M. Else’ade, T.22, Qahîre, 1960, S.243.

⁷⁴ Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî’rî Kilasîkî Kurdî*, 2011, r.225.

⁷⁵ ‘Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, Bergî Duwem, 1975, r.10.

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*dûrbîn*) di nîv dêrên êkê û dwê dirust bûye. Peyva êkê merem ji wê kesye kû gelek ji bajêr û gunidan geryaye û dunya meyzandye. Peyva dwê bi ramana amerê Dûrbîn têt kû tiştên dîr pê têt meyzandin. Herdû peyv jî navin.

*“Zelîlî nefî emimare, şkstî bîmî emimare
Penahit bo 'elî bêne, mero bo bû 'elî sîna”⁷⁷*

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*emimare*) di nîv dêrê êkê dirust bûye. Peyva êkê bi ramana xapînok têt anku ew kesê xelkî dixapîne. Peyva dwê bi ramana Mar têt ku gyandarekê kujekê û zêhîr heye û hinek cara mirovan dikuje. Herdû peyv navin.

*“Kêşa gêsû begoşey rûy yara
Çi cînsî bê le mara, bê mara?”⁷⁸*

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*bê*) di nîv dêrê dwê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana wê çendê têt ku cinse wî li Mar be anku Serederya wî mîna Marye. Peyva dwê bi ramana kesekî têt kû hatin û çûnê bike. Herdû peyv karin.

*“Şetî eşkim, debê her bê be rûma
Heta bê behrî, ax denkiz, be rûma”⁷⁹*

Dinavbera herdû peyvên (*be rûma*) di nîv dêrên êkê û dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana ser û çava têt anku rûyê mirovî. Di peyva dwê bi ramana welatê Rom têt kû merem jê Tirkyê ye. Herdû peyv navin.

*“Demî wesfî demî tîxt delerzê
Rengî gerdin beser textey gelûma”⁸⁰*

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*Demî*) di nîv dêrê êkê dirust bûye. Peyva êkê bi ramana wext têt anku ew demê em diburînin. Peyva

⁷⁶*Dîwanî Salim*, Kokiridnewe û Lêkdanewey Mela Ebidulkerîmî Mûderîs Fatîh Ebidulkerîm û Mihemedî Mela Kerîm, Bergî Yekem ,Çapxaneyê Bnkey Jîn, Çapî 1, Slêmanî, 201, r.5.

⁷⁷*Dîwanî Salim*, ‘Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.27.

⁷⁸*Dîwanî Salim*, ‘Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.77.

⁷⁹*Dîwanî Salim*, ‘Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.123

⁸⁰*Dîwanî Salim*, ‘Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.123.

dwê bi ramana serê şûrê têt, ew şûrê ji serdemê kevin ji bo şerê dihate bikarînan. Herdû peyv navin.

*“Bê temaşay xalî to, xalî le merdum dîdema
'Eksî ew bû merdumî dana le perdey dîdema”⁸¹*

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*merdum*) di nîv dêrên êkê û dwê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana çavê yara wî têt. Peyva dwê bi ramana xelkê ser rûyê erdî têt. Herdû peyv navin.

*“Hunermendî nîye bo dam, eger yek def'e mahî girt
Xemî zulfi perêşant bemû sed def'e mahî girt”⁸²*

Dinavbera herdû peyvên (*mahî*) di nîv dêrên êkê û dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana Masî têt kû dinav avê daye û samaneka giran bihayê pîranîya welatên cîhanê ye. Di peyva dwê bi ramana Heyv têt kû merem jê ewe ku biskê yara wî dikare di êk demda Masî û Heyvê bigre. Herdû peyv navin.

*“Rengî rûm rabûrd drêxa, baz le hesret rûyî dost
Xem buwe qeddim le xem da herweku ebroyî dost”⁸³*

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*dost*) di dûmahya nîv dêrên êkê û dwê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana dost û yara wî têt. Peyva dwê bi ramana kûrbûneve pişta mirovî têt, kû merem jê ewe kû ji kovanên yara xwe mîna birûyê wê pişta min kûr bûye. Herdû peyv navin.

*“Leçemen seruy rewanm ke 'eyan hat û guzeşt
Le sruşkim beruxa coyî rewan hat û guzeşt”⁸⁴*

Dinavbera herdû peyvên (*rewan*) di nîv dêrên êkê û dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana rast û rêk û pêk têt mîna bejnê yarê. Di peyva dwê bi ramana zelal ya avê têt kû merem jê ewe kû çavê xwe kirye rûbar û herwesa rondikên xwe bi ava rûparî daye nasîn.

*“Srûrm pest û bala deste mîhnet
Ze'îfî quwetî sandim le quwetî”⁸⁵*

⁸¹*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.126.

⁸²*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.177.

⁸³*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.190.

⁸⁴*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.195.

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*quwet*) di nîv dêrê dwê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana hêz û şyan têt. Peyva dwê bi ramana şyan û mikumî têt. Hozanvan dibêje min çû hêz nemaye û yê pîr bûyne, lê em nizamin merem ji kîjan pîrye. Herdû peyv navin.

“*Dexîltan bim, meken lem tekye, tekye
Nîye eslen umêdî îstîqamet*”⁸⁶

Dinavbera herdû peyvên (*tekye*) di nîv dêrê êkê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana cihê derwîşan têt ew cihê Derwîş û şêx dinav de dixwînin. Di peyva dwê de bi ramana pişt girêdan têt kû bi gelemperî merem jê ewe kû nabe pişt bi derwêşan bê girêdan. Herdû peyv navin.

“*Reşe, tîxî şekimî ker be reşit
Reşe, papaxî reşit rast be reşit*”⁸⁷

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*Reşe*) di nîv dêrên êkê û dwê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana rengê reş têt, kû saloxdana kesekî dike û jiber evîna xwe bo wî kesî bi reşe dîne navkirina. Peyva dwê bi ramana cendekê zelaman têt kû behisê xirabiya kesekê dike. Herdû peyv navin.

“*Kemî rîte qedemt merdumî çawm, lû'lû'?*
Arezûy çake le dest merdumî bê kare ebes”⁸⁸

Dinavbera herdû peyvên (*merdumî*) di nîv dêrên êkê û dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana çavê yara wî têt. Peyva dwê bi ramana xelkê ser rûyê erdî têt. Herdû peyv navin.

“*Key be salim derdeçê salim kebû
Seydî sehrayî şikarî şehsewar*”⁸⁹

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*salim*) di nîv dêrê êkê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana rewşa saxlemî ya mirovî têt, kû merem ewe çû nexweşî jêra nebe. Peyva dwê bi ramana naznavê hozanvanî bi xwe têt. Herdû peyv navin. Hozanvan carek navê xwe ji şûna nexweşî bikarînaye carek jî mîna navê xwe bikarînaye.

⁸⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.236.

⁸⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.237.

⁸⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.238.

⁸⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.242.

⁸⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L291.

*“Penahî birde ber çawit dilî teng
Deway bîmar eger bikrê be bîmar”⁹⁰*

Dinavbera herdû peyvên (*bîmar*) di nîv dêrê dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana wê çendê têt kû çareser ya wê ya bi-zehmete. Peyva dwê bi ramana serxoşî têt, anku ew kes hinde aşiq be her kû çavê wî bi yara xwe ket mîna serxoşan lê bê. Herdû peyv navin.

*“Maliş dedey be dem le demî xwabî subih dem
Hem zulfî qîr gûne û hem çîhrey qemer”⁹¹*

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*dem*) di nîv dêrê êkê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana nefesê mirovan têt, kû gelek caran mirov jiber kul û kovana ahên sar dikêşe. Peyva dwê bi ramana wext têt. Herdû peyv navin.

*“Gwêy felek ker bû leber nale û nefîrî ehî şar
Lamekanî girt seday nale û fîxan û elaman”⁹²*

Dinavbera herdû peyvên (*nale*) di nîv dêrên êkê û dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana qêj qêj û hewara mirovan têt. Peyva dwê bi ramana ahên mirovan têt, kû mirov jiber kul û kovana ahên sar dikêşe. Herdû peyv navin.

*“Werne qadir to dezanî qet kesê qadir nebû
Wa bemeqhurî bka, qadir esîrî romîyan”⁹³*

Di evê dêrê de dinavbera hersê peyvên (*qadir*) di nîv dêrên êkê û dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana Xudê têt kû dirust kerê eriz û asmana ye. Peyva dwê bi ramana mirovên xudan şyan û bihêz têt. Peyva sêyê bi ramana navê kesekî têt, kû navê wî qadire çêdibe merem ji Qadir Paşa Baban be. Hersê peyv navin.

*“Ta taqe le sînem dlî xemdîde le koy tû
Meşxûle, weku kû kûyî wêrane, be kû kû”⁹⁴*

Dinavbera herdû peyvên (*kû kû*) di nîv dêrê dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana Pepûk têt kû gyandarekê koviye û li

⁹⁰*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.294.

⁹¹*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.331.

⁹²*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.544.

⁹³*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.546.

⁹⁴*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.649.

çiyayan dijît. Peyva dwê bi ramana kotra kovî têt, kû gyandarekê koviye û rengê wê reşe. Herdû peyv navin.

*“Ta reqîb hazire, gahî hezere nek hezere
Ew sege ta le kemîn bê, hezerîşm sefere”⁹⁵*

Di nîv dêrê êkê de, dinavbera herdû peyvên (*hezere*) Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana kemîn têt, kû merem jê ewe kû kesek ji bo kesekê din bidane daku wî bêşînit anku bikuje. Peyva dwê bi ramana xwe parazitîn têt, kû merem jê ewe daku dujmin te ne êşîne divêt mirov li mala xwe bisekine. Herdû peyv navin.

*“Yar salim kiwa le hîcra, roj û şew, cuz yadî yar?
Meylî tenhay dekem, ta yadî dilber yar me”⁹⁶*

Dinavbera hersê peyvên (*yar*) di nîv dêrê êkê û dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê û dwê bi ramana yar û dost têt. Peyva sêyê bi ramana harîkar têt, anku ew kesê di demên pêdivî de harîkar ya xelkî dike. Hersê peyv navin.

*“Munherîf nabim le rêy îşiq, er şewî yalda brom
Zulfî wek yaldayî dildarm heta destgîrme”⁹⁷*

Dinavbera herdû peyvên (*yalda*) di nîv dêrên êkê û dwê de Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana dîma şeve li payîzê têt kû dirêjtirîn şevê her salêye. Peyva dwê bi ramana rengê reş têt. Herdû peyv navin.

*“Seydî seydim, gerçî seyyadim mudam
Ahuyî nexçîrî to şêraneye”⁹⁸*

Di destpêka nîv dêrê êkê de dinavbera herdû peyvên (*seyd*) Regezdoz ya Temam ya Hevresen dirust bûye. Peyva êkê bi ramana nêçîrvanî têt. Peyva dwê bi ramana nêçîr têt anku ew tiştê dibe nêçîr. Herdû peyv navin.

“Sûrî axa seyri xoşe, sûrî xoşî ser xire

⁹⁵*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.763.

⁹⁶*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.798.

⁹⁷*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.800.

⁹⁸*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.861.

*Sûr le sûra ser reqî kirid, tîkî tumanî drî*⁹⁹

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*sûrî*) di nîv dêrê êkê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana şehiyan û davet têt. Peyva dwê bi ramana leşê zelamî têt. Herdû peyv navin.

*“Sed zorî rostemî nîyetî zorî sîm û zer
Talî' eger ze'îfe, nebey pence ba qewî”*¹⁰⁰

Regezdoz ya Temam ya Hevresen dinavbera herdû peyvên (*zorî*) di nîv dêrê êkê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana xonakrî û sitemkarî têt, kû zûlmê li xelkî dike. Peyva dwê bi ramana destelat û şyan têt. Herdû peyv navin.

*“Bedengî teplî baz ger bazî berda
'uqab wek karewan mate le hemley”*¹⁰¹

Dinavbera herdû peyvên (*baz*) Regezdoz ya Temam ya Hevresen di nîv dêrê êkê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana dúbarekirin têt. Peyva dwê bi ramana Eliho têt, kû gyandarekê koviye û li rûbar û deryayan de masîyan dixut. Herdû peyv navin.

3.1.2.1.2. Regezdozî Ya Temam Ya Teba

“Pêktêt ji dû peyvan kû herdû regezdozî ya temam ji wan dirust be, herdû peyv di resen û regez de jêk cuda bin, ji bo nimune êk nav be ya din kar be”¹⁰²

Jiber hindê dibêjne van dû peyvan Regezdozî ya Teba, çunkî herçende regezên wan cudaye lê di şewê de êk tiştin û gelek digel hevdû di guncayne, herdû peyv di sînorê êk huner de dimînin, ciwanyeka mezin didin hozanê, curên regezdoz ya teba evene:

3.1.2.1.2.1. Regezdozî Ya Temam Ya Teba Yê Nav û Kar

Çêdibe êk ji van peyvan nav be êk jî kar, anku ew peyvê kû dibe sedemê dirustbûna Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û Kar êk ji wan peyvan nav be êk jî kar be. Ev dû peyve dibine bingehê pêkhênana hunerê regezdozyê, ji bo nimune:

⁹⁹*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.905.

¹⁰⁰*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.930.

¹⁰¹*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.939.

¹⁰² Elaedîn Secadî, *Xoşxwanî Ê Guzerkarî Ê Rewankarî Ê Ciwankarî*, Çapxaneya Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 1986, r.127.

*“Muhîtî arîzî dilber leserda zulfî prçîn hat
Be dewrî baxî gulda, terzî sunbul, mehizî perjîn hat”¹⁰³*

Herdû peyvên (*hat*) li dûmahya nîv dêrê êkê û dûmahya nîv dêrê dwê Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û Kar dirust kirye, Peyva êkê bi ramana hatin xwar têt, merema hozanvanî ewe kû biskê yara wî hatye xwar. Peyva dwê bi ramana şîn bûn û pişktivîn têt, kû merem ji şîn bûna gul û gulzare di werzê biharê de. Peyva êkê kare û ya dwê nave.

*“Bo sefî mecnûn lan, ahû le rem da ram debê
Berre ahûy min le paş ram bûn debê bnyad rem”¹⁰⁴*

Herdû peyvên (*rem*) yên bûyne jêderê bingehî dirustbûna Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û Kar. Çunkî Peyva êkê bi ramana ravkirina gyandarên kovî têt. Peyva dwê bi ramana wê çendê têt kû mirov ji tirsê de bireve. Peyva êkê nave û ya dwê kare.

*“Mehî dey hat û çû, rabûrd şewî dey
Desa dey mey biden, emca paye pey”¹⁰⁵*

Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û Kar dinavbera herdû peyvên (*dey*) li destpêka nîv dêrê êkê û destpêka nîv dêrê dwê dirust kirye, Peyva êkê bi ramana êkem Heyvê zivistanê têt di sala hetav ya Îranê de. Peyva dwê bi ramana karê daxazî têt, wata dê vexwarinê bînin. Peyva êkê nave û ya dwê kare.

*“Bexudayê ke roj û şew dênê
Dilî min her wîsalî ew dênê”¹⁰⁶*

Herdû peyvên (*dênê*) li dûmahya nîv dêrê êkê û dûmahya nîv dêrê dwê Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û Kar dirust kirye, Peyva êkê bi ramana înan têt, merema ji înana şev û rojê ye ji alyê Xudê ve. Peyva dwê bi ramana nirx û biha têt. Peyva êkê kare û ya dwê nave. Eve jî ciwanyeka mezin bi vî hozanî daye, çunkî di nav dû peyvên wekhev de dû watayên cuda dirust kirye.

¹⁰³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.165.

¹⁰⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.487.

¹⁰⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.934.

¹⁰⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.1020.

3.1.2.1.2.2. Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalnav

Çêdibe dû peyv êk hevalnav be ya din nav be, anku ew peyvên kû dibine sedema dirustbûna Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalnav gelek normale ku êk ji wan peyvnan nav be saloxdana navekî bike û peyva din nav be.

“Le pestî bo dekêşin zahîdî xafil çley xelwet?

Biçin aşiq be bala bin, biçin bo mertebey bala”¹⁰⁷

Di nîv dêrê dwê de dinavbera herdû peyvên (*bala*) Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalnav dirust kirye, Peyva êkê bi ramana bejina mirovî têt. Peyva dwê bi ramana cihên bilinid û baş têt. Peyva êkê nave û ya dwê hevalnave saloxdana bejine bilind ya yara xwe dike

“Reşe, dîdey pest ezbeskî reşe

Şewe kafûre le çawî çalî reşî”¹⁰⁸

Di nîv dêrê êkê de dinavbera herdû peyvên (*Reşe*) Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalnav dirust kirye, Peyva êkê navê kesekê ye û navê wî (Reşîd)e û hatye kurtkirin. Peyva dwê bi ramana rengê reş têt. Peyva êkê nave û ya dwê hevalnave.

“Be dest to qenide bom, zehrî helahîl

Le lam zehre bebê to lezizetî qenid”¹⁰⁹

Herdû peyvên (*qenid*) di nîv dêrên êkê û dwê de Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalnav dirust kirye, Peyva êkê bi ramana şîrîn mîna hingivînê têt. Peyva dwê bi ramana şekir têt. Peyva êkê hevalnave û ya dwê nave.

3.1.2.1.2.3. Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalkarê demî

Çêdibe êk ji wan dû peyvnan nav be û ya din hevalkarê demî be, anku hevalkarê demî ku watayê demekî xuyakirî dide digel navekî pêkve dibine jêderê dirustbûna Regezdozî Ya Temam Ya Teba, eve jî ciwanyeka mezin dide wê hozanê. Ji bo nimune:

¹⁰⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.18.

¹⁰⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.238.

¹⁰⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.260.

*“Du'am bo def'i çawî bed le husnî to dekirid emşew
Le dem ruh Elamîn ta subih dem awazî amîn hat”¹¹⁰*

Regezdoz ya Temam ya Teba dinavbera herdû peyvên (*dem*) di nîv dêrê dwê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana dev û didinên mirovî têt. Peyva dwê bi ramana demê sipêdê têt. Peyva êkê nave û ya dwê hevalkarê demye. Bi vê sedemê jî Regezdozî Ya Temam Ya Teba yê Nav û hevalkarê demî dirust bûye.

3.1.2.1.3. Regezdozî Ya Temam ya Sade

“Regezdoz ya Temam ya Sade ewe kû peyvên wê çû zêdehyek digel nebe, anku ew peyv sade bin û pêşpirtik û paşpirtik pişikdaryê di pêkhênana wî de neken”¹¹¹ Bi vê sedemê jî Regezdozî Ya Temam ya Sade dirust dibe.

*“Salim ême le yema zehmete salim derçîn
Wa le gêjawî siruşka be şena wek semekîn”¹¹²*

Regezdoz ya Temam ya Sade dinavbera herdû peyvên (*salim*) di nîv dêrê êkê de dirust bûye. Peyva êkê bi ramana navê hozanvanî Salimî têt. Peyva dwê bi ramana saxlemî û kesek ku nexweş nebe têt. Herdû peyv sadene çunkî pêşpirtik û paşpirtik pişikdaryê di pêkhênana wî de nekiriye.

3.1.2.2. Regezdoz ya Netemam

“Regezdoz ya Netemam ewe kû ew peyvên dibine Regezdozî divêt êk ji van mercên henê têda nebe, curê tîpan, rêz kirina tîpan, şêwê tîpan, hejmara tîpan”¹¹³ curên regezdozî ya Netemam gelekî çunkî Regezdozî ya Netemam zêdetir ji curekê hey, her êk li hember corên din ji hinek tiştan cudane, an curên tîpa wan, rêz kirina tîpa wan. Şêwê tîpa wan, hejmara tîpa wan ji hevdû cudane, curên regezdozî ya netemam evene:

¹¹⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.166.

¹¹¹ Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjyekan Le şî'ri Kilasîkî Kurdî Da*, r.232.

¹¹² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.605.

¹¹³ Ehmed Elhaşmî, *Cewahir Elbelaxe Fî Elme'anî We Elbeyan We Elbedî'*, 1960, S.244.

3.1.2.2.1. Regezdoz ya Netemam yê Zêde

“Pêktêt ji dû peyv an kû êk bi tîpekê an zêdetir ji peyva din cuda be, vêca tîpa cuda ji peyva êkê be an dwê”¹¹⁴ herwesa derbarê curên regezdozyê zêde “çêdibe cudahya dinavbera dû peyv an di êk tîp an dû tîpan da be, anku peyvek tinê tîpek ji ya din zêdetir be, an jî dû tîp ji peyvê din zêdetir be, ev tîpa zêde an ji destpêka peyvê an ji navîna peyvê an ji dûmahya peyvê xuya dibe”¹¹⁵ curên regezdozî ya netemam yê zêde evên li xwarêne:

3.1.2.2.1.1. Regezdozîya Netemam yê Zêde ya Nav

Çêdibe ew dû peyv Nav bin, anku ew dû peyvê dibine sedemê dirustbûna hunerê Regezdozîya Netemam yê Zêde herdû peyv Nav bin, rolekê sereke dibîne di pêkînanana hunerê regezdozyê de. Ji bo nimûne:

“Xudawend çadrî dunyay dînîyet serapa kirid
Bîrun sûsûr û ayîne, derûn rengî eza peyda”¹¹⁶

Regezdozîya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (*sû*, *sûr*) dirust bûye, jiber kû peyva dwê tîpek zêdetire ji peyvaêkê, ew tîpa zêde jî tîpa (r)ye kû ji dûmahya peyva dwê de hatye nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana alyê rast têt û Peyva dwê bi ramana şehiyan û govenid têt. Herdû peyv navin

“Çi tekanêke xudaya heresî cewrî hebîb?
Bo nbhalî emelim berg û ber û rîşe nema”¹¹⁷

Dinavbera herdû peyvên (*berg*, *ber*) Regezdozîya Netemam yê Zêde dirust bûye, jiber kû peyva êkê tîpek zêdetire ji peyva dwê, ew tîpa zêde jî tîpa (g)ye kû ji dûmahya peyva êkê de hatye nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana belgên daran têt û Peyva dwê bi ramana fêqî têt. Herdû peyv navin

“Weh weh çî mecilîsê bû, dwê şew le dîde û dil
Dilber şerabî gêra, salim kebabî hêna”¹¹⁸

¹¹⁴ ‘Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, Bergî Yekem, Çapxaneya Dar Cahiz, Bexdad, 1972, r.113.

¹¹⁵ ‘Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, Bergî Duwem, Çapxaneya Şarewanî, Hewlêr, 1975, r.17 – 18.

¹¹⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.64.

¹¹⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, 129.

¹¹⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.135.

Dinavbera herdû peyvên (*dil, dilber*) Regezdozîya Netemam yê Zêde dirust bûye, jiber kû peyva dwê sê tîp zêdetire ji peyva êkê, ew tîpên zêde jî tîpên (ber)in kû ji dûmahya peyva dwê de hatîne nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana dilê mirovan têt û Peyva dwê bi ramana dost û yar têt. Herdû peyv navin

*“Heway maçî le bit rêy benderî zulfî be dil win kirid
Musafîr bo siyahet sûyê çîn çû, tûşî maçîn hat”¹¹⁹*

Regezdozîya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (*çîn, maçîn*)di niv dêrê dwê de dirust bûye, jiber kû peyva dwê tîpek zêdetire ji peyva êkê, ew tîpên zêde jî tîpên (ma)n kû ji destpêka peyva dwê de hatîne nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana welatê Çîn ê têt û Peyva dwê bi ramana lêvên mirovî têt. Herdû peyv navin

*“Le tay mîzanî îşîqa ser çî sûke!
Le kêşî dilbere bê wezne bo kêş”¹²⁰*

Regezdozîya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (*kêşî, kêş*)dirust bûye, jiber kû peyva dwê tîpek zêdetire ji peyva êkê, ew tîpa zêde jî tîpa (î)ye kû ji dûmahya peyva êkê de hatye nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana ola pîroza îslamê têt û Peyva dwê bi ramana Terazî têt. Herdû peyv navin

*“Dadenîşê dilberm, şew bê çirax
Şewq eda rûy gewherî wek şew çirax”¹²¹*

Regezdozîya Netemam yê Zêde di niv dêrê êkê û di niv dêrê dwê de dinavbera herdû peyvên (*Şew, Şewq*)dirust bûye, peyva dwê tîpek zêdetire ji peyva êkê, ew tîpa zêde jî tîpa (q)e kû ji dûmahya peyva dwê de hatye nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana şev têt û Peyva dwê bi ramana ronahî têt. Herdû peyv navin

*“Piştî naw tabûtî rextit, piştî sîweylî şikanid
Piştîwanî bane û tajen û qewmî tajeban”¹²²*

Herdû peyvên (*tajen, tajeban*) Regezdozîya Netemam yê Zêde dirust kirye, peyva dwê sê tîp zêdetirin ji peyva êkê, ew tîpên zêde jî tîpên (ban)in kû ji dûmahya peyva dwê de hatîne nivîsîn. Herwesa peyva êkê û Peyva dwê navên dû gundanin li Rojhelata kurdistanê li bin destê Îranê.

¹¹⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.165

¹²⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.390.

¹²¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.402

¹²² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.512

“*Hâkime romî Leser textî suleymanî, drêx
Kewte destî dêwî dîn muhrî suleyman”¹²³*

Regezdozîya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (*suleymanî, suleyman*) dirust bûye, jiber kû peyva êkê tîpek zêdetire ji peyva dwê, ew tîpa zêde jî tîpên (î)e kû ji dûmahya peyva êkê de hatye nivîsîn. Peyva êkê bi ramana bajêrê Silêmaniyê têt û Peyva dwê bi ramana Hezretê Suleyman S.X.L têt.

“*Espî to tazîy û eto tazî
Ta zyane be tazî er ta zan*”¹²⁴

Regezdozîya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (*tazîy, tazî*) dirust bûye, jiber kû peyva êkê tîpek zêdetire ji peyva dwê, ew tîpa zêde jî tîpa (y)e kû ji dûmahya peyva êkê de hatye nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana rîs têt û Peyva dwê bi ramana bilez têt. Herdû peyv navin

“*Be xur xwên bêne, ey girye le çaweyçawî tarî min
Hena lazim bû bo pêy segî kuêy nsarî min*”¹²⁵

Di niv dêrê êkê de dinavbera herdû peyvên (*çawey, çawî*) Regezdozîya Netemam yê Zêde dirust bûye, jiber kû peyva êkê tîpek zêdetire ji peyva dwê, ew tîpa zêde jî tîpa (e)ye kû di navîna peyva êkê de hatye nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana jêderê rondikan têt û Peyva dwê bi ramana çavên mirovî têt. Herdû peyv navin

“*Xeyalim tîje wek elmas û hem lem fikreda kole
Le banî xatemî dilber meger yaqûte ya qûte?*”¹²⁶

Ji dûmahya niv dêrê dwê de dinavbera herdû peyvên (*yaqûte, qûte*) Regezdozîya Netemam yê Zêde dirust bûye, jiber kû peyva êkê dû tîp zêdetire ji peyva dwê, ew tîpên zêde jî tîpên (ya)ye kû ji destpêka peyva êkê de hatye nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana ber têt kû curekê berê giran bihayê û Peyva dwê bi ramana xwarin têt. Herdû peyv navin

“*Mekanî dil le gêsûte, ebed hergîz cuda nabê
Le lengerda, heta mahî legel gacûte, wa cûte”¹²⁷*

¹²³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.528.

¹²⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.555

¹²⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.567

¹²⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.745

¹²⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.746

Regezdozîya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (*gacûte, cûte*)dirust bûye, peyva êkê dû tîp zêdetire ji peyva dwê, ew tîpên zêde jî tîpên (ga)ye kû ji destpêka peyva êkê de hatîne nivîsîn. Herwesa peyva êkê navê gyandarekê ye û Peyva dwê bi ramana rêk û pêk têt. Herdû peyv navin

“*Meh û mahî be cewlanî deka rêş*
Le zerbî simmî espa û nukî nêzey”¹²⁸

Ji destpêka nîv dêrê êkê de dinavbera herdû peyvên (*Meh, mahî*) Regezdozîya Netemam yê Zêde dirust bûye, peyva wê tîpek zêdetire ji peyva dwê, ew tîpa zêde jî tîpa (î)ye kû ji dûmahya peyva dwê de hatye nivîsîn. Herwesa peyva êkê bi ramana Heyvê têt û Peyva dwê bi ramana Masî têt. Herdû peyv navin.

3.1.2.2.1.2. Regezdozîya Netemam yê Zêde ya Cînav Xweser û Nav

Çêdibe ew dû peyv êk cînavê xweser be peyva din nav be, anku cînavê xweser dibe jêderekê girng yê dirustbûna hunerê regezdozyê, kû hunerekê giring ya rewanbêjyê ye, pêkve digel navê bi hev ra hunerê regezdozyê dirust diken. Ji bo nimûne:

“*Hîlile xurmaye, minîşmêş, cîsrî damî henkebût*
Nefsî serkeş dam nedîwe, rû le şîrînî deka”¹²⁹

Regezdozîya Netemam yê Zêdedinavbera herdû peyvên (*minîş, mêş*)dirust bûye, peyva êkê dû tîp zêdetire ji peyva dwê, ew tîpên zêde jî tîpên (in)ye kû di navîna peyva êkê de hatîne nivîsîn. Peyva êkê Cînav Xwesere ji bo kesê êkê tak di kurdîya navîn de û Peyva dwê navê gyandarekê biçuke.

“*Haşe elilah ne tobe mergî to*
Ne seg endamin û sik asan”¹³⁰

Regezdozîya Netemam yê Zêdedinavbera herdû peyvên (*tobe, to*)dirust bûye, peyva êkê dû tîp zêdetire ji peyva dwê, ew tîpên zêde jî tîpên (be)ye kû di dûmahya peyva êkê de hatîne nivîsîn. Peyva êkê bi ramana tobe kirin ji gunehan têt û Peyva dwê Cînav Xwesere ji bo kesê dwê tak di kurdîya navîn de.

3.1.2.2.1.3. Regezdozîya Netemam yê Zêde yê kirdar

¹²⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.936.

¹²⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.44

¹³⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.554.

Çêdibe ew dû pryvên regezdozyê dirust diken herû kirdar bin, kirdar weke pişkeke sereke rolekê girng heye di dirustkirina hunerê regezdozyê mîna kû di ristê de roleke mezin yê heye, bi heman away di nav hozanan jî de roleke mezin yê hey, çunkî kirdar dinav her deqekî dabe role xwe winda nake, di sînore hozanan de kirdar rolekê here mezin yê hey di dirustkirina hunerê regez dozyê. Ji bo nimûne:

*“Debê saqî lemey 'îsa nefes bê
Be neş'e mûrdeyî sed sale key hey”¹³¹*

Regezdoziya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (Debê, bê) dirust bûye, peyva êkê dû tîp zêdetire ji peyva dwê, ew tîpên zêde jî tîpên (de)ye kû li destpêka peyva êkê de hatîne nivîsîn. Peyva êkê bi ramana îrana şerabî têt û Peyva dwê bi ramana hatina saqî têt, herdû peyv kirdarin.

3.1.2.2.1.4. Regezdoziya Netemam yê Zêde yê Amrazê Peywendî û Nav

Çêdibe ew dû peyv êk amrazê peywendî be peyva din nav be, amrazê peywendî mîna pişkeke sereke dinav rêzimanê de digel navekî dibe sedemê dirustbûn û pêkhatina regezdozî, çunkî amrazê peywendî bi rada xwe girngya xwe hey dinav rêziman û dinav sînore edebiyatê de, jiber kû çu deqekê edebî tûneye amrazê peywendî têda nebe. Ji bo nimûne:

*“Rayhey etrî cîhan derdî sere
Boyî zulfî dest bda ger bo demax”¹³²*

Regezdoziya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (Boyî, Bo) dirust bûye, peyva êkê dû tîp (yî) zêdetire ji peyva dwê, ew tîpa zêde jî li dûmahya peyva êkê de hatîne nivîsîn. Peyva êkê bi ramana bêhneke xweş têt û Peyva dwê amrazê peywendîye.

3.1.2.2.1.5. Regezdoziya Netemam yê Zêde yê Hevalnav û Nav

Çêdibe ew dû peyv êk hevalnav be peyva din nav be, nav digel behra pitir yê pişkên rêzimanê dibe jêderê dirustbûna regezdozî, çunkî Nav pêkînereke serekîye. Herwesa hevalnav bi alîkariya Navê dibe jêderê dirustbûna Regezdoziya Netemam yê Zêde. Ji bo nimûne:

¹³¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.934.

¹³² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.403.

““Kesê teftîşî ehwal, bilê nasalime, salim
Seba teşrîfî xast, ger deçîte menizlî yarm ””¹³³

Peyva (*nasalim*) dû tîp (na) zêdetire ji peyva (*salim*), ew tîpa zêde jî li destpêka peyva êkê de hatîne nivîsîn. Peyva êkê bi ramana nesaxî têt û Peyva dwê navê hozanvanî bi xweye. Jiber wê çendê Regezdozîya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên dirust bûye. Peyva êkê Hevalnave ya dwê jî Nave.

3.1.2.2.1.6. Regezdozîya Netemam yê Zêde yê Tîp û Nav

Çêdibe ew dû peyv êk tîp be peyva din nav be, Salim ji bo berhem înan û dirustkirina regezdozyê gelek bi kûrî hizra xwe kirye dinav beşên rêzimanê de, tîpên cuda cudayên nav rêzimanî kirye bingehêk ji bo pêkînanana regezdozyê daku destelatên xwe xuya bike kû çawa yaryê bi beşên rêzimanî dike, herweha hozanvan çawa viyabe bi wî rengî ji beşên rêzimanî hunerên ciwankarya peyvan çêkiriye, di vêre de tîp û nav pêkve kirne jêderê dirustkirina hunerê regezdozyê. Ji bo nimûne:

“We çake nameyî sadîq be xakî pêt muşerref bê
Be mîslî sadîsadîq waye daym, çawî bêdarim”¹³⁴

Regezdozîya Netemam yê Zêde dinavbera herdû peyvên (*sadî, sadîq*) dirust bûye, peyva dwêêk tîp (q) zêdetire ji peyva êkê, ew tîpa zêde jî li dûmahya peyva dwê de hatîne nivîsîn. Peyva êkê tîpe û Peyva dwê Nave.

3.1.2.2.2. Regezdozîya Netemam yê Cuda

“Pêktêt ji dû peyvan an zêdetir ji dû peyva ku hejmar û şêwe û rêza tîpên wan mîna hevdu be, lê corên hemî tîpên wan mîna hevdu nebe û ji êk tîp jêk cuda bin, bi mericekê cihê derbirîna wan tîpên ji hev cuda jêk nêzîk bin û wan tîpên cuda jî li destpêk an navî an li dûmahya peyvê da be”¹³⁵ regezdozîya netemamê cuda evene:”

Ger be bo nîsbenî turret bideme mîşkî xeta
Bo xeta fexre besa bo mine bes xepit û xeta¹³⁶

Her dûPeyvên (*xeta, xeṭa*) ^{١٣٥} ji tîp sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (t) tîpeke kurdîye di peyva dwê de tîpa (ṭ) 'Erebîye. Eve jî Regezdozîya Netemam yê

¹³³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 439.

¹³⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.437

¹³⁵ ‘Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, B.2, 1975, L 15.

¹³⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 11.

cuda dirustkirye. Peyva êkê bi ramana texên bakûr têt ku deverên welatê mengolyaye û Peyva dwê bi ramana şaşî û xeletyan têt ku gelek caran mirov di jyana xwe de xeletyan dike.

Mehwe goştî bedenî ew be demê

*Gahî zîn kirdnî wek xîgeyî ba*¹³⁷

Her dû Peyvên (*bedenî, be demê*) ji tîpa pêncê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (n), di peyva dwê de tîpa (m). Peyva êkê bi ramana leşê mirovî têt û Peyva dwê bi ramana dev û ezmanê mirovî têt. Eve jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirustkirye.

“Tenk zerfî meken, aman, herîfan

*Letîfey mey, be 'efwa ba nebê qey”*¹³⁸

Her dû Peyvên (*mey, qey*) ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (m), di peyva dwê de tîpa (q). Peyva êkê bi ramana ewê vexwarinê têt kû mirovan serxoş dike û Peyva dwê bi ramana dil rabûn têt. Eve jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirustkirye.

3.1.2.2.1.Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Nav

Anku ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna Regezdozîya Netemam herdû nav bin, dû nav dinav êk dêrê hozanê de jêderê bigehîne ji bo dirustbûna Regezdozî. Ji bo nimûne:

“Ba’îsa bo puxtegîy dil, sozî narî fîrquetit

*Nanî na birjê, tenûr, ger germîy û tawî nebê”*¹³⁹

Her dû Peyvên (*Narî, Nanî*) ji tîpa sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (r), di peyva dwê de tîpa (n). Peyva êkê bi ramana agir têt û Peyva dwê bi ramana nan ji bo xwarinê têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirustbûye.

“Dilim şade le bendî sîlsîley gêsûyî dilberda

*Le şane xof nakem, def’eyê, lem bende dil berde”*¹⁴⁰

¹³⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 37.

¹³⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, L 936.

¹³⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, L 991

¹⁴⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 56.

Her dû Peyvên (*şade, şane*) tinê ji tîpa sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (d), di peyva dwê de tîpa (n). Peyva êkê bi ramana xweşî derbirîn têt û Peyva dwê bi ramana şeh têt kû mirov serê xwe pê ra şeh dike. Jiberhindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Pirçînî zulif û perçem neqîşn le rûy yara*
Wek mîlletî mecûsî, her dên be dewrî nara”¹⁴¹

Her dû Peyvên (*yara, nara*)tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (y), di peyva dwê de tîpa (n). Peyva êkê bi ramana dost û yar têt û Peyva dwê bi ramana agir têt. Herdû peyv navin. Jiber hindê ev peyve bûne sedemê ciwanyeka mezin û Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Sîhrî fikrî min qelem dênête çerx*
Mu'cîzey 'îsa bû, çalakîy'esa”¹⁴²

Her dû Peyvên (*'îsa, 'esa*) ji tîpa dwê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (î), di peyva dwê de tîpa (e). Peyva êkê bi ramana Hezretê 'Îsa têt S.X.L kû bê bab ji dayk bûye, Peyva dwê bi ramana Gopal têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Bes bsûtêne le xem salimî mîskîn be cefa*
Bo wcûdî seru pa lehim û dem û pîşe nema”¹⁴³

Her dû Peyvên (*xem, dem*) ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (x), di peyva dwê de tîpa (d). Peyva êkê bi ramana kul û kovan têt û Peyva dwê bi ramana dev û ser û çava têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Geyandî bom seba boy'etrî gêsû*
Weku pîrahenî yûsf be ye'qûb”¹⁴⁴

Her dû Peyvên (*bom, boy*) ji tîpa sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (m), di peyva dwê de tîpa (y). Peyva êkê bi ramana Ji bo min têt û Peyva dwê bi ramana Gulav têt. Herdû peyv navin eve jî bûye sedemê dirustbûna Regezdozîya Netemam yê cuda.

¹⁴¹*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 79.

¹⁴²*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 115.

¹⁴³*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 130.

¹⁴⁴*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.155.

“*Sa be zarî bo nenalênim le daxî firqett?*

Bend bendm ney sîfet sûta be narî”¹⁴⁵

Her dû Peyvên (*zarî, narî*) ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (z), di peyva dwê de tîpa (n). Peyva êkê bi ramana dev û lêv têt û Peyva dwê bi ramana agir têt. Merema hozanvanî ewe kû yar bi agirê dûrî wî sotye, di vêre de hozanvan dûrya xwe yarê bi agir eyna kirye, eve jî wêneyeke hunerî ya hendesye û girovê wê çendêye kû hozanvan bi awayekê hendesî hozanê xwe nivîsye.

“*Berîm yekser le nî'methayî fîrdewsî, le dunya da*

Kerem key ger be min lêmoyî pustant le bustant”¹⁴⁶

Her dû Peyvên (*pustant, bustant*) ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (p), di peyva dwê de tîpa (b). Peyva êkê bi ramana bîstan têt û Peyva dwê bi ramana nan ji bo xwarinê têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Guşadîy'ûqdeyî xatirî bekarê bû, ewîş rabûd*

Dilî pir şorşim xoşnûdî yarê bû, ewîş raburd”¹⁴⁷

Her dû Peyvên (*karê, yarê*) ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (k), di peyva dwê de tîpa (y). Peyva êkê bi ramana kar kirin têt û Peyva dwê bi ramana dost û yar têt. Hozanvan pêwendiyeye xeyalî dinavbera herdû peyvnan dirustkirye. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Dede herdem şeker xendet semer qend*

Be qurbanî şeker xendet semer qend”¹⁴⁸

Her dû Peyvên (*semer qend, semer qend*) ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (ş) ya 'Erebîye, di peyva dwê de tîpa (s). Peyva êkê bi ramana şeker têt û Peyva dwê bi ramana welatê Turkmenistan têt. Herdû peyv navin, hozanvanî ji navê xwarinekê û navê bajarokê Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Kes nebê salim le dunyada weku min tûşî derd*

Bê newa kewtume xurbet, natewan û reng zerd”¹⁴⁹

¹⁴⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.168.

¹⁴⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.208.

¹⁴⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.254.

¹⁴⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.256.

¹⁴⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.278.

Her dû Peyvên (*zerd, derd*)navin jiber ku Peyva êkê bi ramana nexweşî têt û Peyva dwê bi ramana rengê zerd têt kuji tîpên (r) û (n) jêk cudane. jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“Yadî zulif û ebro û mujganî yar
Zexmî tîre, zerbî tîxe û zehrî mar”¹⁵⁰

Her dû Peyvên (*yar, mar*)tinê ji tîpên (y) û (m) jêk cudane, jiber ku Peyva êkê bi ramana dost û yar têt û Peyva dwê bi ramana mar têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust kirye.

“Cem’î zîd deyne le rûy mûyî sîdem ruxî yar
Gir debestê be yeqîn penbe le nezdîkîy nar”¹⁵¹

Her dû Peyvên (*yar, nar*) tinê ji tîpên (y) û (n) jêk cudane, jiber ku Peyva êkê bi ramana dost û yar têt û Peyva dwê bi ramana agir têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust kirye. Çunkî hozanvan ji dû tiştên dijî hevdû regezdozî çêkiriye

“Ya 'elî xoto dezanî dastanî xar û mar
Cuhid û besîdq û pakîy sîd diqî ekber ser beser”¹⁵²

Her dû Peyvên (*xar, mar*) tinê ji tîpên (x) û (m) jêk cudane, jiber ku Peyva êkê bi ramana şikefita sor têt ku ji nêzîk bajêrê mekkeye li welatê s'udye û Peyva dwê bi ramana mar têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust kirye.

“Be pabost biga ger ser weku ferş
Serî fexirim degate payeîy 'erş”¹⁵³

Herdû Peyvên (*ferş, 'erş*) navin, jiber ku Peyva êkê bi ramana mafûr û rayêx têt ku mirov li mal li ser di rûne û Peyva dwê bi ramana Esman têt. tinê ji tîpên (') ya 'Erebî û (m) jêk cudane.

“Şew hatewe, min bê dil û mecnûnî kesêkim
Mate mzedewu bêxud û mehzûnî kesêkim”¹⁵⁴

¹⁵⁰*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.290.

¹⁵¹*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.292

¹⁵²*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.318.

¹⁵³*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.382.

¹⁵⁴*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.447.

Her dû Peyvên (*mecnûnî, mehzûnî*)tinê ji tîpa sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (r), di peyva dwê de tîpa (n). Peyva êkê bi ramana dîn û har têt û Peyva dwê bi ramana xembar têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Bo geranî aşî dil firmêskî çawm bû be yem*
Bo minî bê kes mizey nabê, be xeyrez derd û xem”¹⁵⁵

Regezdozîya Netemam yê cuda dinavbera herdû Peyvên (*yem, xem*) dirust bûyekû ji tîpa (y) û tîpa (x) jêk cudane. Peyva êkê bi ramana derya têt û Peyva dwê bi ramana kovan têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Dûr le xakî serî koy to, seneme ta seferîm*
Le beheştêkî wek em şare be halî seqerîm”¹⁵⁶

Her dû Peyvên (*seferîm, seqerîm*) tinê ji tîpa (f) û tîpa (q) jêk cudane. Peyva êkê bi ramana sefer û wexer têt û Peyva dwê bi ramana cehennem têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Şew ta seher le hîcret bo min herame xo xew*
Her dê sedayî giriyem wek re'dî new beharan”¹⁵⁷

Her dû Peyvên (*Şew, xew*)di nîv dêrê êkê de, ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (ş), di peyva dwê de tîpa (x). Peyva êkê bi ramana şev têt û Peyva dwê bi ramana nivistin têt. Dinavbera şev û nivistin de pêwendiyêke bihêz heyejiber kû mirov di şevê de dinve.

“*Kaşkî detdî le tabûta perêşanîy kerîm*
Reng perîdey xûşk leb, bê deng û mat û bê ziman”¹⁵⁸

Her dû Peyvên (*reng, deng*) ji tîpa sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (r), di peyva dwê de tîpa (d). Peyva êkê bi ramana reng têt û Peyva dwê bi ramana deng têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*BO minî ser geşte, elheq bê wefa bû asiman*
Derheqim emcare yekser pircefa bû asiman”¹⁵⁹

¹⁵⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.486.

¹⁵⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.491.

¹⁵⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.502.

¹⁵⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.514.

Her dû Peyvên (*wefa*) di navîna nîv dêrê êkê û (*cefa*) di navîna nîv dêrê dwê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (w), di peyva dwê de tîpa (c). Peyva êkê bi ramana *wefa* têt kû merem ewe mirov li hember dost û hevalan bê bexit nebe û Peyva dwê bi ramana *kul* û *kovan* têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“Çakî kirid mîrza slêman pasî dekkey zîndrû
Sengerî destgaye bo *şer*, *şew* hate wextî beyan”¹⁶⁰

Her dû Peyvên (*şer*, *şew*)ku di navîna nîv dêrê êkê de hatîne herdû peyv tinê ji tîpa sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (r), di peyva dwê de tîpa (w). Peyva êkê bi ramana *şer* têt û Peyva dwê bi ramana *şev* têt. Herdû peyv navin, jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“Tabî kiwa eayîne, rûy to bête *naw*
Ger le senig bê, yek nîgeh deykey be '*aw*'”¹⁶¹

Her dû Peyvên (*naw*, *aw*) ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (n), di peyva dwê de tîpa ('). Peyva êkê bi ramana *nav* têt û Peyva dwê bi *av* têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“Be hesret eşkî alm dête ser *rû*
Beser rûte ke îfşa bû seher, *mû*”¹⁶²

Her dû Peyvên (*rû*, *mû*) ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (r), di peyva dwê de tîpa (m). Peyva êkê bi ramana *rûyê* mirovan têt û Peyva dwê bi ramana *mûyê* mirovan têt. Herdû peyv navin.

“Le gîryan çû hemîsan *xawm* em *şew*
Be xur xwên dê le çawey *çawm* em *şew*”¹⁶³

Her dû Peyvên (*xawm*, *çawm*)Regezdozîya Netemam yê cuda dirust kiryeji tîpa sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (x), di peyva dwê de tîpa (ç). Peyva êkê bi ramana *nivistin* têt û Peyva dwê bi ramana *çav* têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

¹⁵⁹*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.519.

¹⁶⁰*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.534.

¹⁶¹*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.615.

¹⁶²*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.664.

¹⁶³*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.694.

*“Dîsan le bezmî hîcran zehrî cefam le came
Subihim le mîhnetî yar hem rengî wextîşame”¹⁶⁴*

Her dû Peyvên (*came, şame*)tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (c), di peyva dwê de tîpa (ş). Peyva êkê bi ramana bade têt û Peyva dwê bi ramana şev têt. Herdû peyv navin jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

3.1.2.2.2.Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Cînav

Çêdibe ji van dû peyvan êk cînavê amaje be û peyva din cînavê xweser be, eve ew regezdozîye kû ji encamê wekhev ya cînavan dirust dibe, ew cînav dibine jêderê gelek fer mîna cînavê amaje ku ji bo nîşan kirina kesekî an tiştekî tê bikarînan û digel cînavê xweser pêkve dibine jêderê dirustbûna Regezdozîya Netemam yê Cuda. Ji bo nimûne:

*“Dilm daym le seyrî karwanî zad û mergaye
Bemîslî cadeyî bender, mudam em dêt û ew derwa”¹⁶⁵*

(*em, ew*) herdû cînavin, peyva êkê cînavê amajêye ji bo kesê ket yê nêzîk tê bikarînan di kurdîya navîn de, peyva dwê cînavê xwesere ji bo kesê sêyê ket tê bikarînan di kurdîya navîn de. Herdû peyv tinê ji tîpa dwê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (m), di peyva dwê de tîpa (w). jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

3.1.2.2.3.Regezdozîya Netemam yê Kirdar û Nav

Çêdibe dû peyv êk nav nabe û ya din kirdar be, eve ew regezdozîye ku ji encamê guncana beşên axaftinê dirust dibe ciwanyeka mezin dide hozanî, herwesa nav kirdar pêkve dibine jêderê giring ji bo dirustbûna hunerê Regezdozîya Netemam yê cuda, herwesa serwayê hozanî bihêz diken. Ji bo nimûne:

*“Le cêy tîrit dilm derdê le sînem
Be îstîqbalî to, gerbêy le derda”¹⁶⁶*

Her dû Peyvên (*derdê, derda*) peyva êkê kirdare û ya dwê nave, çunkî peyva êkê wata dilê min ji singê min tête der û Peyva dwê bi ramana derd û nexweşî

¹⁶⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.794.

¹⁶⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.25.

¹⁶⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.7.

têtherdû peyv tinê ji tîpa pêncê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (ê), di peyva dwê de tîpa (a). jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.

“*Ke fessad qesdîfesdî lêwî toy kirid*
Le cêy nîşter, le batîy xwên, nemek bû”¹⁶⁷

Her dû Peyvên (*qesdî, fesdî*) peyva êkê nave û ya dwê kirdare, Peyva êkê bi ramana nepenî û înet têt û Peyva dwê bi ramana metina lêvên yar têt. herdû peyv tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (q), di peyva dwê e tîpa (f). Peyva êkê bi ramana bade têt û Peyva dwê bi ramana şev têt. jiber hindê jî Regezdozîya Netemam yê cuda dirust bûye.,

3.1.2.2.4.Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Kirdar

Ew regezdozye kû jêderê dirustbûna herdû peyvî kirdare, jiber ku herdû peyv di esil de rolê kirdarî dibînin, dibe bingehê giring dinav hozanê de ji bo dirustbûna hunerê regezdozyê, eve jî vê çendê diselmîne ku tevahiya peyvên dinav hozanê de berpirsyarya li stûyê xwe digire ji bo xemilandina hozanî, kirdar jî dinav hozanên salimî de jêderê dirustbûna hunerê regezdozîya netemame ji bo nimûne:

“*hesireta dil xafîle, nazanê qîsmet çî deka*
emro êrem bû be mesken, axo ferda kwêm deba”¹⁶⁸

Her dû Peyvên (*deka, deba*) kirdarin, çunkî peyva êkê wata qîsmet li bere çî bike û Peyva dwê wata zeman sibehê min dibe kîrê, herdû peyv tinê ji tîpa sêyê jêk cudane, ji ber kû di peyva êkê da tîpa (k), di peyva dwê de tîpa (b). di vêre da kirdar yê bûye jêderê dirust bûnahunerê regezdozîya netemam yê cuda.

“*Çawî qûçanîd espekem, baqîl tewîley hate yad*
Dil le sînem mate, tehqîq, yadî cêgey xew eka”¹⁶⁹

Her dû Peyvên (*hate, mate*) kirdarin, çunkî peyva êkê wata hatin û Peyva dwê wata hêdî bûn merema hozanvanî ewe ku dilê wî yê bê denge, herdû peyv tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (h), di peyva dwê de tîpa (m). di vêre da kirdar yê bûye jêderê dirust bûna hunerê regezdozîya netemam yê cuda.

3.1.2.2.5.Regezdozîya Netemam yê Amrazê Peywendî û Cînavê Xweser

¹⁶⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.626.

¹⁶⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.43.

¹⁶⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.47.

Çêdibe ji van dû peyvên êk amrazê peywendî be û peyva din cînavê xweser be, ew ew regezdozîye kû ji encamê wekhev ya cînavan dirust dibe, ew cînav dibine jêderê dirustbûna regezdozîya netemam yê cuda, ev hunere jî saxleteka bihêz dide rûxsarê hozanê salimî, herwesa awazên hozanê jî xweş dike. Ji bo nimûne:

“*Ucibe ahîste xeramî be terefe êmewe, ya
Bare bo penceyî pêy nazikî to, rengî hena?*”¹⁷⁰

Her dû Peyvên (*bo, to*) peyva êkê amrazê peywendî, peyva dwê cînavê xwesere di kurdîya navîn de. Herdû peyv tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (b), di peyva dwê de tîpa (t). jiber hindê jî regezdozîya netemam yê amrazê peywendî û cînavê xweser dirust bûye

3.1.2.2.2.6.Regezdozîya Netemam yê Amrazê Lêkder û Nav

Çêdibe ji van dû peyvên êk amrazê lêkder be û peyva din nav be, ew dû peyvên dibine jêderê dirustbûna regezdozîya êk amrazê lêkder be û peyva din nav be, anku pêkve bi hevpişkî di sînorê êk dêrê hozanî de hunerê regezdozîya netemam yê cuda dirust bikin û bibîne handerê bihêz bûna serwayê vê hozanê. Ji bo nimûne:

“*Kaw û coy ger bènme pêş, wek ker delûşkê û hêdîye
Ger lexawî bo berm, bo cûte paşûm tê deka*”¹⁷¹

(*ker, ger*) peyva êkê navê gyandarekê li gunidan ji bo şulkirinê tê bikarînan, peyva dwê amrazê lêkdere ku ji bo jêk girêdana peyvên dinav hozan û ristê de. Herdû peyv tinê ji tîpa (k) û tîpa (g) jêk cudane. jiber hindê jî regezdozîya netemam yê cuda dirust bûye.

3.1.2.2.2.7.Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Cînavê Xweser û Nav

Çêdibe ji van dû peyvên dibine jêderê dirustbûna hunerê regezdozîya netemam peyvek nav be û peyva din cînavê xweser be, anku pêkve bi hevpişkî di sînorê êk dêrê hozanî de hunerê regezdozîya netemam yê cuda dirust bikin û bi awayekê endazyarî bibin harîkar ciwan kirin û bihêz bûna serwayê vê hozanê, herdû peyv bibin jêderê xemilandina hozanê. Ji bo nimûne:

¹⁷⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 9.

¹⁷¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r31.

“Ger tewaw uftade bin, hem xem mexon, ferbîh debin

Tobe êsqanî firûc û boz be xepley co û kepek”¹⁷²

Regezdozîya netemam yê cuda dinavbera herdû peyvên (*To, co*) dirust bûye. peyva êkê cînavê xwesere di kurdîya navîn de, peyva dwê nave û navê dan e ku cotyar diçînin paşî weke xwarinekê didin giyandaran, mîna pez û bizin. Herdû peyv tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (t), di peyva dwê de tîpa (c). eve jî wekirye cînavê xweserroleke giring ji dirustkirina hunerê regezdozîya dibîne.

“Ejdehayek şew bibînî marî zulfî, ger be xew

Em desênî întîqamî herçî ezyet bê le 'ew”¹⁷³

Regezdozîya netemam yê cuda dinavbera herdû peyvên (*xew, ew*) dirust bûye. peyva êkê nave, peyva dwê cînavê xwesere di kurdîya navîn de. Herdû peyv tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (x), di peyva dwê de tîpa ('). jiber hindê jî hunerê regezdozî dirust bûye.

3.1.2.2.8.Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Nav û Hevalkarê Radê

Çêdibe ji van dû peyvên êk nav be û peyva din hevalkarê radê be, anku ew dû peyvên hunerê regezdozyê çê dikin nav û hevalkarê radê bin di sînorekê êk dêrê hozanî de, herdû peyv dibin jêderê sereke ji bo dirustkirina Regezdozîya netemam yê cuda. Herwesa ciwanyeka mezin dide rûxsarê hozanê. Ji bo nimûne:

“Le dilda çunke her xwênim dexwa xem

Be tedrîc eşkî xwênînm deka kem”¹⁷⁴

Herdû peyvên (*xem, kem*) Regezdozîya netemam yê cuda dinavberadirust bûye. Peyva êkê bi ramana kul û kovan têt û peyva dwê wata xûna min hêdî hêdî kê m dike. Hozanvan dibêje hêdî hêdî rondikên min kê m dike. Herdû peyv tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (x), di peyva dwê de tîpa (k). peyva êkê nave, peyva dwê hevalkarê radê ye.

“To ke deh saleyî bem new'e heta çardehem

Bo cemalit wekû meh heddî kemalim telebe”¹⁷⁵

¹⁷²*Dîwanî Salim, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.425*

¹⁷³*Dîwanî Salim, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, 709.*

¹⁷⁴*Dîwanî Salim, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.465*

¹⁷⁵*Dîwanî Salim, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.737*

Regezdozîya netemam yê cuda dinavbera herdû peyvên (*deh, meh*) dirust bûye. peyva êkê hevalkarê radê ye, peyva dwê nave. Herweha peyva êkê wata Jimare 10 deh û peyva dwê wata heyv. Herdû peyv tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (x), di peyva dwê de tîpa ('). jiber hindê jî hunerê regezdozî dirust bûye.

3.1.2.2.9. Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Hevalkarê Rade û Kirdar

Pêktêt ji wê çenidê ku ew dû peyvên dibine jêderê dirustbûna hunerê regezdozyê êk hevalkarê radê be û amaje bide radê tişteki, peyva din nav be, herdû peyv dibin jêderê sereke ji bo dirustbûna hunerê regezdozyê netemam. Ji bo nimûne:

*“Gû be gorî puderî xêwî be rûy
Çunke dûre le kema, hêzî nema”¹⁷⁶*

Herdû peyvên (*kema, nema*) Regezdozîya netemam yê cuda dinavbera dirust bûye. peyva êkê hevalkarê radê ye, peyva dwê kirdarê nerêye. Peyva êkê wata kêmbûna tişteki û peyva dwê wata nebûna hêz. Herdû peyv tinê ji tîpa (k) û tîpa (n) jêk cudane. jiber hindê jî regezdozîya netemam yê cuda ya hevalkarê rade û kirdar dirust bûye.

3.1.2.2.10. Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Amrazê Peywendî û Nav

Wata ew dû peyvên dibine jêderê dirustbûna hunerê regezdozyê êk amrazê peywendî be, peyva din nav be, di sînorê êk dêrê hozanê de eve jî dibe egerê xemilandina wê hozanê. Ji bo nimûne:

*“Ahî xo bo nanî co, smkolî espim bo heşîş
Em geyste piştî mahî, ew geyste rûy sema”¹⁷⁷*

Regezdozîya netemam yê cuda dinavbera herdû peyvên (*deh, meh*) dirust bûye. peyva êkê amrazê peywendî ye, peyva dwê nave. Herdû peyv tinê ji tîpa êkê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (b), di peyva dwê de tîpa (c). jiber hindê jî hunerê regezdozîya netemam yê cuda ya amrazê peywendî û nav dirust bûye.

3.1.2.2.11. Regezdozîya Netemam yê Cuda ya Hevalkarê Cihî û Nav

¹⁷⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.35.

¹⁷⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, 47.

Wata ew dû peyvên dibine jêderê dirustbûna hunerê regezdozî, çêdibe êk hevalkarê cihî be û amaje bide cihekî, peyva din nav be vêca navên mirovan be û an ku her naveke din be, herdû peyv pêkve regezdozîya netemam yê cuda ya hevalkarê cihî û nav dirust dikin. Ji bo nimûne:

*“Her şew ke mahtabî ruxt derdekewê le dûr
Kulbey dilm le tîre gîya pir debê le nûr”¹⁷⁸*

Her dû Peyvên (*dûr, nûr*) peyva êkê hevalkarê cihîye, peyva dwê nave. Herdû peyv tinê ji tîpa sêyê jêk cudane, di peyva êkê da tîpa (d), di peyva dwê de tîpa (n). jiber hindê jî regezdozîya netemam yê cuda ya hevalkarê cihî û nav dirust bûye.

3.1.2.2.2.12. Regezdozîya Netemam yê Cûnavê Amaje û Nav

Pêktêt ji wê çenidê ku van dû peyvan, êk cûnavê amaje be ji bo destnîşankirina kesek an tiştekî, peyva din nav be, herdû peyv dibin jêderê sereke ji bo dirustbûna hunerê regezdozîyê netemamyê cuda ya cûnavê amaje û nav di sînorê êk dêrê hozanî de. Ji bo nimûne:

*“Fereh û xem, be destî gerdûne
’Em be ahîste, ew be dew dênê”¹⁷⁹*

Regezdozîya netemam yê cuda ya cûnavê amaje û nav dinavbera herdû peyvên (*xem, ’Em*) dirust bûye. peyva êkê nave û wata kul û kovan, peyva dwê ya cûnavê amaje ye ji bo ket yê dûr.

3.1.2.2.3. Regezdozîya Netemam yê Berevajî û Aloz

“Pêktêt ji van dû peyvên ku hejmara tîpên wan wekhev bi, lê şewê tîpan nemerce wekhev bin, rêz bûna tîpên wan jî di berevajîne mîna peyvên (hûr û rûh)”¹⁸⁰. Ji bo nimûne çêdibe herdû peyv nav bin:

*“Mirdînm pê xoşe, nek dilber keder hasil bike
Min serapa narî xem bim, ew delê sûta, derek”¹⁸¹*

¹⁷⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.315.

¹⁷⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.1021.

¹⁸⁰ Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Şîrî Kilasîkî Kurdî*, Çapxaneya Hêvî, Ç.1, Hewlêr, 2011, r.27.

¹⁸¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.413

Regezdozîya netemam yê berevajî dinavbera herdû peyvên (*keder, derek*) dirust bûye. Herdû peyvnavin, peyva êkê wata kul û kovan û peyva dwê wata cehenem, herdû peyv ji alyê hejmara tip û curên wan wek hevin, lê şêwê rêz bûna wan bi temamî berevajî hevin, ji bo nimûne tîpa (k) di peyva êkê de li destpêka wê peyvê de hatye nivîsîn, lê tîpa (k) di peyva dwê de li dûmahya wê peyvê hatye nivîsîn, jiber hindê regezdozîya netemam yê berevajî dirust bûye.

*“Be pûlî merdum azarî mepoşe turme pa ta ser
Be şalî peşmî derwêşî bide teşrîfî ser tapa”¹⁸²*

Regezdozîya netemam yê berevajî dinavbera herdû peyvên (*pa ta ser, ser tapa*) dirust bûye. Herdû peyv şêwê rêz bûna tîpa wan wekhev nîne û bi temamî berevajî hevin, jiber ku peyva dwê pirtê (*tapa*) ya destpêka peyva êkê de hatye nivîsîn, Herdû peyv navin.

3.1.2.2.4. Regezdozîya Netemam yê Kerî

“Regezdozîya netemam yê Kerî curekê dine ji hunerê regezdozîye, pêktêt ji dû peyva ku peyva dwê pirtikeke ji peyva êkê ye, an peyva êkê pirtikeke ji peyva dwê ye, anku peyva dwê ji alyê hejmara tîpan ve ji tîpa dwê kêmtire”¹⁸³ curên regezdozîya netemam yê Kerî evene:

3.1.2.2.4.1. Regezdozîya Netemam yê Kerî ya Nav

Wata ew dû peyvên dibine jêderê sereke ya dirustbûna regezdozîya Kerî herdû peyv nav bin, eve jî ciwanyeka mezin dide wê hozanê û jiber ku bi gelemperî nav dinav her têkistekî da be rolekê mezin dibîne, dinav hozanên Salimî de nav jêderê sereke ye ji bo dirustbûna hunerê regezdozyê. Ji bo nimûne:

*“Zêwerî husnî dila rame, sewadî xemî zulif
Nanwênî, ke nebê zulmetî şew, şewqî çira”¹⁸⁴*

Regezdozîya netemam yê Kerî ya nav dirust bûye jiber ku peyva (*şewqî çira*) hatye Kerkirin û peyva (*şew*) êkser ji pêşiya wê hatye bikarînan, pirtika êkê wata Şev û pirtika dwê wata ronahî.

¹⁸² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.24.

¹⁸³ Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Şîrî Kilasîkî Kurdî*, Çapxaneya Hêvî, Ç.1, Hewlêr, 2011, r.28.

¹⁸⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.9.

“*Na nwênê, ger beserma bê musîbethayî çerx
Ta Leser serme le sayey zulîf to, perrî huma*”¹⁸⁵

Regezdozîya netemam yê Kerî dirust bûye jiber ku peyva (*leser serme*) hatye Kerkirin û peyva (*beserma*) êkser ji pêşiya wê hatye bikarînan, pirtika êkê wata bi serê min û pirtika dwê wata li ser serê min.

“*Ewsa mekanî asike bû kanîy asikan
Êste le deng û rengî eromî pre le ker*”¹⁸⁶

Peyva (*kanîy asikan*) hatye Kerkirin û peyva (*asike*) êkser ji pêşiya wê hatye bikarînan, pirtika êkê navê keçekê ye û pirtika dwê navê taxekê kevinê bajêrê sul-eymanîyê ye. Bi vê sedemê jî regezdozîya netemam yê Kerî dirust bûye, çunkî herdû peyv navin.

3.1.2.2.4.2.Regezdozîya Netemam yê Kerî ya Kirdar û Nav

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna regezdozîya Kerî peyvek kirdar be û peyva din nav be, bi vê sedemê jî dinav hunerê regezdozîya netemam yê Kerî de, liqeke nû heye dinav hozanên salimî de bi navê regezdozîya netemam yê Kerîya kirdar û nav, eve jî bûye sedemê xemilandina tevahiya hozanê . Ji bo nimûne:

“*Rîşweyî gerdin keçîy ew gerdine, hukmî qeza
Bo xeracî bendegîy ser gerdenî ahu deka*”¹⁸⁷

Peyva (*gerdin keçîy*) hatye Kerkirin û peyva (*gerdine*) êkser ji dawiya wê hatye bikarînan, pirtika êkê wata sernişîv an destdahêlan û pirtika dwê gerdina yar anku situkurk. Eve jî bûye sedemêdirustbûna regezdozîya netemam yê Kerî ya kirdar û nav.

“*Beheyûla şuturî newte, mela
Leqleq asa leq û bed rewte, mela*”¹⁸⁸

Peyva (*Leqleq*) hatye Kerkirin û peyva (*leq*) êkser ji dawiya wê hatye bikarînan, pirtika êkê wata Leklek ku navê gyandarekê ye û pirtika dwê wata şil bûn, pirtika êkê nave û pirtika dwê kirdare. Hozanvan bi vê sedemê regezdozîya netemam yê Kerî ya kirdar û nav dirust kirye.

¹⁸⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.15.

¹⁸⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.337.

¹⁸⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.99.

¹⁸⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.116.

*“Nesebî espî toy be seg dawe
Seg sarî deka be to û dîgeran”¹⁸⁹*

Peyva (*Seg sarî*) hatye Kerkirin û peyva (*seg*) êkser ji pêşiya wê hatye bikarînan, pirtika êkê navê gyandarekê ye bi navê se û pirtika dwê wata karên xirab, pirtika êkê nave û pirtika dwê kirdare. Eve jî bûye sedemê dirustbûna regezdoziya netemam yê Kerî.

3.1.2.2.5. Regezdoziya Netemam yê Reha

“Ew regezdozî ku peyvên regezdozî pêk tînin ji alyê hejmara tîpan û şewê tîpan û rêz bûna tîpan û curên tîpan jêk cuda bin”¹⁹⁰ Ji bo nimûne:

*“Yar eger emrî be mirdin bê, ne mirdin muşkîle!
Bêne, bo herçî bilê, bo min nebirdin muşkîle”¹⁹¹*

Herdû peyvên (*mirdin, ne mirdin*) ji alyê hejmara tîpan û şewê tîpan û rêz bûna tîpan û curên tîpan jêk cudane, lê herdû peyv êk rihê ferhengî hene ku çavkanya wan peyva (mirin)e. Eve jî bûye sedemê dirustbûna regezdoziya netemam yê reha.

Girngya hunerê regezdozî bi gelemperî bo wê çenidê vedigere ku ev hunere şyaneke mezin yê hey di kom kirina tevahiya pêkhênên rêzimanî dinav sînore regezdozî de, pêkhênên mîna (Nav, Hevalnav, Hevalkar) ûkirdaran mîna (karê borî, karê ne borî, karê dahatû) herwesa amrazê peywendî, amrazê lêkder, cînavê xweser, cînavê amaje, hemî ev pêkhêne di sînore regezdozî de mîna hevîr serederî digel hatye kirin û sedemek bûyne ji bo xemilandina helbestên salimî, çunkî piraniya caran di sînore êk dêrê hozanê de hozanvan dû kirdar nivîsîne. Eve jî girovê wê rastiyê ye ku bikarînan pêkhênên rêzimanî ji bo ciwan kirina serwayê hozanane, ku hozanvanî destelatan xwe bi ser pişkên axaftinê de nîşan daye, çunkî salim hemî pişkên axaftinê bi awayekê endazyarî bikarînaye. Herweha girngya regezdozî di wê çendê daye ku van dû peyvên dibin bi regezdozî divêt çar merc têda bin mîna (hejmara tîpan, şewê tîpan, rêz bûna tîpan, curên tîpan) herwesa divêt herdû peyv wtaya wan jêk cuda be, ev merce pir giranin ku hozanvanî bikarînaye daku ciwanyê bide hozanên xwe. Hunerê regezdozî êke ji wan hunerên ku di pêkînan awazên dinav hozanên salimî

¹⁸⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.553.

¹⁹⁰ Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Şî'rî Kilasîkî Kurdî*, Çapxaneya Hêvî, Ç.1, 2011, r.22.

¹⁹¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.?

de rolê xwe heye, çunkî regezdozî behsa dû peyva dike ku di rûxsar de wekhev bin, lê her peyvek wtaya xwe ya taybet hebe, anku herdû peyvek dû watayên cuda hebin, salimî bi rêjeyeke mezin ev hunere bikarînaye, bi regekî ku eger em bimeyzînine hozanên wê bi sanahî hunerê regezdozyê tê ber çava, eve jî şehrezayî û zîrekya salimî xuya dike. Dinav hunerê regezdozyê de hozanvanî hunerê Regezdozîya Netemam yê Cuda gelek bikarînaye, jiber hindê em dikarin bêjîn ku piraniya hozanên wî regezdozî tê dane lê ji curê Regezdozîya Netemam yê Cuda.

Pişkên axaftina (nav) jêderê sereke ya dirustbûna regezdozye, nav dinav regezdozyê de roleke gelek xudan bandor dibîne. Eger dinav helbestên salimî de pêkhênê Nav bi deyne rxekê, wî demî hunerê regezdozyê hunerê regezdozyê li cem salimî berê xwe dide nemanê, çunkî salim ji bo dirustkirina hunerê regezdozyê gelek mifa ji pişkê axaftinê Nav wergirtiye, hozanvanî nav kirye bingehe dahênanê ji bo xemilandina hozanên xwe, çunkî nav bi gelemperî dinav hozanên salimî de mîna xelîya spî ya bûkê ye, hozanvanê bi rêya navan helbestên xwe xemilandine.

3.1.2.2.6. Amara Hunerê Regezdozyê

Tîpa a a a aa a a aa

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 2, bes - besê, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 9, dûrbîn - dûrbîn, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 4, derde - derda, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 4, dêrê 2, şew – şew çira, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 5, dêrê 1, xeta - xeta, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 5, beserma – Leser serma, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 7, dêrê 5, bala – bala, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 1, kewtime – hatme, tevahîya wan 4 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 11, dêrê 3, keme – nema, tevahîya wan 4 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 12, dêrê 4, mû – bû, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 13, dêrê 1, deka – deba, tevahîya wan 6 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 16, dêrê 1, şade – şane, tevahîya wan 1ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 19, dêrê 5, sû - sûr, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 21, dêrê 1, bê – bê, tevahîya wan 6 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 22, dêrê 6, mîskîn – mun'îm, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 23, dêrê 1, yara - nara, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 1, mû – rû, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 30, dêrê 9, hû – hu, tevahîya wan 3 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 32, dêrê 2, qûtî – yaqûtî, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 33, dêrê 6, bay – bey, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 36, dêrê 7, qed – qed, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 37, dêrê 1, newte - rewte, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 38, dêrê 1, ab - tab, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 39, dêrê 1, rûma - rûma, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 41, dêrê 1, merdum - merdum, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 42, dêrê 5, xem - dem, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 44, dêrê 7, dil - dil ber, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 45, dêrê 7, şuhre - şehre, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 46, dêrê 3, to - bo, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa b b b b b b b b b b
Bergê 1, hejmara helbestê 5, dêrê 7, bom - boy, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa tt t t t t t t t t t t t t t t t
Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 2, çîn - maçîn, tevahîya wan 3 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 2, dil - dil dade, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 7, dêrê 2, sîmyaîy - kîmyaîy, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 4, hînid - hîndû, tevahîya wan 3 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 11, dêrê 1, rewan - rewan, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 12, dêrê 5, mehzûnî - meczûyî, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 13, dêrê 9, qiyamet - qiyamit, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 14, dêrê 4, leb - lem, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 16, dêrê 5, pustant - bustant, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 20, dêrê 1, bedenit - dehenit, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 2, tekye - tekye, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 27, dêrê 8, reşe - reşe, koy gştî39 ket.
Tîpa p p p p p p p p p p p p p p p p p p
Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 4, merdumî - merdumî, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa dd d d d dd d d d d d dd d dd d dd d d d d d d d d
Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, şad - bad, koy gştî1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 1, karê - yarê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 4, daperîn - perîn, tevahîya wan 7 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 7, dem - xem, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa ll l lllll lllllllllll

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 8, to- bo, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa mmm m m m m m m m m m m m m m m

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 3, to - bo, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 1, terîqî - terîqî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 4, dêrê 1, kiridim - biridim, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 5, dêrê 6, sadîq - sad, koy gşî2ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 10, nasalime - Salim, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 8, dêrê 1, yarm - karim, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 1, mecnûnî - mehzûnî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 18, dêrê 1, xem - kem, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 20, dêrê 1, xeta - xeta, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 2, to - bo, tevahîya wan 9 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 27, dêrê 1, nedîm - ne'îm, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 28, dêrê 1, seferîm - seqerîm, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 29, dêrê 1, mul - gul, tevahîya wan 3 ket.

Tîpa n

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 4, şew - xew, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 5, dêrê 23, tajen - tajeban, tevahîya wan 6 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 1, wefa - cefa, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 7, dêrê 16, bûm - bû, tevahîya wan 14 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 8, dêrê 5, to - bo, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 2, seg sarî - seg, tevahîya wan 10 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 11, dêrê 5, bû - çû, tevahîya wan 4 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 12, dêrê 1, çawey - çawî, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 18, dêrê 3, bestî - destî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 21, dêrê 2, to - bo, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 23, dêrê 4, şem - xem, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 24, dêrê 5, salim - salim, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 1, toy - boy, tevahîya wan 2 ket.

Tîpa û û w û w û w û w û w û w û w û w û w û w

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, naw- aw, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 3, qesdî - fesdî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 14, dêrê 4, çîn - maçîn, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 16, dêrê 1, şêr evgenî - şêre, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 7 1, dêrê 1, kû kû - kû kû, tevahîya wan 5 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 20, dêrê 1, wefa - sefa, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 21, dêrê 10şepol - şepolit, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 22, dêrê 6, şam - şam, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 24, dêrê 7, mîna - miyana, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 15, dil ber - dil, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 19, pes - bes, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 28, dêrê 3, dil - dil ber, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 29, dêrê 1, hecer - hezer, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 32, dêrê 1, xawm - çawm, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 39, dêrê 6, salim - salim, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 40, dêrê 2, xew - cew, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa oo o oo o o o o o

Bergê 2, hejmara helbestê 3, dêrê 6, to - bo, tevahîya wan 2 ket.

Tîpa h hh hhh

Bergê 2, hejmara helbestê 3, dêrê 6, to - bo, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 4, dêrê 1, zincîr - zincîr, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 5, dêrê 7, quwet - quwete, tevahîya wan 4 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 6, dêrê 5, ga cûte - cûte, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 7, dêrê 1, mûte - rûte, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 8, dêrê 4, dil ber - dil, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 10, dêrê 3, zeref - teref, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 11, dêrê 1, nare - yare, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 14, dêrê 1, hezere- hezere, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 24, dêrê 1, mirdin- nemirdin, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 25, dêrê 1, şame - came, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 26, dêrê 7, yar - yar, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 27, dêrê 5, yelda - yelda, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 28, dêrê 1, rûme - mûme, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 36, dêrê 2, dil - dil ber, tevahîya wan 7 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 37, dêrê 2, renige - renigîne, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 40, dêrê 9, dengê - rengê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 41, dêrê 3, şewe - xewe, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 45, dêrê 2, em - ew, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 49, dêrê 4, seyd - seyd, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 53, dêrê 1, çîn- maçîn, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 55, dêrê 6, kerîmê - kerem, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa y y y y y yy yy

Bergê 2, hejmara helbestê 1, dêrê 1, dad - bê dadî, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 5, dêrê 12, to -bo, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 7, dêrê 13, sûrî - sûrî, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 8, dêrê 1, heqîqî - reqîqî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 11, dêrê 1, mû - rû, tevahîya wan 1 ket.

3.2.Hunerê Patkirdinewe

Patkirdinewe di zimanê 'Erebî de dibêjnê eltikrar “*ewe ku axaftinker peyvek bi heman derbirîn dúbare bike*”¹⁹² lewma hewarê dibin ji bo dúbarekirinê jiber ku hinek caran wata ji peyvan berfirehtire û weke vekolerên biyavê edebî dibêjin “*jiber ku wata bi gelemperî ji peyvan berfirehtir, lewma pêdivî wesa xwestiye Patkirdinewe bê encam dan ji bo dúbarekirina peyvan*”¹⁹³ jiber ku hunerê Patkirdinewe “*diyardeke hunerîye, edebyata nû bi rengekê taybet pîte dide Patkirdinewe dide, eve jî ji wê rastiye derûniye gelemperî tê ku dibêje fêrbûna reftaran êk ji regezên wî ewe bişgirêday dúbarekirinê ye, ev çendê jî xuya ye ku huner jî bi erkê xwe dizane mifa ji wê alyê werbigre, jiber hindê hunerê dúbarekirinê di helwîstên destnîşankirî bikar dînin, ji bo çespendina wê merema têkist ya hey dinav derûnê guhdarî de*”¹⁹⁴ ya di-yare ku dúbarekirin merem jê gehandina hizrê nivîserye ji bo xwandevanî, daku ew mebestê giring ku nivîserî ya hey bi dirustî bigehîte xwandevanî, jiber ku merem ji dúbarekirinê tekezî kirine ji wesf an saloxdan an medîh an lome kirin, jiber hindê em dikarin bêjin “*Patkirdinewe pêktêt ji li dîv êk înana peyvekê carekê an dû caran an sê caran, lê bi mericekê ew dû peyv hevşêwe û hevwater bin an şêwê wan jêk cuda bin*”¹⁹⁵ ev pênase law tir wesfê hunerê patkirdinewe kirye li hember pênvîsên berê. Curên hunerê patkirdinewe evene:

3.2.1. Patkirdinewe ya Dwalîzim

Pêktêt ji wê patkirdinewe yê peyva dúbare kirî dû caran li dîv êk bê, derketina vê jî di sînorê êk dêrê de, bi çenid awayekê têt, ji bo nimûne êk dúbarekirin ew dúbarekirine ku êk car di sînorê êk dêr da be:

*“Min witim tîxî birot saw da be qesdî, ew witî
Pîrî îşqe salim û yekyek keramet derdexa”*¹⁹⁶

Peyva, yek yek, wata ket ket di nîv dêrê dwê de êk car hatye dúbarekirin bi hevawa û hevwater, eve jî bûye egerê dirustbûna hunerê patkirdineweya dwalîzim.

¹⁹² Ebî Bekir Bin ‘Elî Bin ‘Ebidulle Elme’ruf: Babin Hice El’muy, *Xzane Eledeb we Xaye Eledeb*, Dirase: D Kewkeb Dyab, T.2, Bîrut, 2005, S.449.

¹⁹³ Hamid ‘Ebidulhadî Husseyn, *Elbelaxe We Elme’na Fî Elnes.Elquranî*, M. Hye Îdare We îsmar Emwal Elweqif Elsunî, T.1, Bexdad, 2007, S.188.

¹⁹⁴ Mehimud Elbstanî, *Elqewa'd Elbelaxiye Fî Zew Elmenhec Elîslamî*, M. Mosese Eltebi' We Elneşir Fî Elestane Elrezewye, T.1, Meşhed, 1414 H, S.175.

¹⁹⁵ Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjyekan Le Şî'rî Kilasîkî Kurdî Da*, r.168.

¹⁹⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.2.

*“Wa dezanê zînekey palanî pûşe, gir dekwêt
Wek miqaşcarcarlelawe liç le la pêçkey dexta”¹⁹⁷*

Peyva, car car, di nîv dêrê dwê de dû car hatye dúbarekirin bi hevawa û hevwata, eve jî bûye egerê dirustbûna hunerê patkirdinewe dwalîzim. Dûpatkirdinewe: ewê curê patkirdinewe ye ku dû caran di sînorê êk dêrê hozanî de dû caran patikirin bê kirin. Ji bo nimûne:

*“Neken ta letletim, bosey nîhant, rastî nalên
Belê, qefqef heta ney neybirî, hasil şeker nade”¹⁹⁸*

Peyva, car car, di nîv dêrê êkê de êk car hatye dúbarekirin bi hevawa û hevwata, herwesa Peyva, qef qef, di nîv dêrê dwê de dû car hatye dúbarekirin bi hevawa û hevwata. eve jî bûye egerê dirustbûna hunerê patkirdinewe dwalîzim. Sêpatkirdinewe: ewê curê patkirdinewe ye ku sê caran di sînorê êk dêrê hozanî de dû caran patikirin bê kirin. Ji bo nimûne:

*“Sen sen siwarey nîzam gêl olanî turk uşax
Bigre bigrey kurd zuban ax axturkman”¹⁹⁹*

Peyva, Sen sen, ku peyvekê tirkîye û bi ramana (te) cînavê xweser têt, dû car hatye dúbarekirin bi hevawa û hevwata, herwesa Peyva, *Bigre bigre* mîna karekê daxazî dû car hatye dúbarekirin bi hevawa û hevwata, herwesa Peyva, *ax ax* wata Axîn dû car hatye dúbarekirin bi hevawa û hevwata. eve jî bûye egerê dirustbûna hunerê patkirdinewe dwalîzim. Çarpatkirdinewe: ewê curê patkirdinewe ye ku çar caran di sînorê êk dêrê hozanî de dû caran patikirin bê kirin. Ji bo nimûne:

*“Mirqe miriq û qûre qûr û kûre kûr û hîle hîl
Kwêt û dêl û boz û to bezmê bîna nên yek be yek”²⁰⁰*

Di nîv dêrê êkê de Peyva, *Mirqe miriq* wata dengê giyandaranû peyva *qûre qûr* wata dengê sey ûpeyva *kûre kûr* wata xeyalê mirovan û peyva *hîle hîl* dengê hespye. Her çar peyv hunerê patkirdinewe dirust kirine û hatîne dúbarekirin bi hevawa û hevwata. Her çar peyv navin.

¹⁹⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.49.

¹⁹⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.3.

¹⁹⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.542.

²⁰⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.414.

3.2.2. Patkirdinewe ya Sêkane

Pêktêt ji wê patkirdinewe ya ku peyvê dûbare kirî di sînore êk dêrê hozanî de sê caran li dîv hevdu bihên ev cure ji patkirdinewe bi patkirdinewe ya Sêkane tê naskirin, ciwanyeka mezin dide wê hozanê. Ji bo nimûne:

*“Nesîmî subih dem dem dem beser min da qeza dênê
Le turrey çînî zulifî yarewe muşki xeta dênê”²⁰¹*

Peyva, dem, hozanvanî sê caran dûbare kirye bi hevawa û hevwatera, herwesa Peyva dem, eve jî bûye egerê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya Sêkane.

3.2.3. Patkirdinewe ya Nav

Pêktêt ji wê patkirdinewe ya ku peyvê dûbare kirî, nav be û di sînore êk dêrê hozanî de hatibe dûbarekirin. Ji bo nimûne:

*“Êste bo mellahî deryay îşq û ehlî me'rîfet
Qetre qetre eşkî çawm qîmetî lû lû deka”²⁰²*

Peyva, Qetre, wata çip çipa rondikan, dû caran dûbare kirye, peyva dûbare kirî nave, eve jî bûye egerê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya Nav. Nav roleke herî mezin dibîne di xemilandina vê hozanê de.

*“Sa be zarî bo nenalênî le daxî fîr qetit
Bend bendim, ney sîfet, sûta be narî mîhnetî”²⁰³*

Peyva, Bend bendim, wata movkên mirovî rondikan, dû caran dûbare kirye, eve jî bûye egerê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya Nav.

*“Salimî dêwane hoşyare le behsî medhî to
Nuktenukte, yek be yek, wesfî hemûy merbûte rast”²⁰⁴*

Peyva, Nukte, wata xalên ser dêmê yar, ev peyve nave, bi hevşêwe û hevwatera hatye dûbarekirin, eve jî bûye egerê bingehe dirustbûna hunerê patkirdinewe ya Nav.

*“Wêrdî zuban û fikrî dil, şerî fîraqe ser beser
Heldequlê le 'eynî çaw, xiwênî ciger şemer şemer”²⁰⁵*

²⁰¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.1017.

²⁰² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.99.

²⁰³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.168.

²⁰⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.182

²⁰⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.344

Peyva, şemer, nave çunkî wata qazankê mezin, ji dûmahya nîv dêrê dwê de bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin, eve jî bûye egerê bingehê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya Nav.

*“Îbretî nazenîn kwa şamîlî halî salime
Naleyî ew be sa mî’in girya deda, fîreq fîreq”²⁰⁶*

Peyva, fîreq, nave çunkî wata komeka xelkî, dû caran bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin, eve jî bûye egerê bingehê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya Nav.

*“Baqe baqe qîspî gwêj bènme naw çalî syat
Bo hemamî germî pşt agrî gulxen dekem”²⁰⁷*

Peyva, Baqe, nave çunkî bi ramana destek têt ku merem ji komeka tiştane, herwesa ev peyve bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin.

*“Ta xedengî qametî toy girte bawêş, malî qebir
Piştî taqanet le xem xembû, weku malî kewan”²⁰⁸*

Peyva, xem, nave çunkî bi ramana kovî têt ku merem ji ewe ku demê mirov pîr dibe piştî wî xûl dibe, herwesa ev peyve bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin.

*“Xelbe xelbî hey bikuje helsa le deştî çîwar bax
Qadrî delilak, her şew ta seher geh, pase ban”²⁰⁹*

Peyva, Xelbe, nave çunkî bi ramana dengê mirovan têt, dû caran ev peyve bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin. Eve jî evê dêrê hozanê zêdetir şîrîn kirye.

*“Merkebî xor û asmane, nêzeyî zerrîn be kef
Wek ereb dîsan le meydane be hew hew bû heyyan”²¹⁰*

Peyva, hew, nave çunkî bi ramana dengê sey têt anku rewîna sey, dû caran ev peyve bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin. eve jî bûye egerê bingehê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya Nav.

3.2.4. Patkirdinewe ya Hevalnav

Pêktêt ji wê patkirdinewe ya ku peyvê dûbare kirî, hevalnav be û saloxdana navekî an tişteki bike di sînorê êk dêrê hozanî de, bi sedemê wê saloxdanê ku ew peyv

²⁰⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.407.

²⁰⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.483

²⁰⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.512

²⁰⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.533

²¹⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.564

dike bi dúbarekirinê dibe jêdereke sereke ji bo dirustbûna hunerêpatkirdinewe ya hevalnavî. Ew hozanvan yê patkirdinewe ya hevalnavî encam dide ewî divêt ku ew merema wî hey bi zelalî û eşkere bigehîte cem xwandevanî. ji bo nimûne:

*“Raygirt bestem dîsan çawî reşî fettanit
Bo qelbê dilî zarim sef sef sefî mujganit”²¹¹*

Peyva, sef, wata rêz, mîna hevalnavekî ku saloxdana mijîlankên çavên yarê dike ku çawa ji bo lêdana tîrê li dilê salimî mijîlankên wê bi rêz sekinaîne û tîran li çavên salimî didin, ev hevalnavesê caran bi hevşêwe û hevwata hatye dúbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya hevalnav.

*“Hemîsan let lete cergim be yadî tîrî mujganit
Serasîmem leber fikrî îşarey çawî fettanit”²¹²*

Peyva, let, mîna hevalnavekî ku saloxdana cegerê mirovekê aşiq dike, çawa cegerê wî parçe parçe bûye, ev hevalnave dû caran bi hevşêwe û hevwata hatye dúbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya hevalnav.

*“Heta cêt xurfe bê, wek dûrbîne dîde bo çîhret
Be tîrî xemzet, er wek pencere, dil cumle kun kun bê”²¹³*

Peyva, kun, mîna hevalnavekî ku saloxdana dilî dike ku kun kun bûye, mîna pencerekê ku dişkît û kun dibe, dilê mirovên aşiq kun dibe, ev hevalnave dû caran bi hevşêwe û hevwata hatye dúbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya hevalnav.

3.2.5. Patkirdinewe ya Hevalkarê Çewanî

Pêktêt ji wê patkirdinewe ya ku peyvê dúbare kirîhevalkarê çewanî be, anku çawaniya rûdana wê karî xuya dike, bi wê sedemê jî hunerê patkirdinewe ya hevalkarê çewanî dirust dibe. ji bo nimûne:

*“Reqîb çak çak deka cêbî krasî
Girt himçun qiba gîrim axuş”²¹⁴*

²¹¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.205

²¹² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.209

²¹³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.980

²¹⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.387

Peyva, çak, mîna hevalkarekê çewanî ku saloxdana karê evê dêrê hozanêkirye, herwesa dû caran bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya hevalkarê çewanî.

*“Le dengî cûre cûrey siwêskakanî
Du giwêy sûkim be carî her du ker bû”²¹⁵*

Peyva, cûre, bi ramana dengê *siwêske* yê têt ku navê baldarekê deng xweşe, hevalkarekê çewanî ku saloxdana karê evê dêrê hozanê kirye , herwesa dû caran bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya hevalkarê çewanî.

3.2.6. Patkirdinewe ya Cînavê Xweser

Pêktêt ji wê patkirdinewe ya ku cînavê xweser zêdetir ji carekê di sînorê êk dêrê hozanî de hatibe dûbarekirin, daku ew merema hozanvanî hey bi baştirîn şewaz bigehîte cem xwandevanî.. Ji bo nimûne:

*“Le cewrî dilber, kota ke şerhî defter
To bêxudî le taw ewew bê xeber le yaran”²¹⁶*

Ew, cînavê xwesere di kurdîya navîn de ji bo kesê sêyê ket têt bikarînan, dû caran bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin. Bi vê sedemê jî hunerê patkirdinewe ya cînavê xweser dirust bûye.

*“Sefî meqrûzî bê tewsen, le sehmî sen seny etrak
Weku aşiq le hîcîrana, yeka yek eşkrêzanin”²¹⁷*

Sen, cînavê xwesere di zimanê tirkî de ji bo kesê dwê ket têt bikarînan, dû caran bi hevşêwe û hevwater hatye dûbarekirin. Bi vê sedemê jî hunerê patkirdinewe ya cînavê xweser dirust bûye.

3.2.7. Patkirdinewe ya Ristê

Pêktêt ji wê patkirdinewe yê ku ristek zêdetir ji carekê di sînorê êk dêrê hozanî de hatibe dûbarekirin, ji bo zelal kirina ew merema hozanvanî hey ku divê bi rêya dûbarekirinê tekezî li ser merema xwe bike.. Ji bo nimûne:

²¹⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.660.

²¹⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.503

²¹⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 584

“Bo sebah elxîrî dil, xem hatewe !

Merheba bê, merheba bê, merheba !”²¹⁸

Ristê Merheba bê, wata silav li te bin, sê caran mîna ristekê bi hevşêwe û hevwata hatye dûbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya ristê. Hozanvanî jiber hindê ew riste dûbare kirye daku tekezî li ser merema xwe ji bo xwande vanî bike.

3.2.8. Patkirdinewe ya Peyvên Mendehoşyê!

Pêktêt ji wê patkirdinewe yê ku peyva mendehoşyê zêdetir ji carekê di sînorê êk dêrê hozanî de hatibe dûbarekirin, eve jî dibe sedemê xemilandina wê hozanê, çunkî hebûna peyvên mendehoşyê bandoreke mezin ya hey di mikumkirina têkistê hozanê. Ji bo nimûne

“Weh weh çî meclîsê bû, dwê şew le dîde û dil

Dilber şerabî gêra, salim kebabî hêna”²¹⁹

Peyva weh, peyva mendehoşyê ye, di nîv dêrê êkê de dû caran bi hevşêwe û hevwata hatye dûbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya Peyvên Mendehoşyê. Hozanvan mendehoşya xwe xuya dike ku yara wî çawa di vê meclîsê de çavên xwe digêre.

3.2.9. Patkirdinewe ya Karê Daxazî

Pêktêt ji wê patkirdinewe yê ku Karê Daxazî zêdetir ji carekê di sînorê êk dêrê hozanî de hatibe dûbarekirin, dûbarekirina karê daxazî hemî dêrê hozanî bihêz dike, çunkî herdem kar rola xwe ya hey di nav deqê hozanî de, çû têkisteka nîne kar têda nebe, Salim ji bo bihêz kirina hozanên xwe piraniya caran kar mîna hunerê patkirdinewe bikarî naye. Ji bo nimûne

“Sen senî siwarey nîzam û gêl olanî turk uşax

Bigrebigrey kurd zuban û ax axî turkman”²²⁰

Peyva bigre, li destpêka nîv dêrê dwê de mîna karê daxazî dû caran bi hevşêwe û hevwata hatye dûbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya karê daxazî. Hozanvan bi rêya dûbarekirina karê daxazî tekezî li ser merema xwe kirye.

²¹⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 115

²¹⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.135

²²⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 542

3.2.10. Patkirdinewe ya Amrazê Peywendî

Pêktêt ji wê patkirdinewe yê ku ew peyvê tê dúbarekirin di esil de hevşêwe û hevwata ya peyvê li pêşiya xwe ye, lê hozanvanî jiber serwayê helbestê amrazê peywendî êxistiye dinavbera wan peyvên hatîne dúbarekirin, eve jî curekê dahênanê ye, ji aliyekî ve hunerekê taybet yê patkirdinewe yê çêkirî, ji aliyekî din ve serwayê helbestê bihêz kirye. Ji bo nimûne:

*“Mûbe mû zulfî syat esbabe bo qeydî xerîb
Ta qyamet murxî dil lem dawê qet nabê reha”²²¹*

Peyva mû, amrazê peywendî ketiye dinavbera wan de, mîna navekî dû caran bi hevşêwe û hevwata hatye dúbarekirin. eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya amrazê peywendî.

*“Wêl û firarî îşqî tom, şehir be şehir, sû be sû
poşte be poşte, tel be tel, deşt be deşt, kû be kû”²²²*

Peyvên ,şehir, sû, poşte, tel, deşt û kû mîna hevalnavekê her şeş peyv her êk dû caran bi hevşêwe û hevwata hatye dúbarekirin lê amrazê peywendî ketiye dinavbera wan de, eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê patkirdinewe ya amrazê peywendî.

Girngya hunerê patkirdinewe di wê çendê daye ku salimî gelek mifa jê wer-girtiye, hozanvan pişkên axaftinê mîna Nav, Hevalnav, Amrazê Peywendî, Cînavê Xweser û Kar, tevahiya van peyvên henê kirye bingehek ji bo dirustkirina ciwanî dinav helbestên xwe de, herwesa hozanên xwe bi vana xemlandye, dinav dêrên helbestên wî de roleke mezin dîtîye ji dirustkirina hunerê patkirdinewe, çunkî bûye jêderekê sereke ji bo hozanvanî. Rolê Navî zêdetir ji hemî pişkên axaftinê di pêkînan û dirustkirina hunerê patkirdinewe tê ber çavan, bi gelemperî hunerê patkirdinewe ji bo mezin kirina rewşeke siyasî, civakî, derûnî tê bikarînan, ku helbestvanî bi kêfa xwe rewşek mezin kirye, viyabe bi rêya mezin kirina vê rewşê merema xwe bigehîne xwandevanî û vê mezin kirinê bike sedemê xemilandina helbestên xwe. Herweha dúbarekirinên nav helbestên salimî ji bo tekeziyê li ser watayên ku wî anye ziman, hozanvanî viyabe ew merema ku pê hey bi rêya hunerê patkirdinewe tekezî li ser bike, herwesa bi rêya patkirdinewe helbestvan pir zîrekî ve muzîkeke bihêz ji bo helbestên

²²¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 52.

²²² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 666.

xwe dirustkirye, herwesa wekirye xwandevean ji xwandina hozanan bêzar nebin bi egerê ew muzîka hendesî ku dinav hozanên salmî dane.

3.2.11. Amara Hunerê Patkirdinewe

Tîpa aaa aa aaaaaaaaa a a a a aa a a a

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 5, yek, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 3, qef, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 4, derd, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 23, 'elîyî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 11, cûte, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 12, dêrê 4, bex, tevahîya wan 4 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 13, dêrê 27, car, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 14, dêrê 1, mû, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 30, dêrê 5, qetre, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 35, dêrê 1, mû, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 36, dêrê 8, merheba bê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 44, dêrê 7, weh, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 46, dêrê 18, let, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa b b b b b b b b b b b b b b b

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, bend, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 7, yek, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 12, dêrê 4, bex, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 13, dêrê 4, dem, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 15, dêrê 1, sef, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 17, dêrê 1, lete, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 19, dêrê 10, nex, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 23, dêrê 6, yek, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa d dd d d dd d d d d d d d d

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 3, gul, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa r r r r r r r r r r r r r r r r r

Bergê 1, hejmara helbestê 21, dêrê 2, cê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 23, dêrê 1, şemer, tevahîya wan 11 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 24, dêrê 2, kûn, tevahîya wan 2 ket.

Tîpa qq q q q q q q q q q q q q q

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 7, fîreq, tevahîya wan 11 ket.

Tîpa kk k k k k k k k k k k k k

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, kun, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 3, yek, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 1, yek, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa mm m m m m m m m m m m m m m

Bergê 1, hejmara helbestê 7, dêrê 7, car, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 14, dêrê 1, roj û şew, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 24, dêrê 11, baqe, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa nn n n n n n n n n n n n

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 7, ew, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 5, dêrê 5, bû, tevahîya wan 6 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 4, çak, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 7, dêrê 34, xelbe, tevahîya wan 5 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 11, dêrê 2, hew, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 16, dêrê 32, sen, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 17, dêrê 4, qetre, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 6, ser, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa ûû w û w û û w û w û w û w w

Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 8, leb, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 17, dêrê 5, hu, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 21, dêrê 4, cûre, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 23, dêrê 1, deşt, tevahîya wan 29 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 22, mû, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 4, çep, tevahîya wan 4 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 27, dêrê 2, mûyî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 30, dêrê 2, yek, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 34, dêrê 3, yek, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 37, dêrê 5, mû, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa oo o

Bergê 2, hejmara helbestê 3, dêrê 4, bend, tevahîya wan 2 ket.

Tîpa hhh h h h h

Bergê 2, hejmara helbestê 6, dêrê 3, ya qûte, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 14, dêrê 4, çîn, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 24, dêrê 4, yek, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 29, dêrê 5, arê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 36, dêrê 2, helqe, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa y y y y yyy y y y y y y y y

Bergê 2, hejmara helbestê 11, dêrê 1, çîn, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa êêê ê ê ê ê ê

Bergê 2, hejmara helbestê 12, dêrê 4, kûn, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 27, dêrê 1, dem, tevahîya wan 1 ket.



3.3.Hunerê Hênanewe

Hunerê Hênanewe di zimanê 'Erebî de bi Eltesdîr an Red Elhiciz 'En Elsedir hatye naskirin “*Hênanewe pêktêt ji hebûna dû peyvên hevşêwe an hev regez, peyva dwê herdem cihekê xuyakirî heye û dikeve dûmahya dêrê helbestan, herwesa herdem peyva êkê dikeve destpêka nîv dêrê êkê an navîna nîv dêrê êkê an dûmahya nîv dêrê êkê an destpêka nîv dêrê dwê*”²²³ hunerê hênanewe pêktêt ji vegerandina dû peyvên hevşêwe û hevregêz bi wê mercê ku “*êk dikeve dûmahya dêrê helbestê, peyva dinbikeve destpêka nîv dêrê êkê an navîna nîv dêrê êkê an dûmahya nîv dêrê êkê an destpêka nîv dêrê dwê*”²²⁴ hênanewe curekê yarî kirine bi peyvan, hozanvanî ji bo bihêz kirina rîtmê serwaya dêrên hozanan bikarîname “*Hênanewe ew tişte ku hozanvan li destpêk an navîn an dûmahya nîv dêrê êkê, an li destpêka nîv dêrê dwê de peyvekê binivîse û paşî heman peyv li dûmahya wê dêrê hozanî de binivîse*”²²⁵ armanca hunerê hênanewe ewe ku ev hunere roleke here mezin hebe ji bo tekezî li ser watayekê ku berî hingî dinav wê dêrê de were gotin, herwesa ji bo derxistina şyana wî zimanî ku hozan pê hetye nivîsandin, herwesa hênanewe pêktêt ji înanana dû peyvan ku li şêwe û regez de wekhev bin an jêk nêzîk bin, lê regez û rihê wan êk peyv be, anku li êk rih hatbine wergirtin. Êk ji wan peyvan herdem li dûmahya dêrê helbestê be, peyva din an bikeve destpêka nîv dêrê êkê an navîna nîv dêrê êkê an dûmahya nîv dêrê êkê an destpêka nîv dêrê dwê. Curên hunerên hênanewe jî evene:

3.3.1. Hunerê Hênanewe ya Hevşêwe û Hevwata

Ji wan dû peyvan pêktêt ku ji dû cihên dêrê hozanî de were înan, ji herdû ali-yên rûxsar û naverokê wekhev bin, anku ew peyv hevşêwe û hevwata bin. Eve jî ji çend curan pêk têt:

3.3.1.1. Peyva Êkê li Destpêka Nîv Dêrê Êkê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li destpêka nîv dêrê êkê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, herwesa herdû peyv hevşêwe û hevwata bin. Ji bo nimûne

“*Lebî tîşnem xerîkî zîkrî toyê*”

²²³ Îdrîs Ebidulla, *Hendê Hunerî Ciwankarî Le Şî'rekanî Pîremêrd Da*, Govarî Korî Zanyarî Kurdistan, Jimare 6, Hewlêr, 2007, r.262.

²²⁴ Ehîmed Metlub, *Finun Belaxye Elbeyan We Elbedî*, M. Dar Elbihus El'limye, Elkweyt, 1975, S.84.

²²⁵ Hîwa Nuredîn, *Bunyadî Rîtm Le Şî're Kurdyekanî 'Ebidulla Begî Mîsbah Dîwan Edeb*, 2009, Namey Master, Zankoy Selahedîn, Kolêjî Zman, Beşî Kurdî, r.31.

*heta ruhm letenda dête ser leb*²²⁶

Peyva, leb, li destpêka nîv dêrê êkê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vege-
randin, herdû peyv hevşêwe û hevwatane. Leb wata lêvê mirovî.

*“Dilbêxude le dîdet û dîdet xerabî mey
mey çakî send le dîdeyî to, întîqamî dil”*²²⁷

Peyva, dil, li destpêka nîv dêrê êkê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vege-
randin, herdû peyv hevşêwe û hevwatane. Eve jî awazeke xweş û dilveker yê daye
hozanê.

3.3.1.2. Peyva Êkê li Navîna Nîv Dêrê Êkê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem pey-
va êkê li navîna nîv dêrê êkê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv
dêrê dwê were nivîsandin, herwesa herdû peyv hevşêwe û hevwater bin. Ji bo nimûne

*“Tawî da narî reşit metireqî tir
Reşe dûr bê reşîy merdum le reşit”*²²⁸

Peyva, reşit, li navîna nîv dêrê êkê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vege-
randin, herdû peyv hevşêwe û hevwatane. Reşit wata rengê reş.

*“Ta amedî talî’ bû weku xusrewî perwêz
geh bade be leb, geh le lebe xunçe dem bû”*²²⁹

Peyva, bû, karê borî yê dûre, li navîna nîv dêrê êkê û li dûmahya nîv dêrê dwê
hatye vege-
randin, herdû peyv hevşêwe û hevwatane. Di vê dêrê hozanê de kar bûye
jêderê sereke yê dirustbûna hunerê hênanewe.

*“Bête xew her şew hebîbim, ya îlah!
Bê be qed rojî qyamet gûlî şew”*²³⁰

Peyva, şew, li navîna nîv dêrê êkê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vege-
randin, herdû peyv hevşêwe û hevwatane. şew wata rengê reş. Di vê dêrê hozanê de
nav bûye jêderê girng yê dirustbûna hunerê hênanewe. Çunkî bi rêya wî hunerê
hênanewe dirust bûye.

²²⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 158.

²²⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 426.

²²⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 239.

²²⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 635.

²³⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 712.

3.3.1.3. Peyva Êkê li Dûmahya Nîv Dêrê Êkê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li dûmahya nîv dêrê êkê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, herwesa herdû peyv hevşêwe û hevwatera bin. Ji bo nimûne:

*“Her 'emden yarî min, bê perde qamet derdexa
Mehzî kîzbî mudide'at dehrî qyamet derdexa”²³¹*

Peyva, derdexa, karê borî ye, li dûmahya nîv dêrê êkê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vegerandin, herdû peyv hevşêwe û hevwaterane. Di vê dêrê hozanê de kar bûye jêderê sereke yê dirustbûna hunerê hênanewe.

*“Dewrî em qerne Leser min bestemhat û guzest
Sal û meh, herçî heyatim bû, be xemhat û guzest”²³²*

Ristê, hat û guzest, wata hat û çû, li dûmahya nîv dêrê êkê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vegerandin, herdû peyv hevşêwe û hevwaterane. Bi vê sedemê jî hênanewe ya ristê dirust bûye.

*“Be neqdî can deda yek bose dildarim, welê zehmet
Degate heddî wabûn 'uqdeyî welê zehmet”²³³*

Ristê, welê zehmet, li dûmahya nîv dêrê êkê hatye û li dûmahya vê dêrê jî de hatye vegerandin, herdû peyv hevşêwe û hevwaterane. Bi vê sedemê jî hênanewe ya ristê dirust bûye.

*“Guşadîy 'uqdeyî xatir be karê bû ewîş raburd
Dilî pir şorşim xoş nûdî yarê bû ewîş raburd”²³⁴*

Ristê, bû ewîş raburd, li dûmahya nîv dêrê êkê hatye û li dûmahya vê dêrê jî de hatye vegerandin, herdû peyv hevşêwe û hevwaterane. Bi vê sedemê jî hunerê hênanewe dirust bûye

*“Me'neyê nîn wekû yek, şerhî min û dilberî min
Qetlî min, sîhhetî ew, şekweyî ew, defterî min”²³⁵*

²³¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 1.

²³² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 193.

²³³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 234.

²³⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 254.

²³⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 569.

Min, cînavê xwesere di kurdîya navîn de ji bo kesê êkê ket tê bikarînan, li dûmahya nîv dêrê êkê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vegerandin, hozanvanî di vê dêrê hozanê de cînavê xwesere kirye bingehê dirustbûna hunerê hênanewe.

3.3.1.4. Peyva Êkê li Destpêka Nîv Dêrê Dwê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li destpêka nîv dêrê dwê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, herwesa herdû peyv hevşêwe û hevwaterane. Ji bo nimûne:

*“Le baxa xunçe dil tenge le hesret xunçey lêwit
Gerîban çak ruwawe gul leber şewqî gerîbant”²³⁶*

Peyva, gerîban, wata pişkivîn anku pişkuj, li destpêka nîv dêrê dwê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vegerandin, herdû peyv hevşêwe û hevwaterane.

*“xeberî mirdinî salim bene lay yar û bilên:
Şînî yekcarîyî te'zîyeşî bîkrê be şîn”²³⁷*

Peyva, şîn, wata giryan û lorîn, li destpêka nîv dêrê dwê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vegerandin, herdû peyv hevşêwe û hevwaterane.

3.3.1.5. Peyva Êkê li Navîna Nîv Dêrê Dwê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li navîna nîv dêrê dwê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, herwesa herdû peyv hevşêwe û hevwaterane. Ji bo nimûne:

*“Aşuftegîyî dewran kullen le dilm qeyde
Sewdayîy perêşanim bo zulfi perêşanit”²³⁸*

Peyva, perêşan, wata derdê evînê, li navîna nîv dêrê dwê û li dûmahya nîv dêrê dwê hatye vegerandin, herdû peyv hevşêwe û hevwaterane. Eve jî ciwanyeka mezin daye vê dêrê helbestê.

*“Lejêr barî xefet salim sebûr be
Denêrê ehmedît muxtarî ehmed”²³⁹*

²³⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 212.

²³⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 609.

²³⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 205.

²³⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 266.

Ehmed, mîna navekî, li navîna nîv dêrê dwê û li dûmahya vê dêrê jî de hatye vegerandin, herdû peyv hevşêwe û hevwatane. Hozanvanî di vê dêrê hozanê de bi rêya navê ehmed hunerê hênanewe dirustkirye

3.3.2. Hunerê Hênanewe ya Hevregezî

Ji wan dû peyvan pêktêt ku ji dû cihên dêrê hozanî de were înan, hevregez bin û êk rihê ferhengî jî hebin, herwesa ew dû peyv watay wan jêk cuda bin û hindek caran jî wataya wan jî jêk cudane. Giringtirîn curên hênanewe ya hevregezî evene:

3.3.2.1. Peyva Êkê li Destpêka Nîv Dêrê Êkê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li destpêka nîv dêrê êkê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, lê herdû peyv hevregez bin. Ji bo nimûne:

*“Yar, salim kwa le hîcra, roj û şew cuz yadî yar?
Meylî tenhayî dekem, ta yadî dilber yarme”²⁴⁰*

Peyva, yar, wata dost, li destpêka nîv dêrê êkê hatye, lê peyva yarme bi ramana sedem têt û li dûmahya vê dêrê de hatye, herdû peyv êk rihê ferhengî heye lê wataya wan jêk cudaye.

3.3.2.2. Peyva Êkê li Navîna Nîv Dêrê Êkê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li navîna nîv dêrê êkê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, lê herdû peyv hevregez bin. Ji bo nimûne:

*“Murxî baxî heremî toye dilm, lêy mede tîr
Bê xemane bestem mekuje weha, seydî herem”²⁴¹*

Peyva, herem, hevalnave û saloxdana navê baxî kirye li navîna nîv dêrê êkê hatye, herweha peyva heremî bi ramana qedexe têt anku heram, li dûmahya vê dêrê hozanî de hatye, herdû peyv êk rihê ferhengî heye lê wataya wan jêk cudaye.

²⁴⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.798.

²⁴¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.462.

3.3.2.3. Peyva Êkê li Dûmahya Nîv Dêrê Êkê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li dûmahya nîv dêrê êkê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, lê herdû peyv hevregez bin. Ji bo nimûne:

*“Şehdî lebî le'li yar, qîmetî şekker şika
Dîdeyî mestî nwand, saxerî ebher şika”²⁴²*

Peyva, şika, karê borî ye li dûmahya nîv dêrê êkê hatye, herweha peyva şika hevalkare û saloxdana çawaniya şkestina gilasê şerab dike li dûmahya vê dêrê hozanî de hatye, herdû peyv êk rihê ferhengî heye lê wataya wan jêk cudaye.

*“Be pa bosî le qedta turre ta key çîn be çîn derjê?
Wekû baranî rehma, her le serda bo zemîn derjê?”²⁴³*

Peyva, derjê, karê neborî ye, bi ramana maçî kirina pêyê yar tê, li dûmahya nîv dêrê êkê hatye, herweha peyva derjê bi ramana barîna baran têt ku li dûmahya vê dêrê hozanî de hatye, herdû peyv êk rihê ferhengî heye lê wataya wan jêk cudaye.

3.3.2.4. Peyva Êkê li Destpêka Nîv Dêrê Dwê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li destpêka nîv dêrê dwê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, lê herdû peyv hevregez bin. Ji bo nimûne:

*“Çwar çêwey kursî be piştî kefelit
Reşe wek taqî xelûzane reşit”²⁴⁴*

Peyva, Reşe, hevalnave, saloxdana navê kesekî kirye, li destpêka nîv dêrê dwê hatye, herweha peyva reşit bi ramana rengê reş têt ku li dûmahya vê dêrê hozanî de hatye, herdû peyv êk rihê ferhengî heye lê wataya wan jêk cudaye.

3.3.2.5. Peyva Êkê li Navîna Nîv Dêrê Dwê Da be

Wata ew dû peyvên dibine sedemê dirustbûna hunerê hênanewe, herdem peyva êkê li navîna nîv dêrê dwê ware nivîsandin û herweha peyva dwê li dûmahya nîv dêrê dwê were nivîsandin, lê herdû peyv hevregez bin. Ji bo nimûne:

²⁴² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.93.

²⁴³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.1005.

²⁴⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.240.

*“Penahî birde ber çawit, dilî teng
Deway bîmar eger bikrê be bîmar”*²⁴⁵

Peyva, bîmar, nav û bi ramana nexweş tê, li navîna niv dêrê dwê hatye, herweha peyva be bîmar bi ramana serxoşî têtku gelek caran ji encamê vexwarinê mey tê rojevê, li dûmahya vê dêrê hozanî de hatye, herdû peyv êk rihê ferhengî heye lê wataya wan jêk cudaye.

Girngya hunerê hênanewe ewe ku ev hunere dinav helbestan de zengînya wê zimanê derdixe ku wê hozan pê hatye nivîsandin ji aliyê wê çenidê ku heta çî qas ev ziman peyv û destewajên hevwatera û firewatera bi xwe ve digire, herwesa heta çû qas ev zimanê wê têtkest pê hatye nivîsandin bikaribe şyana xwe derxe. Jiber ku hebûna peyvên hevwatera pêdivî bi ferhengeka zimanîye, ew ferhenga zimanî jî di zimanê kurdî de heye. Salimî mifa ji ferhenga zimanê kurdî wergirtiye, hunerê bihêz dirustkirye, ev hunere jî roleke girng heye di xweş kirina serwaya helbestan û xemilandina hozanan bi gelemperî.

Herwesa armanca hunerê hênanewe di hozanê Salimî de ji bo tekezî kirine li ser meremeka xuyakirî ku hozanvan viyabe bi rêya hunerê hênanewe ew merema ku wî yê hey bi awayekê saxlem pêşkêşî xwandevanan bike, jiber ku hunerê hênanewe hunereke girng ya ciwankarya peyvane, çunkî piraniya caran wataya helbestan bi sedemê xemilandina wan bihêz dibe, hunerê hênanewe ew hunerê girng ku hozanvanî bi awayekê zîrek bikarînye û hozanên xwe pê xemilandine, herweha bi rêya vê hunerê bergeke edebî kirye ber peyvên xwe.

3.3.3. Amara Hunerê Hênanewe

Tîpa a aa aa aaa a aa a a a a a a a a a a a a a a a a a a

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, derdexa, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 8, dest û pa, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 8, dêrê 6, rengî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 2, dara, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 14, deka, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 11, dêrê 12, kuca, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 13, dêrê 5, min, tevahîya wan 1 ket.

²⁴⁵*Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.294.

Bergê 1, hejmara helbestê 16, dêrê 1, dilber da, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 17, dêrê 1, bim le, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 19, dêrê 1, peyda, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 28, dêrê 1, şika, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 29, dêrê 1, deka, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 31, dêrê 3, deka, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 32, dêrê 1, deka, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 33, dêrê 1, mey, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 34, dêrê 1, neka, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 37, dêrê 1, mela, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 39, dêrê 1, rû, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 41, dêrê 1, dîdema, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 42, dêrê 1, nema, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 44, dêrê 1, hêna, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa bb b b b bb b b b b

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 5, leb, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 8, dêrê 1, hebîb, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa t t t t t t t t

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, hat, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 4, dêrê 1, mahîygrit, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 1, mû, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 1, dost, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 1, hat û guzeşt, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 18, dêrê 3, gerîban, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 22, dêrê 10, rû, tevahîya wan 8 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 23, dêrê 1, aqîbet, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 1, welê zehmet, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 1, quwetî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 27, dêrê 1, reşe, tevahîya wan 23 ket.

Tîpa sssss s s s s s s s s

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, 'ebes, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa dddd d dd d d d d d d

Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 1, bû ewîş raburd, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 1, ehmed, tevahîya wan 2 ket.
Tîpa j j j j j

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, kaxez, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 1, kaxez, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa r r r r r r r r r r r r r r r

Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 5, dil, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 1, aşkar, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 4, bîmar, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 13, dêrê 1, yar, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 16, dêrê 9, gûr, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 21, dêrê 10, pes ber, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 31, dêrê 8, çawit, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 32, dêrê 1, zahîr, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa z

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 2, çerx, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa s s s s s s s s s

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, mexsûs, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa g g g g g g g g g

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, xûda hafîz, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa "

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, elweda', tevahîya wan 12 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 1, manî', tevahîya wan 1 ket.
Tîpa x

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, şew çirax, tevahîya wan 1 ket.
Tîpa l

Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 1, bo dil, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 3, dil, tevahîya wan 6 ket.
Tîpa m m m m m m m m m

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, bim tabim, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 1, bim, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 1, bim, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 8, dêrê 2, bîmar, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 1, kesêkim, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 11, dêrê 1, deyzanim, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 16, dêrê 1, heram, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 17, dêrê 1, hemû dem, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 20, dêrê 1, nakem, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 21, dêrê 1, nakem, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 23, dêrê 4, kem, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 24, dêrê 1, dekem, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 1, cananem, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 7, ew xale, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 27, dêrê 2, rehm, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa nn n n nnn

Bergê 1, hejmara helbestê 5, dêrê 36, em, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 1, bû asman, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 20, lingan, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 1, eyan, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 11, dêrê 1, bû eyan, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 12, dêrê 2, min, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 13, dêrê 1, min, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 14, dêrê 1, min, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 15, dêrê 1, min, tevahîya wan 7 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 19, dêrê 1, deken, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 26, dêrê 8, şîn, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 28, dêrê 1, be huseyn, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa ûû ûûû

Bergê 1, hejmara helbestê 2, dêrê 1, bû, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 1, bû, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 4, dêrê 1, bû, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 5, dêrê 3, bû, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 6, dêrê 2, bû, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 7, dêrê 3, mû, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 8, dêrê 1, bû, tevahîya wan 2 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 2, bû, tevahîya wan 1 ket.
Bergê 1, hejmara helbestê 10, dêrê 1, bû, tevahîya wan 3 ket.

Bergê 1, hejmara helbestê 11, dêrê 1, bû, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 12, dêrê 1 , bû, tevahîya wan 3 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 13, dêrê 1 , bû, tevahîya wan 2 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 14, dêrê 1 , bû, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 15, dêrê 8, ke dîm derga nebû, tevahîya wan 38 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 16, dêrê 1, bû, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 17, dêrê 1, kû kû, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 20, dêrê 5, kwê çû, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 27, dêrê 1, balaye hemû, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 28, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 29, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 30, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 31, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 32, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 33, dêrê 7, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 34, dêrê 2, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 35, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 36, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 37, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 1, hejmara helbestê 38, dêrê 1, emşew, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa o o o o o o o o o o o o

Bergê 2, hejmara helbestê 1, dêrê 1, to, tevahîya wan 2 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 2, dêrê 8, to, tevahîya wan 2 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 3, dêrê 1, to, tevahîya wan 2 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 4, dêrê 8 , emro, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 5, dêrê 1, meço, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa h h hh h

Bergê 2, hejmara helbestê 2, dêrê 5, telebe, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 12, dêrê 2, nure, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 22, dêrê 6, seg, tevahîya wan 3 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 26, dêrê 7, yar, tevahîya wan 2 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 33, dêrê 10, mine, tevahîya wan 1 ket.
 Bergê 2, hejmara helbestê 34, dêrê 1, mine, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 40, dêrê 4, hatewe, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 41, dêrê 1, hatewe, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 50, dêrê 2, heye, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 51, dêrê 1, heye, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 52, dêrê 9, heye, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 53, dêrê 1, heye, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 54, dêrê 2, nîye, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 55, dêrê 1, nîye, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 56, dêrê 7, nîye, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 57, dêrê 1, nîye, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 58, dêrê 1, nîye, tevahîya wan 2 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 59, dêrê 1, nîye, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa yy y y y y

Bergê 2, hejmara helbestê 19, dêrê 5, hey, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 23, dêrê 1, dekey, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa ê êê

Bergê 2, hejmara helbestê 3, dêrê 1, nabê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 4, dêrê 1, nabê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 5, dêrê 1, nabê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 13, dêrê 1, çî debê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 14, dêrê 1, debê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 16, dêrê 1, qet nebê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 17, dêrê 6, xawî, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 20, dêrê 1, debarê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 22, dêrê 1, derjê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 25, dêrê 1, çî lewê bim, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 26, dêrê 8, bidemê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 27, dêrê 1, dênê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 28, dêrê 1, dênê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 29, dêrê 1, dênê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 30, dêrê 1, derjênê, tevahîya wan 1 ket.

Bergê 2, hejmara helbestê 33, dêrê 3, mû, tevahîya wan 2 ket.

3.4.Hunerê Gêranewe (Vegêran)

Hunerê Gêranewe wata vegêrana peyvek an zêdetir di çarçuvê êk dêrê helbestê de ji aliyê hozanvanî ve, ji bo her carekê peyvek an destewajek bikeve cem peyvek cuda, jiber hindê em dikarin bêjîn “*huner gêranewe pêktêt ji daleqandina peyvekê ji alyê hozanvanî ve di dêrekê de bi watayekê, paşî di heman dêr de vê peyvê vedigere û bi watayekê din girê dide*”²⁴⁶gêranewe bi gelemperî armanca wî tekezî kirine li ser meremeka xuyakirî ji bo dirustkirina awazên dinav dêrên hozanî de eve jî sedemeke ji bo xweş tir xwandina vê hozanê, herwesa 'Ezîz Gerdî derbarê hunerê gêranewe dibêje “*gêranewe pêktêt ji wê çendê ku peyvek an rîstek an destewajek bîne û bi watayekê taybet hatibe girêdan, paşî heman peyv, rîste an destewaje bi aniye ve, lê evê zarê ew peyv peywendî bi tiştên din ve hebe*”²⁴⁷girngya hunerê gêranewe ku kêşa tevahiya helbestê bihêz dike û awazeke xweş û rîtmeke bihêz dinav de ji bo helbestê dirust dike, herweha hunerê gêranewe wata vegêrana carekê an zêdetir yên peyv, rîste û destewaje di sînorê êk dêr de, paşî heman peyv dûbare li cem peyvekê din bê vegerandin bi watayekê cuda ji wataya peyva pêşî. Curên hunerê Gêranewe evene:

3.4.1. Hunerê Gêranewe li Gor Peyvên Vegerandî

Pêktêt ji vegerandina peyv, rîste an destewaje dû caran an sê caran an çar caran an hevt caran di sînorê êk dêrê hozanê de, wata her carekê ku ew peyv tê vegerandin bi rex peyveka cuda ra be, eve jî awazeke xweş dide wê hozanê û serwaya helbestê bihêz dike. Ji bo nimûne:

“*Meyle, wek serîzulfît, serî min bo berî pa
Be cefa meyxere la, sa senema tûbî xuda*”²⁴⁸

Peyva ser, wata serê mirovî, dû caran hatye vegerandin carekê bi rex peyva zulfît, carek jî bi rex peyva min, herdû caran birex peyvekê cuda hatîne vegerandin, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya dû caran dirust bûye, jiber ku vegêrana dû caran yên peyvan wata vegêrana dû caran yê peyvan di sînorê êk dêr de.

“*Hemû car çwarde yaprax û dû cût nanî qewî
Bay deda, lûlî deda, qûtî deda, mîslî dewab*”²⁴⁹

²⁴⁶ En'am Fiwal 'Kawî, *Elm'cem Elmfezil El'lum Elbelaxe El'erebiye*, M. Dar Elkiitb El'Limye, T.3, Beyrut, 1996, S.303.

²⁴⁷ 'Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, Bergê Duwê, 1975, r.42.

²⁴⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.9.

²⁴⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.152

Peyva deda, kare, sê caran hatye vegerandin carekê bi rex peyva bay, carek jî bi rex peyva lûlî, carek din jî bi rex peyva qûtî, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya sê caran dirust bûye, eve jî awazeke xweş dide vê hozanê, jiber ku vegêrana sê caran yên peyvan wata vegêrana sê caran yê peyvan di sînorê êk dêr de.

*“Befîkrî mûşkaf em şew qyasim kirid le rûzulfî
Be tarîşî, be gûlîşî, be qed tarî nebû yelda”²⁵⁰*

Peyva be, çar caran hatye vegerandin. cara êkê bi rex peyva fîkrî, cara dwê jî bi rex peyva tarîşî, cara sêyê jî bi rex peyva gûlîşî, cara çarê jî bi rex peyva qed, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya çar caran dirust bûye, jiber ku vegêrana çar caran yên peyvan wata vegêrana çar caran yê peyvan di sînorê êk dêr de.

*“Mêxbe destê, mêx be pişte, mêx rfêne, mêx derên
Mêxbe pêşe, mêx be paşe, mêx şkêne, tuleke”²⁵¹*

Peyva mêx, wata bizmar, heft caran hatye vegerandin. cara êkê bi rex peyva be destê, cara dwê jî bi rex peyva be pişte, cara sêyê jî bi rex peyva rfêne, cara çarê jî bi rex peyva derên, cara pêncê jî bi rex peyva be pêşe, cara şeşê jî bi rex peyva be paşe, cara heftê jî bi rex peyva şkêne, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya çar caran dirust bûye, jiber ku vegêrana heft caran yên peyvan wata vegêrana heft caran yê peyvan di sînorê êk dêr de.

3.4.2. Şêwazên Hunerê Gêranewe ya Peyvan

Peyva vegerandî dibe xuyakirî ji bo navekî, di wê dêrê de diçe di çarçûvê hevalnavî û saloxdana navekî dike, bi sedemê saloxdanên çir û pir hunerê gêranewe dirust bûye. Ji bo nimûne:

*“Mîhrîcanane hwey daye Leser xakî le hed
Le muqabîl dilî salim derwê mîhrî giya”²⁵²*

Peyva mîhr, di vêre da yê bûye xuya kerê ji bo dû navên ji hev cuda û ji hev dûr, di cara êkê de yê bûye xuya kerê peyva canan, cara dwê yê bûye xuya kerê peyva giyan, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya peyvan dirust bûye.

*“Şeker efsanîy şîrîn zuban mayey helawet bû
Dehan şîrîn deka her herf û nukte wek şeker kaxez”²⁵³*

²⁵⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.17.

²⁵¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, L 775

²⁵² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 10.

Peyva şîrîn, yê bûye xuya kerê ji bo dû navên ji hev cuda û ji hev dûr, di cara êkê de yê bûye xuya kerê peyva zuban, herweha cara dwê yê bûye xuya kerê peyva dehan, herdû peyv saloxdana dû navên cuda kirine, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya peyvan dirust bûye.

Peyva vegerandî bibe xuya kerê navekî, anku ew peyva tê vegerandin bibe xuya kirî û ji alyê peyveka din hatye saloxdan, ev şêwaz di helbestê salimî de pir heye, hozanvan bi kêfa xwe yarî bi peyvan kirye daku helbestên xwe bixemlîne. Ji bo nimûne.

“Be rûyroje nuwandî, leylî deycûr

Le turre û rû be mecnûn, leylî mestûr”²⁵⁴

Peyva leylî, di vêre da nave, yê bûye xuya kirî, jiber ku dû caran yê hatye vege-
erandin, di cara êkê de bi rex peyva deycûr, cara dwê bi rex peyva mestûr, herdû peyv
saloxdana navêleylî kirine, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya xuyakirî dirust bûye.

“Rengdomî û reng zîndoz, hem lê dem û hem bend kem

Kştek le kunî lûtî, miştet le defey şanit”²⁵⁵

Peyva Reng, di vêre dêrê hozanê da yê bûye xuya kirî, jiber ku cara êkê de bi
rex peyva dom hatye vegeerandin ku bi ramana qereçî têt, herwesa cara dwê bi rex
peyva zîndoz hatye vegeerandin ku bi ramana mirdin têt, bi vê sedemê jî hunerê
gêranewe ya xuyakirî dirust bûye.

Vegêrana xuyakirî û nav: peyva vegeerandî carek dibe xuyakirî, carek bibe nav,
wata ev peyva ku tê vegeerandin carek erkê wî xuyakirî be, carek jî erkê navî bibîne,
anku herdû caran ku tê vegeerandin dû erkên cuda hebin.

“Meramî xatirî exyare reftarit legel salim

Be mîslî 'ehdî dunyaye wefa û 'ehd û peymanit”²⁵⁶

Peyva 'ehd, dû caran hatye vegeerandin di vê dêrê hozanê da, cara êkê rolê
xuyaker dibîne û behsa bê wefayî ya dunya yê dike, cara dwê erkê navî dibîne, bi vê
sedemê jî hunerê gêranewe ya xuyaker û nav dirust bûye.

²⁵³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 268.

²⁵⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 312.

²⁵⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 217.

²⁵⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 211.

*“Rojke zahîr bû nîşaney defî nusxey zulmete
Zulfî to, bê şew le rûy roj kirdî deycûr, aşkar”²⁵⁷*

Peyva Roj, di vê dêrê hozanê da dû caran hatye vegerandin, cara êkê rolê navî dibîne û çunkî merema wî ronahîyê rojê ye, cara dwê erkê xuyaker dibîne çunkî saloxdana rûyê yar dike, hozanvan di wê baweriyê daye ku rûyê yar mîna ronahîyê rojêye bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya xuyaker û nav dirust bûye.

Peyva vegerandî carek bibe diyarîkirî, carek bibe diyarker, anku ew peyvê ku tê vegerandin carek erkê diyarîkirî digêre, herweha carek jî erkê diyarkerî dibîne, bi vê sedemê jî vegerandinek bihêz dirust dibe dinav helbestê de. Ji bo nimûne:

*“Le baxe xunçe dil tenge le hesret xunçe yî lêwit
Gerîban çak ruwawe gul leber şewqî gerîbanî”²⁵⁸*

Peyva xunçe, di vê dêrê da dû caran hatye vegerandin, cara êkê rolê diyarîkirî dibîne ku bi ramana pişkuj têt û behsa dil teng ya pişkuj dike, cara dwê erkê diyarkerî dibîne çunkî peyva pişkuj saloxdana lêvên yarê dike, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya diyarkerî diyarîkirî dirust bûye.

Peyva vegerandî carek bibe diyarîkirî, carek bibe nav, anku ew peyvê ku tê vegerandin carek erkê diyarîkirî digêre û carek jî erkê navî dibîne, eve jî cureke ji yarîkirin bi peyvan bi armanca xemilandina helbestan. Ji bo nimûne

*“Nemawe qudretî çawm bexwahîş seyrî çawit ka
Le îmay turkî dîdet bo dilm tîrî qeza zahîr”²⁵⁹*

Peyva çaw, di vê dêrê da dû caran hatye vegerandin, cara êkê rolê diyarîkirî dibîne jiber ku peyva qudret saloxdana navê Çaw dike, cara dwê erkê navî dibîne çunkî peyva çav mîna nav bikar hatye, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya diyarîkirî û nav dirust bûye.

*“Şorî yek boseyî şîrîn le lebit kewte serim
Heddî bosem nîye, emma be xeyalm telebe”²⁶⁰*

Peyva bose, bi ramana maçî têt, di vê dêrê da dû caran hatye vegerandin, cara êkê rolê diyarîkirî dibîne jiber ku peyva şîrîn saloxdana navê bose dike, cara dwê erkê

²⁵⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 282

²⁵⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 212

²⁵⁹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L 365

²⁶⁰ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, L 736.

navî dibîne çunkî mîna nav bikar hatye, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya diyarîkirî û nav dirust bûye.

3.4.3. Gêranewe ya Peyvan di Çarçuva Pişkên Axaftinê

Gêranewe ya cînavên xweser dinav hozanan de tişteki pir eşkeraye jiber ku “*di diyalêkta kurdîya navîn de, cînavê xweser di rolê bikerî de ku di ristê de tê bikarînan, ku cînavê likaw dinav wê pêkhatyê de hebe, anku cînavê xweser digel cînavê likaw rêk dikeve*”²⁶¹ dinav têkistên helbestan de herdem pêwendiyêke bihêz dinavbera cînavên xweser û likaw de hene, ev peywendîye jî dibe sedemê bihêz bûna peyvên dinav helbestan de. Ji bo nimûne:

*“Mingiyahm le kefaye û 'eze zîn
Rû dekate min û lew cûte deda!”*²⁶²

Min, cînavê xwesere ji bo kesê êkê ket tê bikarînan di kurdîya navîn de, dû caran hatye veğerandin carekê bi rex peyva giyahm, carek jî bi rex peyva lew cûte hetye veğerandin, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya cînavê xweser dirust bûye. Eve jî ciwanyeka mezin dide wê helbestê.

*“Min le fikrî halî xom da û espekeş hazel elqyas
Toy xudaya qadir û toy rebena muşkil guşa”*²⁶³

To, cînavê xwesere ji bo kesê dwê ket tê bikarînan di kurdîya navîn de, dû caran hatye veğerandin, carekê bi rex peyva xuda, carek jî bi rex peyva rebena, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya cînavê xweser dirust bûye.

*“Xubarî simmî espî ew meger eczayî îksîre
Le çîhrî duşminî ew da hemû rengî tela peyda”*²⁶⁴

Ew, cînavê xwesere ji bo kesê sêyê ket tê bikarînan di kurdîya navîn de, dû caran hatye veğerandin, carekê bi rex peyva meger hatye veğerandin, herwesa cara dwê bi rex peyva hemû hatye veğerandin, bi vê sedemê jî hunerê gêranewe ya cînavê xweser dirust bûye.

²⁶¹ Qeys Kakil Tofîq, *Peywendîyekani Nêw Deq*, Namey Diktora, Zankoy Selahedîn, 2003, r.114.

²⁶² *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, L.37.

²⁶³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.50.

Ne bo tacî nîşanê ma, ne bo textî nîya peydâ”³¹²

Hozanvanî evê dêrê hozanî kerkirye, jiber ku pirtika êkê û pirtika dwê û pirtika çarê bi tîpa A hetye serwadar kirin, lê pirtika dwê bi tîpa D dûmahî hatye, bi vê sedemê jî hunerê kerkirin dirust bûye.

3.7.2. KerkirinaŞeş Ker

Çêdibe hozanvan dêrê hozana xwe dabeş kete ser şeş pirtikan, pirtika êkê û pirtika dwê û pirtika sêyê û pirtika çarê û pirtika şeşê bi tîpa T were serwadar kirin, lê pirtika pêncê bi M dûmahî hatye. Ji bo nimûne:

“Be teng hat, ey şewqî zulmet! dilî salim le dest gûlt

³¹⁰Abn ‘Ebidulla Ehimed Şîb, Bop Minhcy Fî ‘Lum Elbelaxe El’erebiye, M. Dar Aîn Hzm, T.1, Bîrut, 2008, S.422.

³¹¹Ebidulselam Salar Ebidulrehman, Hunerî Rewanbêjî Le Şîrî Nalî Da, Namey Master, Zankoy Slêmanî, 2000, r.158.

³¹²Dîwanî Salim, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.63.

*Çi bû ned şuşt, be awî subih dem, ruxsarî wek qîrî*³¹³

Hozanvanî di vê dêrê hozanî de pirtika êkê û pirtika dwê û pirtika sêyê û pirtika çarê û pirtika şeşê bi tîpeke wekhev serwadar kirye, lê pirtika pêncê bi tîpeke cuda ji pirtikên din hatye serwadar kirin. Bi vê sedemê jî hunerê kerkirin dirust bûye.

3.7.3. Kerkirina Dû bi Dû

Helbestvanî dêrê hozanî biser çar pirtikan parve kirye, pirtika êkê û pirtika dwê bi tîpên Zar serwadar kirye, lê pirtika sêyê û pirtika çarê bi tîpên Aran serwadar kirye. Ji bo nimûne:

“Bê hûdeye le gulzar, efxanî bulbulî zar

*Nagate goşî yaran, endûhî bê qeraran*³¹⁴

Hozanvanî di vê dêrê hozanî de nîv dêrê êkê kire dû pirtikan, herdû pirtik jî bi sê tîpên wekhev serwadar kirine, Herwesa nîv dêrê dwê kire dû pirtik û herdû pirtik jî bi sê tîpên wekhev serwadar kire. Eve jî bûye sedemê dirustbûna hunerê kerkirina şar kertî.

3.7.4. KerkirinPênc Ker

Helbestvan tinê nîv dêrê dwê ya hozan parvekirye ji bo çar pirtikan, her pirtikeke ji wan çiwir pirtikan bi cînavê xweser ya Min hatye serwadar kirye, eve jî destelata rehaya hozanvan nîşan dide ji yarîkirin bi peyvan ji bo bihêz kirina serwaya hozanan. Ji bo nimûne.

“Yadî toye seneme yek beyek endîşeyî min

Şuxlî min, şêwey min, fikretî min, pîşeyî min

Nexlî hestîm be cefa sebze le baxî dunya

Şaxî min xusseyî min, mîhnetî min, rîşeyî min

Bo qubûl kem be ebed nazşî saqîy be çerû

Eşkî min, badeyî min, dîdeyî min, şîşeyî min

Rûberûyheybetî îşqit le hunerda esedm

Xwênî min, tu'meyî min, kulbeyî min, bîşeyî min

Herekatm weku ferhade le rêy mîhnetî îşq

³¹³ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.180

³¹⁴ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.505

Kohî min, sîneyî min, naxunî min, tîşeyî min
Cerg û dil puxte ke salim ziyafet bo dost
*Dîgî min, sîneyî min, hîmmeyî min, pîşeyî min*³¹⁵

Helbestvan tinê nîv dêrê dwê ya hozan parvekiryê ser çar pirtikên wekhev, eve jî yarî kirine bi peyv û ristan, jiber ku dabeşkirina nîv dêrekê bi ser çar pirtikên wekhev selmînerê wê rastiyêye ku hozanvan gelek dest rengîn bûye ji xemilandina hozanan.

3.7.5. Kerkirina Çar Ker ya Wekhev

Helbestvan hozan parvekiryê ji bo çar pirtikan, her çar pirtik bi dû tîpên wekhev hatîne serwadar kirin, mîna tîpên in, eve jî ji bo ciwankirina serwayê dû tîpên wekhev aniye û helbest pê xemlandye.

“Be rûx rengîn û dil sengîn, myan la xer kemer zerrîn
*Nîgeh şahîn û mû mû şkîn, zenex sîmîn û leb şîrîn*³¹⁶

3.7.6. KerkirinHeft Ker

Cureke di yê kerkirin ewe ku hozanvan dêrê wê hozanê ji bo heft pirtikan parve kirine, di nîv dêrê êkê de pirtika êkê û dwê û sêyê û çarê bi tîpên En serwadar kirine, herwesa di nîv dêrê dwê de pirtika pêncê û pirtika şeşê bi tîpa Ê hatîne serwadar kirin, lê pirtika heftê diçe ser serwaya gelemperî. Ji bo nimûne.

“Sehî qamet, qewî şewket, qemer tel'et, melek xeslet
*Keman ebrû, nbgeh ahû, ferengî xûy mû muşkîn*³¹⁷

3.7.7. KerkirinÇar Ker ya ji Hev Cuda

Ew kerkirine ku hozanvan dêrê wê hozanê ji bo çar pirtikan parve kirine, pirtika êkê û pirtika çarê bi cînavê xweser ya To serwadar kirye, lê pirtika dwê û pirtika sêyê tîpênRe serwadar kirye

“Bo xeyalî neqşî to, manî le min kewdentre
*Rengî xamey kiridgare, sen'etî tesuyrî to*³¹⁸

³¹⁵ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.574 – 575.

³¹⁶ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.602

³¹⁷ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.602.

³¹⁸ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, L 730.

Girngya hunerê kerkirin ji bo wê çendê vedigere, her hozanek bê kerkirin xwandevan bi sanahî dikare wê têkistê bixîne, jiber ku ji bilî serwaya gelemperî ya wê hozanê hozanvanî serwa ji bo tevahiya pirtikên dinav wê hozanê dirust kirine, eve jî alîkariya xwandevanî dike ji xwandina wê hozanê.

3.7.8. Amara Hunerê Kerkirin

Tîpa aaaaaaa aaaaaaaa

Bergê 1, hejmara helbestê 19, dêrê 3, hejmara dêran 3 dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 32, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 43, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 44, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr .

Tîpa tttt t t t t

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dêrê 5, hejmara dêran1 dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr.

Tîpa rr r r r r r r r r

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr .

Tîpa ss ssss s s s

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr .

Tîpa v v vv v v v v

Bergê 1, hejmara helbestê 1, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr.

Tîpa nnnnnn

Bergê 1, hejmara helbestê 4, dêrê 8, hejmara dêran1 dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 15, dêrê 7, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 23, dêrê 1, hejmara dêran1 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 2, hejmara dêran 2 dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 29, dêrê 2, hejmara dêran1 dêr .

Tîpa o ooo oo o

Bergê 2, hejmara helbestê 3, dêrê 6, hejmara dêran 1 dêr.

Tîpa h h h

Bergê 2, hejmara helbestê 3, dêrê 1, hejmara dêran 1 dêr .

Bergê 2, hejmara helbestê 7, dêrê 1, hejmara dêran 1 dêr .

Bergê 2, hejmara helbestê 11, dêrê 1, hejmara dêran 1 dêr .

Tîpa êêêêêê ê

Bergê 2, hejmarâ helbestê 23, dêrê 1, hejmarâ dêran 1 dêr .

Bergê 2, hejmarâ helbestê 24, dêrê 4, hejmarâ dêran 1 dêr.



3.8.Hunerê Muleme'

Hunerê Muleme'êke ji hunerên ciwankarya peyvan, peyva Muleme' ji peyva Elmelmê'î ya zimanê 'Erebî hatye wergirtin, çêdibe hozanvan tevahiya helbestê xwe an êk dêrê hozana xwe bi zimanekê biyanî binivîse, hunerê Muleme' "*pêktêt ji wê çenidê ku hozanvan dinav hozana xwe de nîv dêrekê Farsî û nîv dêrekê 'Erebî binivîse, an dêrekê bi zimanekê binivîse û dêrekê din bi zimanekê din binivîse*"³¹⁹armanca Hunerê Muleme' ewe ku sînorê dinavbera zimanan derbaz bike hozan bi zêdetir ji zimanekê bê nivîsandin, anku zêdetir ji zimanekê dinav hozanê de hebe. Jiber wê çendê Hunerê Muleme' "*bi wê hozanê tê gotin ku bi zêdetir ji zimanekê tê nivîsandin, anku nivîsandina helbestane bi dû ziman an bi sê zimanan*"³²⁰hozanvan ji bo selmandina zanîna zimanê biyanî zêdetir ji zimanekê ji bo nivîsandina hozanan tê bikarînan "*sedemê nivîsandina helbestan bi zêdetir ji zimanekê ji bo tiyorên kevin vedigere, daku hozanvan biselmîne ku zêdetir ji zimanekê dizane*"³²¹ herwesa em dikarin bêjin ku Muleme' pêktêt ji nivîsandina hozanekê an dêrekê hozanê bi zêdetir ji zimanekê ji alyê helbestvanî ve, vêca bi dû ziman an sê ziman an çar ziman an zêdetir, bi wê mercê tevahiya hozanê ya êk hozanvanî be û çû peyvekê ji hozanên helbestvanên din wernegire. Ji bo nimûne hozanvanekê kurd helbestan bi dû zimanên mîna 'Erebî û Farsî dinivîse. Curên Muleme' ji dev Salimî li gor wê zimanan ku Muleme' tê nivîsandin û tinê hunerê Muleme' bi dû zimanan hene:

3.8.1. Hunerê Muleme' bi Dû Zimanan

Ew Muleme'e ku bi dû zimanên dû neteweyên cuda tê nivîsandin, çêdibe êk zimanê Kurdî be, zimanê din Farsî be, jiber ku merce hozanên muleme' bi dû zimanên cuda bê nivîsandin, eve jî destelata hozanvanan bi ser dû zimanan tê selmandina, Salim hunerê muleme' bikarînaye. Ji bo nimûne:

“Xerqe le dilm peykan peyweste le mujganî

Çak est girîbanim ez çak girîbanî

Bê hûdeye, ey'aqil dêwane dekey zencîr

'Umer yesit perîşanim ez zilif prişanî

³¹⁹Ebî 'Ebidulla Mihemed Bin Ebî Bekir Elrazî, *Rewze Elfesahe*, Tehqîq D : Xalîd 'Ebid Elrewf Elcebir, M. Dar Wa'l Lîlineşir, T.1,2005, S.164.

³²⁰Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî*, Bo Polî Duwemî Peymangakanî Melbendî Mamostayan û Polî Pêncemî Peymangakanî Mamostayan, r.110.

³²¹İdrîs 'Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî'ri Kîlasîkî Kurdî Da*, L 268.

Şewqî meh û rûy dilber, kewtûne cedel dîsan
Ay kaş brun înd yek ruz be meydanî
Cem'n le perêşanîy dil hawxemî zulfit
Zînd ke zinî cana sd guy be çuganî
Xeyrî elemî hîcrt, yadî çi beşer nakem
Der 'îşiq tu bşkestim sd 'ehid be peymanî
Bo çare, dilî bîmar damanî wefa deyrê
Şayd ke be dest ard ez le'l tu dermanî
Heyranî rehî 'îşqin, ger şemse weger mensûr
*Salim, nebud pîda zîn badye payanî*³²²

Ev hozane tevahiya wê bi muleme' hatye nivîsandin, jiber ku nîv dêrê êkê yên tevahiya vê hozanê Kurdîye, herwesa nîv dêrê dwê yên tevahiya vê hozanê Farsye, bi vê sedemê jî hunerê muleme' bi dû ziman dirust bye, herwesa Salim bi rêya nivîsîna vê hozanê destelata xwe bi ser zimanê farsî nîşan daye, ku çawa bê tirs bi zimanê Farsî û Kurdî nivîsandine.

3.8.2. Amara Hunerê Muleme'

Tîpa aaaaaa aa a a

Bergê 1, hejmara helbestê 11, hejmara dêran 13 dêr, Rûper 298 - 299 .

Tîpa m mmm m m m m m m m m

Bergê 1, hejmara helbestê 4, dêra 6, Rûper 435 .

Tîpa ûû w û w û û w û û w û w

Bergê 1, hejmara helbestê 25, dêrê 8, Rûper 671 .

Tîpa y y y y y y y y y y y y

Bergê 2, hejmara helbestê 10, hejmara dêran 7 dêr, Rûper 912 – 913.

Bergê 2, hejmara helbestê 14, hejmara dêran 7 dêr, Rûper 922 - 923.

³²²Dîwanî Salim, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.922 – 923.

3.9. Hunerê Jêwergirtin (Lêwergirtin)

Ev huneredi zimanê 'Erebî da dibêjnê Îqtibas, ev hunere taybete bi wergirtina deqekê din ku cudabe ji têkistê wî, bi merema xemilandina hozana xwe, Jêwergirtin "*pêktê ji wergirtina deqekê Quranê an Fermaystekê paşî nivîsandina wê dinav hozanê de bi merema zelalkirina wtaya wê hozanê*"³²³ herweha hunerê Jêwergirtin tinê êk pênase ji bo wî tûneye belkî pêşveçûye, 'Eladîn Secadî dibêje "*Jêwergirtinpeyveke ji bo tev tiştan dibe, anku tişteke gelemperye, her tişteke madî an manevî ji tişteke din bê wergirtin, her jêwergirtine, lê divêre da merem ewe ku hozanvan hindêk peyvan ji jêderê din werdigre û dikete dinav berhemê xwe, anku Jêwergirtin ewe ku berhemê kesekê taybet tişteke bikete dinav berhemê xwe de, lê ne bi navê wî kesî ku tişteke jê wergirtiye, anku behsa xudanê berhemê jê wergirtî naket, jiber eger navê xudanê berhemî îna anku behs kir bi wê nahête gotin hunerê jêwergirtin, anku bi hunerê jêwergirtin nahête zanîn, belkî dibe hunerê têhelkêş*"³²⁴ anku çêdibe jêwergirtin ji bilî quran û fermayş tiştên din jî bê wergirtin mîna jêwergirtin ji gotinên mezinan an helbestê hozanvanekî an nerînên zanistî an pişkek ji çîrokê, anku jêwergirtin "*ew çendeye ku berhemê hozanvanekî an nivîserekî tişteke din yê kurt an dirêj ji berhemekê din werbigre, bi renekî têkiliya berhemê xwe bike, çunkî bi çu renekî amaje bi navê jêderê naket û xuya naket ku ev berhem ji wê jêderê wergirtiye, ew cihê ku berhemê jê werdigre, çêdibe eve bin: Qurana pîroz, Fermayşên pêxemberî S.X.L, Gotinên mezinan, Derbirîneke zanistî, Peyvên kesên binav û deng, Îdyom dêrekê an niv dêrekê an pitir ji hozaneka din, pişkek ji çîrok an hikayet an her tişteke din*"³²⁵ hunerê jêwergirtin wata wergirtina têkistekê ji dervey têkistê xwe, bê nivîsandina navê xudanê deqî, mîna jêwergirtin ji helbestê hozanvanekê an gotinên mezinan an Qurana pîroz an Fermayşên an her deqeka bihêz ya din. Curên hunerê jêwergirtin di helbestên Salimî de evene.

3.9.1. Jêwergirtin ji Qurana pîroz

Di vê curê de hozanvan têkistekê qurana pîroz werdigre û dikete dinav hozanê xwe ra, lê bi çu şeweyê navê wê jêderê nanivîse ku ew deq jê hatye wergirtin, Salim di vê meydanê de rola xwe nîşan daye. Ji bo nimûne:

“Segî nefsit Leser rêy tewbete amadeyî cenige

³²³Ebidulwahîd Muşîr Dzeyî, *Pragmatîk û Rewanbêjî*, Çapxaneya Awêr, Ç.1, Hewlêr, 2015, r.140.

³²⁴Eladîn Secadî, *Xoşxwanî*, Çapxaneya Zankoy Selahedîn, 1986, r.152 – 153.

³²⁵Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî'ri Kilasîkî Kurdî Da*, L 254

*Be qesdî qetlî ew, ça buk bkêşe tixîbîsim ullah*³²⁶

Bîsim ullah eve ayeta qurana pîroze, lê demê ku hozanvanî wergirtiye amaje nedaye wî jêderê, bi vê sedemê jî hunerê jêwergirtin li qurana pîroz dirust bûye.

3.9.2. Jêwergirtin ji Helbestan

Di vê curê de hozanvan deqekê hozanê anku kêmtir ji nîv dêrekê ji hozanê helbestvanekê din werdigre û digel hozanê xwe têkel dike, lê navê wê hozanvanê nanivîse ku ew dêr jê wergirtiye, Salim di hozanên xwe de li çend cihekê têkistê hozanî wergirtiye. Ji bo nimûne:

“Ela ya eyuhel saqîbe muflîs wextî îhsane

*Edir kasen wenawliha'eta şêwey kerîmane*³²⁷

Nîva nîv dêrê êkê, herwesa nîva nîv dêrê duwê li destpêka herdû nîvdêran berhemê Hafizê Şîrazîye hozanvan di demê wergirtina wî amaje bi navê xudanê berhemî nehatiye kirin, bi vê sedemê jî hunerê jêwergirtin ji helbestan dirust bûye.

Girngya hunerê pêktêt ji wê çendê ku hozanvan bi rêya berhemekê xwe pê dixemlîne û tekstê xwe bihêz dike, gelek bi sanahî peyama xwe dide xwandevanan, jiber ku piraniya caran hemî kes hestê pê naket ku ev hozane pişkeke girîng ji hozanekê din, belkî wesa dike tevahiya vê hozanê berhemê êk hozanvanye, eve jî dibe sedemê bihêz bûna vê hozanê û tevahiya hozanê bihêz dike, ager xwandevan hest kir kû hozanvan pêzanîneke girîng ji jêderê din wergirtiye, di wî demî de hozanvan nabe diz, jiber ku hozanvan dikare bêje ku navê xudanê wî deqî min nenivîsye çunkî xudanê vî deqî gelek yê berniyase. Eve jî rastî cureke ji dahênanê mîna wergirtina deqên hozanê Hafizê Şîrazî ji alyê Salimî ve.

3.9.3. Amara Hunerê Jêwergirtin

Tîpa aa aaaaaaaaaaaaa a a

Bergê 1, hejmara helbestê 9, dêrê 15, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa mm m m m m m m m m m m m

Bergê 1, hejmara helbestê 29, dêrê 1, tevahîya wan 1 ket.

Tîpa hh h h h h h hhh

Bergê 2, hejmara helbestê 31, dêrê 1, tevahîya wan 1 ket.

³²⁶*Dîwanî Salim, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.25*

³²⁷*Dîwanî Salim, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.2, r.809*

3.10. Hunerê Redîf

Hunerê Redîf ji peyva Elredîf ya 'Erebî hatye wergirtin “*pêktêt ji hatina peyvek an zêdetir ji dawiya tîpa rewî*”³²⁸ hunerê redîf ji dawiya tîpa rewî têt, û serwaya vê hozanê bihêz dike û muzîkeke tijî bizav ji bo dêrên hozanê dirust dike “*ev hunere digel saxletên helbestên 'Erebî neguncayne, lê êke ji saxletên helbestên 'Erebî û Farsî, jiber hindê piraniya rewanbêjên 'Ereb behsa hunerê redîf nekiriye*”³²⁹ Ev hunere di hozanên 'Erebî de tûneye, serhildana evê hunerê ji bo zimanê Farsî vedigere jiber ku “*ev hunere di helbestên 'ecemane, dibêjnê murdef, lê'Ereban helbestên murdef tûneye*”³³⁰ Salim jiber ku ji bo demekî dirêj li Îranê jyaye, gelek ketiye bin bandorên edebiyatên Farsî, çunkî em dibînin hunerekê mîna hunerê redîf tinê di zimanê farsî de heye, lê Salimî ev hunere pir bikarînaye, herwesa hozanvanî di rêya vê hunerê re helbestên xwe xemilandine, jiber ku ev huner roleke herî mezin heye di rêxistina û ciwankirina helbestan. Ji bo nimûne:

“*Şorî şehirim ger weha bê, cême hamûn 'aqîbet!*
Yarî leyla xesletm demkat mecnûn, 'aqîbet
Ger şepolî behrî eşkim molkî rûm wa dagrî
Debne yek her dû legel deryaîy ceyhûn 'aqîbet
Ramî xoy kiridim le ewwelda be 'îşwe, çawî mest
Dest û pay bestim besîhrî û keyd û efsûn 'aqîbet
Bo mutî'î, 'îse asa rastrew bû pîş azîn
Wek xetî nahefî wa rûn 'aqîbet
Serçnarî çeşmeyî çawm, eger wa helqulî
Mewc û gedabî degate kêwî gudrûn 'aqîbet
Sê be sê yek yek gelaq den, ba dekeş, ba duxtî rez
Ta ebed mestî debexşê çawî meygûn 'aqîbet
Ey reqîb ba to legel min zulmî fir'ewnî bikey
Ser zemîn qûtt deda wek gencî qarûn 'aqîbet
'Afîyet bê, wek xezenfer, duşmin ger xwênimbixwa
Piştî ew deşkênî pencey şêrî gerdûn 'aqîbet

³²⁸ Ebî 'Ebidulla Mihemed Bin Ebî Bekir Elrazî, *Rewze Elfesahe*, 2005, S.152.

³²⁹ İdrîs Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî'rî Kilasîkî Kurdî Da*, r.278.

³³⁰ Ebî 'Ebidulla Mihemed Bin Ebî Bekir Elrazî, *Rewze Elfesahe*, 2005, S.152.

Teng destî, deletî le dwaye Salim mujde bê

*Şadimanî dê legel ehwalî mehzûn 'aqîbet'*³³¹

Rewa vê hozanê tîpa N pêktêt, herwesa tîpa Ê tîpa berî rewe, peyva 'aqîbet hunerê redîf dirustkirye, ji dûmahya tevahiya dêrên hozanî li paşî rewî hatye, hunerê redîf tevahiya vê hozanê xemlandye û awazeke dilveker daye tevahiya vê hozanê.

3.10.1. Amara Hunerê Redîf

Tîpaaa aaa aaa a a a aaaaaaaa

Bergê 1, hejmara helbestê 1, derdexa, hejmara dêran 8, dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 2, na da, hejmara dêran 10, dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 19, peyda, hejmara dêran 33, dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 28 , şika, hejmara dêran 11, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 29 , deka, hejmara dêran 5, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 30, deka, hejmara dêran 9, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 31, deka, hejmara dêran 7, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 32, deka, hejmara dêran 9, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 33, deka, hejmara dêran 9, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 34, neka, hejmara dêran 6, dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 37, mela, hejmara dêran 8, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 42, nema, hejmara dêran 5, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 44, hêna, hejmara dêran 7, dêr.

Tîpa bbbb b b

Bergê 1, hejmara helbestê 8, hebîb, hejmara dêran 7, dêr.

Tîpa t t t ttt t

Bergê 1, hejmara helbestê 8, hat, hejmara dêran 7, dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 4, grt, hejmara dêran 5, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 6, rast, hejmara dêran 7, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 9, dost, hejmara dêran 9, dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 10, hat û guzeşt, hejmara dêran 7, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 11, hat û guzeşt, hejmara dêran 11, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 23, aqîbet, hejmara dêran 9, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 25, welê zehmet, hejmara dêran 5, dêr.

³³¹ *Dîwanî Salim*, Ebidulkerîmî Mûderîs, B.1, r.229- 231.

Bergê 1, hejmara helbestê 27, reşit, hejmara dêran 17, dêr.

Tîpa ssssssss

Bergê 1, hejmara helbestê 1, 'ebes, hejmara dêran 4, dêr .

Tîpa ddddddd d d d

Bergê 1, hejmara helbestê 2, ewîş raburd, hejmara dêran 6, dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 6, ehmed, hejmara dêran 8, dêr.

Tîpa jjjj j j j jj

Bergê 1, hejmara helbestê 1, kaxez, hejmara dêran 6 dêr .

Tîpa rr r rrr r r r r

Bergê 1, hejmara helbestê 3, aşka, hejmara dêran 8, dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 13, yar, hejmara dêran 6, dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 25, be 'umer, hejmara dêran 7 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 27, meger, hejmara dêran 7 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 31, zahîr, hejmara dêran 10dêr .

Bergê 1, hejmara helbestê 32, zahîr, hejmara dêran 9 dêr.

Tîpa ss ss s s s s

Bergê 1, hejmara helbestê 1, me xsûs, hejmara dêran 7 dêr.

Tîpa z z z z z zzzz

Bergê 1, hejmara helbestê 1, xuda hafîz, hejmara dêran 2 dêr.

Tîpa " "

Bergê 1, hejmara helbestê 1, elweda', hejmara dêran 10 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 2, manî', hejmara dêran 7 dêr.

Tîpa llll ll l

bergê 1, hejmara helbestê 2, bo dil, hejmara dêran 6 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 3, dil, hejmara dêran 7 dêr.

Tîpa m m m m m m mm m m m m m m

Bergê 1, hejmara helbestê 1, bim ta bim, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 2, bim, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 3, bim, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 10, kesêkim, hejmara dêran 7 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 11, deyzanim, hejmara dêran 9 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 17, hemû dem, hejmara dêran 5 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 20, nakem, hejmara dêran 11 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 21, nakem, hejmara dêran 8 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 22, kem, hejmara dêran 9 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 23, kem, hejmara dêran 5 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 24, dekem, hejmara dêran 11 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 25, cananem, hejmara dêran 8 dêr.

Tîpa nnn n n n n n n n n n

Bergê 1, hejmara helbestê 6, bû asman, hejmara dêran 9 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 10, eyan, hejmara dêran 5 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 11, eyan, hejmara dêran 10 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 12, min, hejmara dêran 6 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 31, min, hejmara dêran 11 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 14 , min, hejmara dêran 7 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 15, min, hejmara dêran 6 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 19, dekem, hejmara dêran 5 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 28, be husne, hejmara dêran 6 dêr.

Tîpa ûû w û w û w ûû w û w û w û w û wu

Bergê 1, hejmara helbestê 2, bû, hejmara dêran 7 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 4, bû, hejmara dêran 7 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 5, bû, hejmara dêran 5 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 6, bû, hejmara dêran 6 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 8, bû, hejmara dêran 5 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 9, bû, hejmara dêran 7 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 10, bû, hejmara dêran 8 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 11, bû, hejmara dêran 6 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 12, bû, hejmara dêran 7 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 13, bû, hejmara dêran 7 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 14, bû, hejmara dêran 7 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 15, ne bû, hejmara dêran 9 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 16, bû, hejmara dêran 4 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 20, bo kwê çû, hejmara dêran 6 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 27, hemû, hejmara dêran 9 dêr.
Bergê 1, hejmara helbestê 28, em şew , hejmara dêran 7 dêr.

Bergê 1, hejmara helbestê 29, em şew , hejmara dêran 5 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 30, em şew , hejmara dêran 7 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 31, em şew , hejmara dêran 6 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 32, em şew , hejmara dêran 6 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 33, em şew , hejmara dêran 8 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 34, em şew , hejmara dêran 10 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 35, em şew , hejmara dêran 9 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 36, em şew , hejmara dêran 9 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 37, em şew , hejmara dêran 9 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 38, em şew , hejmara dêran 7 dêr.

Tîpa oo ooo o o o o o o o o o o o o o o o

Bergê 1, hejmara helbestê 1, to, hejmara dêran 6 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 2, to, hejmara dêran 8 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 3, to , hejmara dêran 9 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 4, emro , hejmara dêran 9 dêr.
 Bergê 1, hejmara helbestê 5, meço , hejmara dêran 5 dêr.

Tîpa h hhhh

Bergê 2, hejmara helbestê 24, muşkîle, hejmara dêran 8 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 33, min, hejmara dêran 11 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 34, min, hejmara dêran 5 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 40, hatewe, hejmara dêran 42 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 41, hatewe, hejmara dêran 9 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 50, heye, hejmara dêran 7 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 51, heye, hejmara dêran 7 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 52, heye, hejmara dêran 14 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 53, heye, hejmara dêran 6 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 54, nîye, hejmara dêran 5 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 55, nîye, hejmara dêran 7 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 56, nîye, hejmara dêran 9 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 57, nîye, hejmara dêran 5 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 58, nîye, hejmara dêran 9 dêr.
 Bergê 2, hejmara helbestê 59, nîye, hejmara dêran 8 dêr.

Tîpa yy y yy y y

Bergê 2, hejmara helbestê 9, kaşkê, hejmara dêran 7 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 18, dey, hejmara dêran 5 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 23, dekey, hejmara dêran 7 dêr.

Tîpa êê êê ê ê ê ê ê ê ê

Bergê 2, hejmara helbestê 2, na bê, hejmara dêran 9 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 3, na bê, hejmara dêran 7 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 4, na bê, hejmara dêran 5 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 5, bibê, hejmara dêran 7 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 13, çi debê, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 14, debê, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 16, qet nebê, hejmara dêran 6 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 7 1, nebê, hejmara dêran 10 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 20, de barê, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 22, derjê, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 25, çi lewê bim, hejmara dêran 6 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 26, bidemê, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 27, dênê, hejmara dêran 12 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 28, dênê, hejmara dêran 8 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 29, dênê, hejmara dêran 7 dêr.

Bergê 2, hejmara helbestê 30, derjêt, hejmara dêran 8 dêr.

ENCAM

Bi gelemperî hunerên ciwankarya peyvan dinav hozanên kilasîkî tê ber çavan tevahiya huneran ciwankirin û xemilandina peyvan bikar hatye di helbestên kilasîkî ya kurdî de, Salim êke ji wan hozanvanan ku helbestên wî tijî hunerên ciwankarya peyvan ev hozanvane di hemî helbestên xwe de hunerên ciwankarya peyvan bikaranîye bi merema xemilandina peyv, destewaje û ristên dinav hozanan de. Merema hozanvanî ew buwe ji rêya van huneran re peyv û destewajên bixemlîne û mîna gulên biharan bide nevyên serdemê xwe û nevyên dahaî bike, hunerên ciwankarya peyvan dinav her tekstekê de hebe ew deq dibe deqekê nemr, herwesa dibe xudan saxletên têkistên bihêz, jiber ku êk ji saxletên deqekê nemr negehiştine bi wataya dûmahyê, çunkî ev deq ku nemr tijî hunerên cuda cuda ne, jiber wê çendê xwandevevanên vê têkistê nikarin bi sanahî jê re têbigihin, Daku Em ji wataya peyvan nêzîk bin, Me pêkul kirye ji rêya van hunerên dikevîne dinav sînorê ciwankarya peyvan li ser têkistên Salimî vekolînan bikin, daku em pitir hevniyasînekê digel helbestên salimî de pêk bînin û di vê rêyê re em bikarin ew ciwanyên dinav helbestên salimî de heye dinav kanya helbestên hozanvanî guher û mirwariyên wê derbînin, herwesa ciwanyên wê bi hûrî binvîsin.

Bi gelemperî piraniya helbestên salimî hunerê regezdozî têdane, dinav regezdozyê de piranya hunerên wê hunerê regezdozya cudane, Salimî 354 helbest bi zimanê kurdî nivîsandine, ji koma wan helbestên kurdî 157 helbest hunerê regezdozî têdane, ku 356 hunerê regezdozye bi gelemperî, piraniya hunerên wê ji tîpa T, Tê di helbestê hejmare 27 dane, ku tinê di vê hozanê de 39 hunerê regezdozyî hene, herwesa rêja sedî dibe %44.35.

Hunerê patkirdinewe mîna hunereke giring yê ciwankarya peyvan dinav hozanan de, ji koma 354 hozanên kurdî 59 hozan hunerê patkirdinewe têdane ku 133 hunerê patkirdinewe dinav hozanên wî dane, piraniya huneran di tîpa w di helbestê hejmara 23 daye, tinê dinav wê helbestê de 29 hunerê patkirdinewe hene, ku rêja sedîya wan dikete %16.66.

Herwesa hunerê hênanewe êke ji wan hunerên ku di hozanên Salimî de rêjeyeke berçav yê hene, piraniya hunerên hênanewe hevşewê hevrezîne, ji

koma 354 hozanên kurdî 143 helbestan hunerê hênanewe têdane ku 231 hunerin, piraniya huneran ji tîpa T, Tê ye di helbestê hejmara 27 dane, tinê di wê hozanê de 23 huner hene ku rêjeya sedîya wan dibe %40.39.

Hunerê gêranewe roleke herî mezin di bihêzkirina helbestên salimî de heye, çunkî vegêrana wan vegêrana peyvên asayî nîne, belkî vegêrana cînavê xweser, nav, hevalnav, diyar ker, diyarîkirî, hejmarên ket û kom bixweve digire, ji koma 354 helbestên kurdî 145 hozan hunerê gêranewe têdane, herweha 145 hunerê gêranewe dinav van helbestan de hene, piraniya hunerên gêranewe ji tîpa w di helbestê hejmara 23 dane, tinê di vê hozanê de 14 hunerê gêranewe hene, ku rêjeya sedîya wan dibe %40.96.

Hunerê têhelkêş kirin êke ji wan hunerên diyar yên ciwankarya peyvan, Salimî ev hunere ji bo bihêzkirina hozanên xwe bikarînaye, herwesa Salim hozanên xwe têhelkêşa helbestên hozanvanên berî xwe kirine, herwesa hozanvanên piştî salimî hafîne hozanên xwe têhelkêşa hozanên salimî kirine, ji koma 354 helbestên kurdî 22 helbest têhelkêş hatye kirin, rêjeya sedîya wan dibe %6.21.

Hunerê muleme' êke ji wan hunerên ku Salimî ji bo bihêz kirin û xemilandina hozanên xwe bikarînaye, ji koma 354 helbestên kurdî 5 helbest bi muleme' hatye nivîsandin, rêjeya sedîya wan dibe %1.41.

Hunerê Kerkirin êke ji wan hunerên ku Salimî ji bo hozanên xwe bikarînaye, lê bi rêjeyeke kêmtir, ji koma 354 helbestên kurdî 31 hunerê Kerkirin dinav 22 hozanan dane, piraniya hunerên Kerkirin ji tîpa (n) di helbestê hejmara 15 dane, tinê di vê hozanê de 9 hunerê Kerkirin hene, ku rêjeya sedîya wan dibe %6.21.

Hunerê Jêwergirtin êke ji wan hunerên ku Salimî ji bo bihêz kirin û xemilandina hozanên xwe bikarînaye, eve jî wê serdemê diyar bû ku hozanvan deqekê ji kesekê din re werbigre, ji koma 354 helbestên kurdî 3 helbest bi Jêwergirtin têdane, rêjeya sedîya wan dibe %0.84.

Hunerê bûna wê pêdivye êke ji wan hunerên ku Salimî bikarînaye, ji koma 354 helbestên kurdî 143 helbest bûna wê pêdivye têdane, rêjeya sedîya wan dibe %40.39.

Hunerê Redîf êke ji wan hunerên ku roleke mezin ya hey di xemilandina hozanên Salimî de, çunkî awazeke hendesî daye helbestên Salimî, ji koma 354 helbestên kurdî 123 helbest hunerê Redîf têdaye, ku rêjeya sedîya wan dibe %34.74.



JÊDER

Kitêbên Kurdî

Arî Sibhî Ehimed, *Xezel û Qesîdekanî Hacî Qadrî Koyî Lejêr Tîşkî Lêkolîneweda*, Çapxaneyaya Rojhelat, Ç.1, Hewlêr, 2009.

Avêsta Kemal Mahmud, *Prakmatîkî Pirsyar û Ferman Le Kurmancî Xwarû da*, Çapxaneyaya Renc, Ç.1, Silêmanî, 2009.

Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Layene Rewanbêjîyekan Le Şî'ri Kilasîkî Kurdî Da*, Çapxaneyaya Hacî Haşm, Hewlêr, 2011

Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Ciwankarî Le Edebî Kurdî da*, Çapxaneyaya Serdem, Silêmanî, 2003.

Îdrîs Ebidulla, *Ciwankarî Şî'ri Kilasîkî Kurdî*, Çapxaneyaya Hêvî, Ç.1, Hewlêr, 2011.

Ewrehmanî Hacî Marif, *Ferhengî Zarawey Zimannasî*, 2004.

Ewrehmanî Hacî Marif, *Rêzmanî Kurdî*, Bergî Yekem, Çapxaneyaya Elhurye, Ç1, Bexdad, 1998.

Wrya 'Umer Emîn, *Asoyekî Tirî Zimanewanî*, Bergî Yekem, Çapxaneyaya Aras, Ç.2, Hewlêr, 2009.

'Ezîz Gerdî, *Ciwankarî Le Edebî Kurdî da*, Bergî Yekem, Çapxaneyaya Dar Cah, Bexdad, 1972.

'Ezîz Gerdî, *Edeb û Rexne*, Çapxaneyaya Elhewads, Ç.1, Bexdad, 1974.

'Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da*, Bergî Duwem, Çapxaneyaya Şarewanî, Hewlêr, 1975.

'Ezîz Gerdî, *Serwa*, Çapxaneyaya Aras, Ç.1, Hewlêr, 1999.

'Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Bo Polî Duwemî Peymangakanî Melbendî Mamostayan û Polî Pêncemî Peymangakanî Mamostayan*, Çapxaneyaya Aram, Ç.2, Bexdad, 2005.

Dîwanî Salim 'Ebidulrehman Begî Sahêbqirçn, Amadekirdin û Şîkrdnewe û Lêkdanewey Mela 'Ebidulkerîmî Mûderîs û Fatî' 'Ebidulkerîm û Mihemedî Mela Kerîm, Çapxaneyê Binkey Jîn, Silêmanî, 2016.

'Eladîn Secadî, *Xoşxwanî û Guzerkarî û Rewankarî û Ciwankarî*, Çapxaneyê Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 1986.

Mela 'Ebidulkerîmî Mûderîs, *Bedî' û 'Eruzî Namî*, Çapxaneyê Dar Cah, Ç.1, Bexdad, 1991.

Hêmin 'Umer Xoşnaw, *Hêrmînotîkay Şî'rî Sofyaney Mehuy*, Çapxaneyê Rojhelat, Hewlêr, 2016.

Mistefa Seyd Mîne, *Payey Wefayî le Naw Şayranî Sedey Nozdehemî Kurmancî Xwarû da*, Çapxaneyê Tefsîr, Ç.1, Hewlêr, 2007.

MarifXeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Sê Yem, Çapxaneyê Wezaretî Roşnbîrî, Ç.1, Hewlêr, 2003,

Refîq Hîlmî, *Şî'r û Edebyatî Kurdî*, Çapxaneyê Aras, Ç.2, Hewlêr, 2010.

Karwan Osman Xeyat, *Beşêk Le Dîwanî Salim*, Çapxaneyê Çwar Çîra, Ç.1, 2012.

Mihemed'Elî Qeredaxî, *Hengawêk Leser Rêgay Lêkolînewey Dîwanî Salim*, Çapxaneyê Hacî Haşm, Ç.1, Hewlêr, 2009.

Qenata Kurdo, *Terîxa Edebyata Kurdî*, Amadekirdin: Karwan Nemr, Çapxaneyê Lîs, Ç.3, Amed, 2009.

'Îzedîn Mistefa Resul, *Edebyatî Nwêy Kurdî*, Çapxaneyê Fêrkirdnî Bala û Hewlêr, 1990.

Muhsîn Ehîmed Mistefa Gerdî, *Beharî Rewanbêjî Watanasî û Rûnbêjî û Ciwankarî*, Çapxaneyê Narîn, Ç.1, Hewlêr, 2013.

Mihemedî Mela 'Ebidulkerîmî Muderîs, *Rêgay Edeb û Le Pênaw Nalî*, Ç.1, 1998.

Ebidulwahîd Muşîr Dzeyî, *Pragmatîk û Rewanbêjî*, Çapxaneyê Awêr, Ç.1, Hewlêr, 2015.

Horas, Hunerî Şîrî, *Wergêranî Le Înglîzyewe Hemîd Ezîz*, Çapxaneyê Elzeman, Ç.1, Bexdad, 1979.

Mela Elî Mame Celkeyî, *Gele û Rêzmanî Kurdî*, Amadekirdin û Kokiridnewey Destnûs: Dr. Xesrew Ehmed Xoşnaw û Dr. Hêmin 'Umer Xoşnaw, Çapxaneyê Zankoy Soran, Ç.1, 2016.

Lîjney Ziman û Zanstekanî Le Korî Zanyarî Kurd, *Rêzmanî Axawtnî Kurdî*, Çapxaneyê Aras, Ç.2, Hewlêr, 2011.

Hêmin 'Umer Xoşnaw, *Şîrîyetî Deqî Çîrokî Kurdî*, Çapxaneyê Roşnbîrî, Ç.1, 2009.

Nerîman Ebidulla Xoşnaw, *Rêzmanî Kurdî*, Çapxaneyê Minare, Ç.1, Hewlêr, 2009.

Mes'ud Mihemed, *Zarawesazî Pêwane*, Çapxaneyê Aras, Ç.2, Hewlêr. 2011.

Kitêbên 'Erebî

Ebu Hîlal Elhesen Bin 'Ebidulla Sehil El'eskrî, *Ktab Elsina'eteyn*, Tehqîq 'Elî Mihemed Elbcawî û Mihemed Ebu Elfezil Îbrahîm, M. Elmekitebe Elmisrye, T.1, Qahîre, 2006.

Yusf Ebu El'dus, *Elbelaxe We El'slubyê*, M. Elahlye Lîlineşir We Eltuzî', T.1, 'Uman, 1999.

'Elî Elcarm Mistefa Emîn, *Elbelaxe Elwazhe*, M. Dar Elme'arf, T.21, Qahîre, 1969.

Ehîmed Metlub, *Finun Belaxye Elbeyan We Elbedî'*, M. Dar Elbihus El'Limye. Elkweyt, 1975.

Se'd Eldîn Eltîftazanî, *Şerih Elmixteser Menşurat Elhikme*, Qum, Îran.

Ehîmed Elhaşmî, *Cewahir Lîbelaxe Fî Elme'anî We Elbeyan We Elbedî'*, M. Dar Elm'rfe, T.12, Qahîre, 1960.

Selah Fezil, *Esalîb Elşî'rye*, M. Dar Eledeb, T.1, Bîrut, 1995.

Bîr Cîru, *El'slub We El'sluby*, TER. İnkîlîzî, D. Minzr 'Îaşî, M. Mekitebe Eleha Elqewmî *Medaxil Îla 'Îlim Elcema Eledebî*, T.1, Bîrut, 1987.

Se'id Elxanimî, *Mentiq Elkeşif Elşi'ri*, M. Elmwese El'erebîye Lîldirasat We elneşir, T.1, Bîrut, 1999.

'Ebid Elmen'em Tlîme, *Medaxil Îla 'Lim Elcema Eledebî*, M. Elseqafe Lîltiba'e We elneşir, T.1, Qahîre, 1978

Bîsîwnî 'Ebidulfetah Fîwd, *'Îlim Elme'anî*, M.Mwesese Elmixtar, T.1, Qahîre, 2010.

Mehdî Salih Elsamerayî, *Tasîr Elfikir Eldînî Fî Elbelaxe El'erebîye*, M. ElmektebeElîselamî, T.1, Dîmeşiq, 1977.

Şukrî'Îad, *Medxel Elî 'Îlim El'slub*, M. Dar El'lum Lîltiba'e We elneşir, T.1, El-ryaz, 1982.

Rulan Bart, *Qera'e Cedîde Lîbelaxe Elqedîme*, TER. Fî İnkîlîzî 'Umer Ewkan, T.1, 1994.

Eristo, *Fen Elxetabe*, TER. Fî İnkîlîzî 'Ebidulqadir Qenîni, M. Eldar Elbeza U, Efrîqa Elşerq, 1996.

Cuzîf Mîşal Şîrîm, *ElhendeseElsewtye Fî ElqesîdeElmisrye*, M. Elcne, T.1, Kweyt, 1994.

Ehîmed Metlub, *Minahîc Belaxye*, M. Elneşiru Kale Lîlimetbu'at, T.1, Bîrut, 1973.

Îbin Reşîq, *Elm'de Fî Mihasin Elşi'r We Adabet We neqdihî*, M. Elhesenî, T.1, Qahire, 1934.

Mîhemed Berekat Hemidî Ebu 'Elî, *Belaxetina Elyewm Beyn Elcemalye We Elwezîfe*, M. Dar Wa'l Lîlineşir, T.1, 'Uman, 2004.

Ebî Elqasm Bin 'Umer Elzmxşrî, *Esalîb Elbelaxe*, M. Elme'arîf, T.1, Qahîre, 2003.

Ebidulqahir Elcrani, *Esrar Elbelaxe*, M. Wizare Elme'arf, T.1, 1979.

- Mihemed 'Ebdulmitelîb, *Elbelaxe We El'slubyê*, M. Dar Cahiz, T.1, Bexdad, 2003.
- Mehimud Bin S'ud Bin 'Ebidul'ezîz El'elîbî, *Elhereke Eledebîye Fî MecalisHarun Elreşîd*, M. Eldar El'erebîye Lîlmewsu'at, T.1, Bîrut, 2008.
- Eldiktor Elexizer Cem'î, *Ellefiz We Elme'na Fî Eltefkîr Elneqidî We Elbelaxî 'Înde El'erab*, M. Mekitebe Elseqafe Eldînye, Qahire, 1985.
- Yusf Lbîwmî, *Eledeb We Elbelaxe*, M. Dar Neşir Elseqafe, Qahîre, 1970.
- 'Ebdulrehîm Mihemed Elhebîl, *Felsefe Elcemal Elbelaxe El'erebîye*, M. Eldar El'erebîye Lîlineşir Wltewzî', T.1, Bexdad, 2004.
- Hena 'Bud, *Elbelaxe Elîbtihal Elî El'ewleme*, M. Îtihad El'ereb, T.1, Dîmeşiq, 2007.
- Ebî El'ebas Mihemed bin Yzîd Elmibired, *Elbelaxe*, M. Elmekitebe Elseqafe Eldînye, T.2, Elqahîre, 1985.
- Ebî Bekir Bin 'Elî Bin 'Ebidulla Elme'ruf, *Babin Hice El'muy Xzane Eledeb We Xaye Eledeb Dirase*, Mi. Me'arf, T.2, Bîrut, 2005.
- Hamid 'Ebidulhadî Huseyn, *Elbelaxe We Elme'na Fî Elnes.Elquranî*, M. He Îdare We sismar Emwal Elweqif Elsunî, T.1, Bexdad, 2007.
- Mehimud Elbstanî, *Elqwa'd Elbelaxiye Fî ZûElmenhecElîselamî*, M. Mwesese Eltebi' We Elneşir Fî Elestane Elrezewye, T.1, Meşhed, 1414 H.
- En'am Fiwal El'kawî, *Elm'cm Elmfezil El'lum Elbelaxe El'erebîye*, M. Dar Elkitib El'Limye, T.2, Bîrut, 1969.
- 'Ebide 'Ebidul'ezîz Qilqilye, *Mecum Elbelaxe El'erebîye Neqid û Neqiza*, M. Dar Elfikir El'erebî, T.1, Qahire, 1991.
- Îbin 'Ebidulla Ehimed Şe'b, *Bihus Menhecye Fî 'Lum Elbelaxe El'erebîye*, M. Dar Eyn Huzim, T.1, Bîrut, 2008.
- Ebî 'Ebidulla Mihemedbin Ebî Bekir Elrazî, *Rewze Elfesahe*, Te'qîq Dr. Xalîd 'Ebid Elrewf Elcebir, M. Dar Wa'l Lîlineşir, T. 1, 2005.

Kovar û Rojnameyên Kurdî

Emîn 'Elî Mutabçî, *Şa'îranî Kurd û Edebyatî Farsî*, Govarî Kolêjî Edebyat, Jimare 15, 1971.

Mihemed Nûrî, *Te'sîrî Ziman û Edebî Farsî Leser Zimanî Kurdî*, Govarî Kolêjî Edebyat, Jimare 18, 1974.

Mes'ud Mihemed, *Payey Şî'rî Kurdî Sedey Nozdehem*, Govarî Beyan, Jimare 18, 1974.

Îdrîs Ebidulla Mistefa, *Ciwankariyekanî Qanî'*, Govarî Raman, Jimare 74, Salî 2009.

Îdrîs Ebidulla, *Hendê Hunerî Ciwankarî Le Şî'rî Pîremêrd*, Govarî Korî Zanyarî Kurdistan, Jimare 6, Hewlêr, 2007.

Wrya 'Umer Emîn, *Rêzman Çîye*, Govarî Rojî Kurdistan, Jimare 69, 1985.

Têzên Kurdî

Hîwa Nuredîn, *Bunyadî Rîtm Le Şî're Kurdyekanî 'Ebidulla Begî Mîsbah Dîwan Edeb*, Namey Master, Zankoy Selahedîn, 2009.

Qeys Kakil Tofîq, *Peywendîyekanî Nêw Deq*, Namey Diktora, Zankoy Selahedîn, 2003.

'Ebidulselam Salar 'Ebidulrehman, *Hunerî Rewanbêjî Le Şî'rî Nalî Da*, Namey Master, Zankoy Selahedîn, 2000.

ÖZET

Araştırmamızın adı Salim'in Kürtçe Şiirlerinde Edebi Sanatlar'dır. Üç bölümden oluşur. İlk önce edebi sanatların rol bilimi içindeki yeri ve önemi ve edebi sanatların diğer bölümlerle pelüşik ve semantik gibi ezbere ile ilişkisi üzerinde durulmuştur.

Birinci bölümde, kelime dünyasında edebi sanatların yeri ve edebi sanatların ile ezbere bilimi arasındaki ilişkiler üzerinde durulmuştur. Aynı zamanda güzelleştirmede ve konuşmanın kuvvetli incelenmesinde oynadığı rol dile getirilmiştir. Ayrıca, sözel estetik biliminin tarihteki yerini ve anlamlılık aşamalarını doğru ve bilimsel bir biçimde ortaya koyan Arap ve Kürt toplumundaki edebi bilim kapsamı uzmanlarının fikrî bilimler hakkındaki düşünceleri yazılmıştır. Ayrıca birinci bölümün sonunda Arap, Fars ve Türk edebiyatı gibi komşu edebiyatların Salim'in şiirine etkisi ele alınmıştır.

İkinci bölümde, Kürt edebiyatında edebi sanatlar, Arap edebiyatındaki mübelliğler, Arap edebiyatında edebi sanatlar, Arapların ve Kürtlerin edebi sanatları ile edebi sanatların tanımı, ayrıca metin biliminde edebi sanatların rolü ve Salim'in biyografisi kısaca açıklığa kavuşturulmuştur.

Üçüncü bölüm, her sanat için Salim şiirlerinde edebi sanat olarak bilinen, çok güçlü örneklerle ilgilidir. Analiz ve ölçek bilimsel yolla yapılmıştır. Edebi sanatlar ve bu sanatsal anlatımlar (vurgulama, zorlama, eşanlamlılar ve bölümlendirme) Salim'in şiirlerini süslemiştir. Sonunda en önemli sonuç inceleme ile açıklığa kavuşturulmuştur.

PUXTE

Lêkolîna libin navê Ciwankariya peyvan Di Helbest Kurdî Yên Salm da bi awayekê giştî ji sê pişkan pêk têt.

Di destpêka de me ronahî xistiye ser rol û girngya Ciwankariya peyvan dinav zanistê rewanbêjî û peywendyên hunerên Ciwankariya peyvan bi pişikên din yên nav rewanbêjî mîna Rûnbêjî û Watanasî.

Di destpêkê pişka êkê têzê de me behsa hunerên Ciwankariya peyvan dinav zanstê rewanbêjî û peywendya Ciwankariya peyvan bi zanistê rewanbêjî kiriye. Herwesa rolê dengsazyê di ciwankirin û mikum kirna derbirînê, piştire jî bi awayekê hûr û zanistî me behsa pêgehê Ciwankariya peyvan dinav mêjûya zanistê rewanbêjî û qonaxên derketina rewanbêjî kiriye. Nerînên hinek şarezayên biyavê zanistê rewanbêjî ji neteweyên 'ereb û kurd derbarê zanistê rewanbêjî hatye behskirin.

Di pişka dwê de, pênasê Ciwankariya peyvan li cem zanayên rewanbêjî, Ciwankariya peyvan dinav edebê Kurdî de, Ciwankariya peyvan dinav edebê 'erebî de, herwesa Ciwankariya peyvan li cem 'erebî û kurdî de, rolê Ciwankariya peyvan dinav deqnasyê de hatye behskirin, herwesa bi renekê keme m û puxt behsa jyana Salim hatye kirin. Herwesa di dawiya pişka dwê yê de behsa bandorên edebê hevîsê mîna edebê 'Erebî û Farsî û Turkî li ser hozanên Salimî kirye

Di pişka sêyê de, me behsa van huneran kiriye kû bi Ciwankariya peyvan hatîne naskirin, dinav hozanên Salimî de ji bo her hunerekê ji van huneran mînakên bihêz hatîne wergirtin, her dêrekê hozanî kû hatye nivîsîn şirove kê zanistî ji bo hatye kirin, wan hunerên kû di hozanên Salimî de hebûyne mîna hunerên regezdozî û Hênanewe û Gêranewe û Patkirdinewe û Têhelkêş û Bûnî Pêwîste û Jêwergirtin û Muleme' û Redîf û Kerkirin, tevahiya van huneran dinav hozanên Salimî de hebûn, Salimî bi rêya van huneran hozanên xwe xemilandine. Di dawî de jî, girîngtirîn encamên kû em bi rêya vê têzê gihîştine wan, di çend xalan de hatine nîşandan.

ABSTRACT

The name of our research is word aesthetics in Slam's Kurdish poems. It consists of three parts. at first it is highlighted on role and importance of word aesthetics in eloquence science and the relation of word aesthetics arts with the other parts in eloquence like pellucid and semantics.

In the first part, it is highlighted on word aesthetics arts in eloquence science and the relation of word aesthetics with the eloquence science, also voicing role in beautifying and strong thinning of uttering. Also, the place of word aesthetics in eloquence science history and stages of eloquence appearing in an accurate and scientific way, the idea of some experts of eloquence science scope in Arab and Kurd nation about eloquence science was written.

In the second part the definition of word aesthetics by eloquence scientists, word aesthetics in Kurdish literature, word aesthetician in Arabic literature, word aesthetics by Arab and Kurd have done, also the role of word aesthetics in text knowing, the biography of Salim has clarified tersely, also the end of first part is about impact of neighbor literature like Arabic, Persian, and Turkish literature like Salim poems.

The third part is about those arts which is known as word aesthetics arts, in Salim's poems for each art, very strong samples have written, each verse which is written, analysis and scansion has done in scientific way, and those arts are existed in Salim's poems as pun, fulfilling, narration, emphasizing, over lapping, being necessity, citation, glistening, synonyms, and segmenting and salim has decorated his poems by these arts. Finally, the most important result has written which is clarified by investigation.